# ROJGERIYÊN MIN

## Medet SERHED

WEŞANÊN NRÇ-HPG

Weşanên NRÇ-HPG

# Rojgeriyên Min
Medet SERHED

Çap
Çapxaneya ROJ

Dîroka Çapê
ÇILE 2017

# *NAVEROK*

**Pêşgotin…….....................................................................................7**
**Kurte Şîroveyek…....................................................................................9**
**Rojgeriyên Min……….......................................................................14**
**Civîna Partiya Sosyalîst…….......................................................................18**
**Apê Mûsa……….....................................................................................21**
**Stenbol, Civîna Komala Aştiyê……...................................................23**
**Ber bi Çiyê ve………………………………..........................................25**
**Şehadeta Şavaş Buldan…….........................................................................26**
**Rojnemaya Ozgur Gundem…...….........................................................29**
**Çar Salên Li Saha YDS…...........................................……....................35**
**Moskova……..........................................................................................36**
**Adirbeycan….............................................…............................................39**
**Kazakistan……..........................................................................................44**
**Amadekariya Newrozê……....................................................................45**
**Kinyas Îbrahimov….…........................................................................49**
**Kirgizistan……............................................................................................52**
**1997 Gulan- Moskova……...........................................................................55**
**Gotinên dostekî: Kamûran Simo……..................................................58**
**Gorgiya Ango Gurcistan…….........................................................59**
**Çûyîna Ermenistanê………....................................................................63**
**Pesin û Pesindayîn…..…..........................................................................65**
**Dr. Sîra………….....................................................…...........................67**
**Telefona Hevala Xanê……....................................................................69**
**Dîlketin û Firoştin……...........................................................................71**
**Êşkence û Lêpirsîn………......................................................................74**
**Qendîl…...…............................................................................................78**
**Peywira Zozanan…...…........................................................................80**
**Dr. Mahîr Gel Derman Dike……..............................................................82**

**Pêşmergeyê 95 Salî……..........................................................................85**
**Ber Bi Şerê YNK`ê Ve..…..................................................................87**
**Qendîlê Ensarîl Îslam……..............................................................92**
**Partiya Agirê Sor……........................................................................94**
**Silêmanî….......................................................................................96**
**Partiya Zehmetkêş…..........................................................................97**
**Hevdîtina Îtlaata Îranê…...........….....................................................99**
**Çûyîna Qeredaxê……........................................................................103**
**Şerê Qeredaxê…...…..........................................................................105**
**Dîlketin……......................................................................................111**
**Zindan….........................................................................................113**
**Pêvajoya Başûr….............................................................................117**
**Hêzê Bergirî Netewî.…….................................................................121**
**2002 Dola Kokê….….........................................................................122**
**Kelareş….….....................................................................................126**
**Dilêşî…............................................................................................129**
**Ber bi Qendîlê ve.….........................................................................132**
**Ber bi Kongra Gel ve.…….................................................................134**
**Hewildanên Ferhat.....…...................................................................146**
**Ber bi Kongra Gel a Duyemîn ve..…..................................................153**

## Pêşgotin

*Zilam û jinên dilêr weke aşûtan dertên, xweşiktî pêş dikeve. Ev jî bi wêje, huner û estetîkê ve girêdayî ye…*

**Rêber APO**

Gelek şiverê hene di jiyanê de. Ji devê deriyê cîhana mirov destpê dikin û li dû xewn û xeyalan me dibin. Di vê berhemê de hûn ê rastî jiyan, bîranîn û serpêhatiyên Medet Serhed werin. Him di pêşdebirina wêjeya kurdî û him jî bo ronîkirina raboriyê, her bîranîna di vê pirtûkê de belgeyên zêrîn in.

Di nav van bîranîna de hûn ê ji sermaya Serhedê derbasî ya Moskovayê bibin. Li navçeya Yazxanê ya bi ser Meletiyê hûn ê li kêleka remza têkoşîna me Zîlan ango Zeynep Kinaci rûnên.

Bîranîn xwe ranagirin û  berê xwe didin dervî welat. Li ser baskên xwe dê berê we bide gundê Agbastal ku di navbera sînorê Kazakistan û Çînê de ye. Li vir hûn ê dayika welatparêz a bi navê Bîber binasin…

Ji bo xaka pîroz Kurdistanê, gelek can gorî bûne li seranserê deşt, bajar û çiyayên welatê me. Roj hat, dolên vî welatê bihûştî xwîn herikîn. Lê ne çiyayên vî welatî û ne jî zaroyên wan ên çiyayî li ber ti kes û hêzê serî netewandin.

Vîna gerîla ji pola ye. Dîrok careke dî bi rêya van bîranînan vîna gerîla ya ji pola dê piştrast bike û we ber bi *Şerê Qeredaxê* ve bibe. Bîr, bawerî û hêza gerîlayên Kurdistanê careke din dê mohra xwe li dîrokê bide.

Bîranîn nasekinin… Dê çîroka xembar a hevala Aştî ya bi Şehîd Viyan Caf re tevlîbûyî û bi 75 fîşengan ji jiyanê hatî qutkirin ji we xwîneran re vebêjin.

Piştî salên 2000'î ku ji gelek milan ve êrîş bi ser têkoşîna me dihatin de; bûyer, qewimîn û pêvajoya kongreyan bi çavdêriyeke xurt a Medet Serhed dê bi we re bêne parvekirin.

Em di wê baweriyê de ne ku, berhema hevalê Medet Serhed a bi navê *Rojgeriyên Min,* derbarê têkoşîna me de wê ji gelek mijar û pirsan re bibe bersiveke xurt.

**Kurte Şîroveyek**

Şeş meh di dava berfê de, dest cemidî, ling qerimî. Ji cenikê kirasê xwe ve ava ji difnê diherike paqij dikim. Dibistan hinekî dûrî mala me ye. Bi beton hatiye çêkirin û pir sar e. Ji boyî ku germ bibe hemû şagirt di bin milê wan de yek-du kerme û berê xwe didin dibistanê. Yên ku bêkerme têne dibistanê mamoste wan li ber sermayê digire, hilnade hûndir. Ger ew kes roja din kerme neyne mamoste dîsa nagire hûndir.

Em ji piraniya gotinên mamoste fêm nakin, tênagihêjin. Dema em di nava xwe de bi kurdî diaxivin bi awir û gotinên tûj ên mamoste ve têne şiyarkirin, ev jî têra mamoste nake bi darê deste mamoste lêdanê dixwin.

Her kesî dixwest bila bihar zû were ku biçin ber golik û çêlekan. Lê ez diçûm li ber canegayan. Li warên me di newrozê de berf nû dest bi helandinê dike. Di nîvê meha avrêlê de em ji "mamoste" xilas dibûn. Destûrnameyên me bi gelemperî ji aliyê bavên me ve dihate girtin û dema êvarê em dihatin gund didan me.

Li gundê me yek jî karê mêşan dihate kirin, lê ti kesî ji vê berhemê jî nekarî têr bixwe. Ji ber ku giraniya hingivên me yan cendirmeyan dixwar an jî zilamên dewletê yên li bajêr diman. Pirî caran bêpere digirtin an jî pereyekî pir kêm didan. Gel bi navê "dibe ku rojekê karê min bikeve deriyê dewletê bila ez metel nebim" hingivê herî baş, tijî dida wan erkdarên dewletê. Di her dema ku gundiyekî me ji bo erkdarên dewletê hingiv amade dikirin an jî ji bo wan dibirin pîrika min dijûnên xwe li pey hev rêz dikir û ji me re digot, "*ji bîr nekin ev dijminê me ne, ser reş in*" lê me tiştek jê fêm nedikir û weke li valahiyê binêrin li wê temaşe dikir. Di matmayînên wiha de dapîra min bi destê min digirt û

serpêhatiya bavê û birayê xwe vedigot. Birayê wê di temenekî pir ciwan de ji aliyê tirkan ve hatibû kuştin. Bavê wê jî alîkariya kemalîstan kiriye lê belê piştre weke xayînê welat hatibû darizandin. Gotinên xwe dirêj dikir, demekê bêdeng dima, serê min hembêz dikir, keserên kûr dikişand û awirên wê diçû lûtkeya çiyayê Agirî.

Lûtkeya çiyayên Zagrosan, sêgoşeya Kevirê Şehîdan û nîşaneya welatê parçebûyî… Şekîfa ku li Dalanpêr temaşe dike. Di navbera herduyan de qereqolên dagirkeran ên Îran û Tirkiyê. Ber bi rojhilat, lûtkeya Helgurt dixuyê. Li jêrên lûtkeya wê bermahiya qereqolên rejîma Baas. Li dewsa wan bermahiyan niha, qereqolên "birayên me yên kurd" rêbiriyê dikin. Ev deranan ji milîtanên Tevgera Azadiyê re qedexe ye lê ji pasdarên Îranê re serbest e. Divê milîtan li benda êvarê bin da ku ji şeva dost û yar sûd werbigirin û derbasî Qendîlê bibin.

Qendîl; ji çendîn şoreşger û lehengan re bûye wargeh, ji çendîn pakrewanên kurd re bûye hêlîn û stargeh. Di her lûtkeyekê de sengerek, di her newalekê de rêwiyên bênav, di nava daristanan de gorên bênîşan. Li her bihusteke wê fîşekên zengar û parçên topan. Li seranserî dol û kortikên sînor mayîn ango mîm hene. Her gaveke ku ji pîvanên hatiye diyar kirin derbikeve tê wateya teqîn û mirina bêwext, an jî ji parçeyeke laşê xwe bêwext xatir xwestinê. Bi tenê ne heval, gundî jî xwedî heman pîvanan in. Pêşeng di her gavî de kesê li pey xwe şiyar dike. Ango lingek radibe lingekî din tê li dewsa wî lingî.

Awirên min diçin li pişt çiyayên nediyar û dapîra min ji nişka ve tê bîra min. Çend peyv ji lêvên min bi rengekî xwezayî diherikin, "Xezalê, dapîra min di gora xwe de rihet razê, ew keda ku te da me hişt em xwe bavêjin doza welat". Lê welatê dapîra min pênase dikir li derûdora çiyayê Agirî bû. Dîsa jî evîna Agirî; êş, keder û kesera Agirî her tişt bû. Ya ku em anînbûn serxetên Zagrosan evîna Agirî ango evîna welat bû. Li sêgoşeya welat, li ser Ava Zê, me pala xwe daye çiyayê Cîlo. Ew Cîlo ye ku her dem hisabên dijmin ên li ser zarokên xwe vala derdixîne. Carinan bi baranên bêwext û carinan jî bi mija bêwext ve...

22 sal bihûrî, di serî de gelek cihên Kurdistanê, li gelek cihên cuda li ser navê rêxistina me kar meşand. Niha li çiyayê Garê, bihara sala 2015’an bi tevî hevalê Yilmaz Viyan li kêleka Çemê Xazil ber bi Deşta Kafya dimeşim. Xwêdana enî û rûyê hevalê Yilmaz ber bi jêrê ve diherike û ez bênavber diaxivim, behsa bîranînîn berê dikim. Hevalê Yilmaz wek kelecan be, bi çavên nîv-vekirî ve dipirse; “*te qet ev bîranînên xwe nivîsiye?”*. Reng û asta bilindbûna dengê min dikeve, bi tenê gotina “*na, çima dipirsî ”* ji devê min derdikeve. Hevalê Yilmaz qederekê bêdeng dimeşe, xwêdana eniya xwe bi destmalê ve paqij dike û bêyî ku li min binihêre, got; *“heyf e, binivîse”*.

Me xwe berda kêleka ava Xazil. Hênikahiya avê xwe li rûyê me dixist. Me dest û rûyê xwe şûşt, ji kêleka çem tûzik, pûng kom kir. Di nava nanê tisî de pûng û tûzik, xwêya li ser reşandî û ava çemidî. Ji aliyekî ve westandina rê ji ser xwe avêtin û ji aliyê dî ve jî fikrên nivîsandinê...

Piştî demekê min biryar da û dest bi nivîsandina serpêhatiyên xwe kir.

Di 24’ê Tîrmehê de operasyoneke berfireh bi balafirên şer, top û obusan ve li ser Qadên Parastina Medyayê bi pêş ket. Derbarê van êrîşan de, di rojnameya Milliyet a medyaya hawiz a Tirk de van daxuyaniyan hatin dayîn; “*Şeva 24’ê Tîrmeha 2015’an ji Amed, Erhaç, İncirlik û Êlihê bi qasî 70 balafirên şer ên tîpa F-16 rabûn. Ev operasyona berfireh wek sê pêlan (dalga)pêk hat. Pêla yekemîn şeve di derdora 22:30’î de, ya duyemîn nîvê şeve û pêla sêyemîn jî sihara 25’ê Tîrmehê saet di 09:30’î de pêk hat. Di vê operasyonê de 70 balafir 160 caran sortî kirin (ji erde rabûn) û di encamê de herêmên ku PKK lê bi cih bûyê yên wekî; Zap, Metîna, Garê, Avaşîn, Basyan, Sineht, Heftenîn, Soran, Kalatuka, Xakûrkê û Qendîlê cihên weke depoyên lojîstîkî, cebilxanê, gelek şikeft û stargeh hatin tunekirin. Di vê operasyonê de ji 400’î zêdetir hedef hatin îmhakirin.*

Ruxmî van daxuyaniyan NRÇ-HPG di malpera xwe ya fermî de vê daxuyaniyê da raya giştî; “*Di van êrîşên hewayî yên dewleta dagirker a Tirk de, endamê konseya fermande yê HPG’ê Önder Arslan bi nasnav*

*Şervan Varto bo rêhevalên xwe xelas bike bi qehremanî şehîd û sê hevalên me jî birîndar bûne*."

Şiyariyên pêwîst berî çend rojan bi berfirehî hatibû kirin. Bêsîm bênavber şiyariyan dikin da ku hemû heval li hember balafirên şer bergiriyên xwe bigirin. Saet 11'ê şevê, guje guja balafirên şer di dol û şikêran de olan vedida. Balafir li ser me ne û her ku xwe hinekî noqî jêrê dikin dengê wan zêdetir dibe û bombeyan di ser me de dibarînin. Sê hevalên ciwan li cem me ne. Cara yekee ku rastî tiştekî wiha dibin. Dengê bombeyan merax dikin. Dixwazin ku li cihê hatiye lê dan binihêrin, hevalê Îrfan Amed bihêrs, *"serê xwe ranekin, xwe bi erdê ve bikin yek"*, ciwan bêdeng dimînin û dîsa serê xwe ditewînin. Hevalê Îrfan li min dipirse,

– *Tu jê derdixî li ku dide?*

Ew her bombe diavêjin û ez jî cihê lêdidin ji hevalê Îrfan re dibêjim. Herî dawî xwe ranegirt,

– *Wer diyar e ku, yê bombeyan diavêje tu yî. Ku tu ewqas rihet cihê bombeyan dibêjî.*

Bi ken,

– *Bi xwedê hevalên tirko li cihên vala dixin. Li wan cihên ku lê dide bi tenê yek heval jî nîn e. Bi tenê cihê hevalên çapemeniyê hin xeter e lê bi qasî ez dizanim ew jî ji cihê xwe derketibûn.*

Li ser vê heval kêmekî rihet dibin. Gera balafiran hinekî hindik bû, li cihên dûrî me didan. Di vê navberê de, me cihê xwe guherand û em ber bi cihekî bilind ve hilkişiyan da ku ji wir karibin her derî bibînin. Balafir dîsa hatin, ev car cihê me xweş bû. Weke ku di sînemayeke dewasa de mirov fîlm temaşe dike. Vê carê li her cihê ku bombe lê dikeve, em baş dibînin û dizanin ku li wê derê ti kes nîn e. Heya siharê em di wê rewşa întîşarê de man. Tîrêjên rojê hîna nû serê xwe nîşan didan û cardin gujîniya balafiran zêde bû. Li çend cihên din jî xistin û çûn.

Di saet heştan de ji bêsîmê tekmîl têne girtin, bi giştî rewşa hevalan baş bû, ji difna yek hevalî/ê jî xwîn nehatibû. Heval bimoral û coş di bêsîmê de diaxivîn. Bi tenê ji hevalên terzîxanê deng nîn e. Nêzî 13

hevalên jin li wir bûn. Hevalan hewl didan bi navbeyniya bêsîmê ve rewşa wan fêr bin. Herî dawî me ji cem xwe du heval şand ku biçin cihên wan qontrol bikin. Hîna ku hevalên me di rê de bûn hevalên terzîxanê li ser bêsîmê pêwendî çêkirin. Rewşa wan baş bû, berî ku êrîş destpê bike xwe dane cihên biewle.

Pêvajoyeke întîşarê destpê kiribû. Carinan li bin darekê û carinan jî li ber siya zinarekî min hewl da ku biçim wan rojên berê û nivîsandina serpêhatiyên xwe temam bikim. A rast van êrîşan derfet û hêz da ku ez vî karê xwe zûtir biqedînim. Ji ber karûbarên rêxistinê daye pêş me, pêvajoya întîşarê nebûya, nepêkan bû ku ez karibim di demeke wiha de van kurteçîrokên xwe binivîsim.

## Rojgeriyên Min

Ez kî me? Ne xeme ez kî me, an jî ji ku derê me. Tişta girîng ji ku têm bi ku ve diçim û jiyana min têr û tijî, bi wetedar e yan na?

Gotinên ku ez binivîsim dibe ku tiştên pir ji rêzê û asayî bin. Lê belê tişta ez dizanim, mirov dîroka xwe bi xwe binivîse baştir e. Ger bi xwe dîroka xwe nenivîse, dibe ku kesên cuda jiyana mirov şelû bikin, mij û tarî bidin nasîn.

Yên min ceribandine û derketina rêwîtiya ber bi xwe ve ye. Bêguman tiştên binivîsim hemû ne serpêhatiyên min in. Beşek serpêhatî ne, lê hemû jî rastî ne.

Di gavên Kurdayetî de ez; ji dapîra xwe welatparêzî, ji mamê xwe û ji karkerên ji Wanê jî şoreşgertiyê fêr bûm. Min şivanî, hemalî, garsonî kir û firaq şûştin, di înşatan de kalfatî-hostatî kir û di sendîkayan de cih girt. Di saziya karkeran de fêrî jiyana polîtîk bûm. Tevgera Azadiyê jî min di nav karkeran de naskir. Ji sala 1991`an heta dawiya sala 1994`an di nava HEP’ê de xebitîm. Her wiha bûm endamê Komaleya Mafê Mirovan.

Di sala 1992`an de li Stenbolê tevlî Tevgera Azadiyê bûm. Di dawiya sala 94`an de derketim çiyê. Cihên ku ez lê mam; Engîzek, Meletî, Stenbol, Ermenistan, Gorgiya, Adirbeycan, Kazakistan, Kirgizistan, Ozbekî-istan, Rusya, Îran-Rojhilatê Kurdistan, Iraq-Başûrê Kurdistan û Qadên Parastinê yên Medya… Jiyana şoreşgerî berdewam dike. Kurteçîrokên ku ez binivîsim jî di nav rabirdûya min de kêliyên biçûk in.

Lêgerînên min, kesayet û mijara debara jiyanê, berê min da welatê “karkeran”. Sala 89’an li Moskovayê, Şîrketa ENKA û ez karker im.

Sosyalîzma reel bi navê glasnost û prestroyka pêvajoyeke nû dijiya. Şerîkên biyanî li Sovyetan, kar bi ser kar werdigirtin, şerîkên tirk jî karên hembaltî wegirtîbûn û em jî hembal bûn. Nexweşxaneyeke nû çêdibû û nêzî 800 karker bûn. Xwediyê şerîkê nêzî sê meh bû meaşê me nedabû, hemû karker ji vê rewşê zivêr bibûn. Karkerekî ji bajarê Konyayê li ba min qalib çêdikir û kesekî kêmaqil bû, her kesî henekên xwe pê dikir. Ji min re got; *"bira ez ê li cem te derewekî bikim û hêdî bi hêdî li cem her kesî belav bikim"*. Bi rengekî matmayî min got; *"derewa çi?"* Li min vegerand û got; *"du rojê din emê biçin girevê, ango dest ji kar berdin da ku meaşên me bidin"* Min jê re got; *"ka biçe dînê xwedê, wê kî ji te bawer bike?"* Birayê ji Konyayê ji cem min çû û bi rastî jî, wê êvarê li hotelê di nava karkeran de mijara girevê dihate nîqaşkirin. Roja ku dînê me got hemû karkeran dest ji kar berdan û neçûn ser kar. Ez û du hevalên ji çepê Tirkan komîteyeke veşartîbûn. Ew herdu heval hatin li cem min û bi rengekî aciz gotin; *"heval bêyî agahiya me te çima ev kar kir?"* Min jî got; *"min negotiye, vî dînê Konyayê derewekê belav kir, lê derewa wî bû rastî"* Hevalên min ji min bawer nedikirin, piştî nîqaşê ew jî fêm kirin ku ti tekîliya min bi vê rewşê re nîne. Lê gotin; *"êdî çêbûye, divê em xwedî lê derbikevin ku bila serkeftî biencam be"*. Xwediyê kar soz da ku roja din wê perê me bide û karker jî ji nîvro û şûn de çûn ser kar.

Derengiya êvarê ji kar derketim û bi otobusa gel, ber bi otele ve ketim rê. Otobus tijî bû. Jineke Rûs, temenê xwe nêzî pêncî-şêst salî bi min re kete axaftinê, lê; min ji bilî peyvên sosyalîzm û kapîtalîzm ti tişteke din jê fêm nekir. Pir germ diaxivî û wê çi digot min jî bi rûsî digot 'da', ku bi Kurdî dihat wateya 'belê'. Ev sohpeta yekalî nêzî bîst deqîqeyan berdewam kir. Jina Rûs ji nişka ve sekinî û ji min re got *"ma tu çima naaxivî?"* Min jî jê re bi rûsî got *"ez bi rûsî nizanim"*. Dema min ev bersiv da gelek qehirî û dijûn li min kir. Dema kesên din ên di otobusê de jî li vê rewşê keniyan, dayîk bêhtir qehirî û vê carê jî bela xwe li her kesî/ê da. Qaşo wê bi vî rengî parastina sosyalîzma reel dikir. Heya cihê ku ezê daketama dayîk xwe bi xwe diaxivî, car caran li min

dinêhêrî û zêdetir diqehirî. Vê rewşê heya rawestgeha ezê lê daketama berdewam kir.

Karkeran mafên xwe wergirtin, lê; ez bûm hedef. Karkerekî ji Erziromê hebû. Êvarekê bi lavayan ez birim gerekî. Me li xwaringehekê xwarin xwar. Dema em derketin derve, çar kesên nenas ber bi me ve hatin û ew kesê li cem min ji nişka ve reviya. Wan kesan bêyî ku tiştekî diyar bikin hema kulmek dan rûyê min. Bi vê lêdanê re ez ketim erdê. Piştî çend kulm û pehîn li min dan, min xwe kom kir û ez reviyam. Ew jî li pey min beziyan, ez ketim li nava daristan û di cihekî talde-tenha de min xwe veşart.

Di derengiya şevê de min encax xwe gihand otelê. Em di qatê danzdeyan de diman, dema min xwe gihande odeya xwe û hevalan ew rewşa min a bixwîn dîtin êrîşî wî kesê Erziromî yê ez hîştim û revî kirin. Ez ketim navberê min nehişt lê bidin, di wê xirecirê de min fêm kir ku hevalên min ên kar û gundiyê min ê bi navê Nîhat, ew karkerê Erziromî xistine li cihê destavê û jêre gotine *"ger hevalê me neyê em ê te ji pencerê biavêjin xwarê"*. Me di navbera xwe de nîqaş kir ku ev kes ajan e, wî bi zanebûn ez biribûm û têkiliya wî bi wan kesên li min dabûn re jî hebû.

Piştî çend roj ji ser vê bûyerê derbas bû muhendîsekî demokrat li ser kar xwe nêzî min kir, di dest de mêtro weke ku dîwêr dipîve tevdigeriya û di wê navberê de ji min re got *"tu di demekê nêz de ji vir biçî ji bo te baştir e. Şîrketê tu kirî hedef û lêdana te xwariye jî bi vê ve girêdayî ye. Ji bo tazmînat û meaşê te ez ê alîkariya te bikim"*. Piştî gotinên xwe qedand hema pişta xwe da min û çû. Ji neçarî di demekê kurt de min berê xwe da welat.

Ew utopyaya min a di derbarê sosyalîzmê de ji gelek aliyan ve vala derketibû. Ji bo coca cola, benîştekî, cil û bergên bimarqa adîdas, an jî ew kelûpelên ewropî yên reklamên wan tên kirin bidest bixin ciwan diketin pêşbirkê. Civak her roj bêhtirîn diperitî. Derfetên maddî hebûn, lê qada ramyarî, polîtîk û hunerê perçiqîbû. Ji civakê re nêveng nemabû ku xwe birêxistin bike, pênaseya azadiya xwe bike. Burokrasî ji her tiştî

re bû. Êdî çepgirî, sosyalîzma Sovyetan ji bo min xilas bibû. Her wiha lêgerînên din jî zêde ez nedikişandim. Dîsa bi karê karkerî û rêxistinên sendikal re mijûl bûm.

## Civîna Partiya Sosyalîst

Li Stenbolê, hewa baran û mij e. Karkerên înşata balafira Stenbolê heya çongên xwe di nav betonê de ne. Di nav wan de endamekî Partiya Sosyalîst (partiya Doğu Perinçek) birêz Şahap hebû. Şahap mamosteyê dibistana seretayî bû. Ji aliyê xwe yê netewî û siyasî ve dihate nasîn. Mamoste Şahap, ji bo ku navê kurê xwe bike BOTAN doz vekiribû û wê demê di gelek rojnameyan de bûbû mijara nûçeyan. Kesekî welatparêz bû, li hemberî Tevgera Azadiyê rêzdar bû. Her wiha ji min re propagandaya PKK`ê dikir. Wê demê Doğu PERÎNÇEK bi Rêber Apo re hevpeyvîn kiribû û hevpeyvîn di kovara "2000`e Doğru" de dihat weşandin. Birayê Şahap ji min re ev kovar dianî. Cara ewilî fikrên Rêber APO min wê demê xwend û li ser min bandoreke mezin çêkir. Lê belê ez rêxistinê nas nakim û ti pêwendiyekî jî pê nabînim. Ji ber nasnameya min SENDÎKA bû û bêhtirîn bi awayekî aktîf tevlî çalakiyên siyasî dibûm. Wekî 1 Gulan, Newroz, girevên karkeran û hwd. Gelemperî di van milan de çalak im. Lê belê bi ti rêxistinekê re pêwendiya min nîn e. Gumanên hin eniyan li ser min hene ku xwedêgravî ez PKK`yî me, xwezayî wek endamekî PKK`ê nêzikî min dibin. Rojekê hevalê Şahap hat li cem min got, *"paneleke Partiya Sosyalîst heye, tu jî were, hûnermend Ganî Nar jî tê..."* min jî got *"baş e ez dikarim werim"*.

Civîn-panel li Avcilar Parselerê di saloneke dawetê de bû. Nêzî 5 hezar kes hatibûn. Kesên hatibûn piraniya xwe girseya welatparêz-kurd bû. Şahap ez pêşwazî kirim û bir maseyeke nêzî dikê. Şahap peywirdar bû, di milê wî de nîşana peywirdariyê hebû. Li masa ku ez rûniştibûm, ji bilî min kesekî birîş, xanimek û keçek hebû. Me silav da hevdu. Kesê ku bername pêşkeş dikir, him bi tirkî û him jî bi kurdî xêr hatin li mêvanan

kir û dest bi daxuyaniya bernameya xwe kir. Dê serokê partiyê Ferît Îlsever bername vebikira. Piştre ji mêvanan kesên bixwaze dê bikaribûya 5 deqîqe biaxiviya û piştre dê dengbêj Ganî Nar derbiketa dikê. Dema pêşkeşvan navê Ganî Nar xwend, maseya ku ez lê rûniştibûm nîşan da û got *"vaye di nav me de ye"*. Zilamê birîş ji cihê xwe rabû, çep-rast zîvirî gel silav kir û gel jî bi çepik û tilîliyan ve ew silav kir. Ganî Nar li cihê xwe rûnişt. Min jê re got, *"Ganî tu yî?", "belê bra-heval, ez im"*. Ji min re *"heval"* gotin bala min kişand. Lewre ez ne heval bûm. Wan deman bilêvkirina peyva "heval" dihat wê wateyê ku tu di xetereyê de yî. Lê min dengê xwe nekir. A rast kêfa min jî ji vê peyvê-gotinê re dihat, lê xeteriya din jî ew bû ku ez ne heval bûm, ger hevalên rast derên ezê ji wan re çi bibêjim.

Ferît Îlsever hate li ser dikê, mijara wî rewşa siyasî ya di rojevê de, destwerdana Saddam a li Kuweytê û destwerdana Emerîkayê ya li ser Saddam bû. Ferît Îlsever parastina Sadam kir û pêde çû, ji ber ku dij Emerîkayê derketiye wek Che Guvera yê Rojhilata Navîn pênase kir. Ferît Îlsever gotinên xwe xilas kir, çepikeke sar hilda. Vê carê dor hatibû kursiya azad a karkeran a 5 deqîqe. Hate gotin ku kî/ê dixwaze biaxive bila navê xwe binivîse û bide pêşkeşvan. Min li ser pelekî navê xwe nivisî û da pêşkeşvan. Destpêkê bangî min kirin, navê min hate xwendin çepik hatin lêdan lê belê ji bilî Şahap û hevjîna wî kesek min nas nake. Ez çûm li ser dikê, her kes bi meraq li min dinihêre da ku ez kî me û ezê çi bibêjim. Min silav da gel û gotinên Ferît Îlsever ên Saddam wek Che Guvera pênasekirin red kir. Helepçe, komkujiya Kurdan li bîra wan xist û bi çend gotinên enternasyonalîst ve gotinên xwe qedand. Bi qedandina min ve gel li çepikan da û ez di nava çepikan de hatim cihê xwe û rûnişitim. Ganî Nar ez pîroz kirim, Şebap bilez hate li cem min, rengê wî zer bûbû got *"heval te çikir, min bizanibûya min bangî te nedikir"*. Min dengê xwe nekir. Ferît Îlsever cardin hate li ser dikê got *"hevalê hêja, ez şaş hatim fêmkirin. Bêguman komkujiyên hatine pêkanîn em jî şermezar dikin"*. Çend gotin jî lê zêde kir lê belê êdî rengê wî eşkere bûbû. Gel zêde guh neda wî. Ganî Nar derket li ser dikê, gel bi çepik û dirûşman

tevlî stranan bûn. Jinek hate ligel min, *“ka were em biçin, niha qelebalix e, wexta belavbûnê dibe ku polês te bigirin”*. Ez bi wê jina kurd re derketim derve, tevlî kolanên Stenbolê bûm. Ew jin kê bû nizanim, piştre di çend xwepêşandanan de min ew dît lê me hev nas nekir. Ji wê civînê şûn de ez bi xwezayî bûme PKK´yî…

**Apê Mûsa**

Payîza 1992`an rêxistina HEP`ê ya navçeya Esenyûrta ku girêdayî Stenbolê ye. Li wir şeveke piştgiriyê û biratiya gelan amade kiribûn. Em jî, gelek karker û xwendevan çûne şahiyê. Li şahiyê gelek hûnermend amade bûn. Lê belê tişta herî balkêş, cara yekemîn Qereçî bi aweyekî girseyî tevli şahiyeke bi vî rengî dibûn. Wek gelekî, rengekî di şahiyê de cihê xwe digirtin. Bi stranên xwe, cil û bergên xwe ve di şahiyê de cihê xwe digirtin. Heval Zeynel (Orhan KAYA) berpirsyarê giştî yê rêxistinê bû û Qereçiyan pir jê hez dikir. Apê MÛSA ANTER jî wek axaftvan di şevê de amade bû. Destpêkê stran-govend hatin gotin û girtin, piştre Apê MÛSA hate ser dikê, cilê wî spî, porê wî spî û rûyê wî spî bû.

Apê MÛSA, *"zarokên agir û rojê, ew dibêjin emê gerîla biqedînin. Lê bi gerîla re şer, wek di deştekê de mêş şopandin e…"* Peyivîna Apê MÛSA bi pêkenokan, metelokên polîtîk bidawî bûn. Xatir ji me xwest, destê xwe hejand, destê xwe bir li ser dilê xwe û ser serê xwe û heval Zeynel (Orhan KAYA) jî ligel ji salonê derketin.

Piştî mehekê, Apê MÛSA bi çavsorî qetilkirin. Dijmin jê ditirsiya, nehîştin ji metrepolan girse biçe cinazê wî. Li Stenbolê hin dostan ji bo wî mewlûdeke bikurdî amadekiribûn. Di nava wan dostan de Yilmaz Çamlibel jî hebû. Polêsên dijmin ji mewlûda kurdî jî ditirsiyan. Der û dora mizgeftê dorpêç kiribûn. Kî/ê berê xwe dida mizgeftê, ji pêlavên wan bigirin heya porên wan qontrol dikirin. Seydayekî li ser mînderê rûniştibû, bikurdî dest bi mewlûdê kir û xwend. Bi dengê mele, Qûr'anê ez hinekî bandor kirim, ku min wer dizanibû laşê min dilerizî. Bikurdî cara yekemîn mewlûd guhdar kirin pir cûda bû û hestên netewî dilê min

kelegirî kiribû. Mewlûd xelas bû, ez û hevalê Zeynel ber bi komaleya mafê mirovan ve derketin Taksîmê.

**Stenbol, Civîna Komala Aştiyê**

Ji telefonê ez qet heznakim, dîsa zinge zinga wê ye. Yê ku telefon dikir, berpirsyarê rêxistina DEP`ê ya bajêr Dr. Kemal PARLAK bû. Kekê Kemal mirovekî rewşenbîr, kurdekî welatparêz û demokrat bû. Min jê hezdikir û hurmeta min jê re hebû. Di telefonê de *“di komaleya dij şer de civînek heye, tu û çend heval biçin wir dê baş be”*. Em deh rêvebirê DEP`ê çûn avahiya komaleya Dij Şer. Avahiya komalê li Taksîmê bû. Di civînê de nêzî 40 kes hebûn û kesên hatibûn xwedî nêrînên cuda û endamên tevgerên cuda bûn. Revşenbîrên hêja jî hebûn, wek Ercan KANAR, Aslan Başar, Eren KESKÎN û hwd. .

Civîn çi bû, naverok çi bû me nedizanî. Di telefonê de kekê Dr. Kemal ji bilî *“çêker bin, alîkar bin”* tiştekî din negotibû. Beriya civîn despê bike, awirên kesên hatibûn li ser me bû û em jî ji vê rewşê zivêr bûn. Berpirsyarên komalê dest bi civînê kirin. Mijara civînê; kesekî ku di rêveberiya komalê de cih digire 6 sal berê hatiye darizandin, jinek ku destûrnameya wê ya xebatê nîne derxistiye dikê û li ser vê ji aliyê dada Tirkan ve wek ”pezeveng” bi cezaya 7 meh hatiye mehkûm kirin û li dewsa mehkûmiyetê pere jê girtine bû. Dibe ku hûn bibêjin ji me re çi? Lê ne wisa ye, biraderên çepgir ên Kurd û Tirk di mijara namûsê de nazik in. Di civînê de du saet guftûgo, nîqaş, mişûmir di çarçoveya *“ev der cihê mirovên binamûs, şoreşger, her wiha demokrat in, yekî qewat li vir di vê komalê de nikare cih bigre”* de domiya. Lê ti encam jî derneket. Di dawî de hevalekî me mafê axaftinê girt û got, *“wek em dizanin navê vê komalê Komala Dijî Şer e û bê ku nasnameya cinsî bibe asteng herkes dikare bê li vir û bibêje ´ez dijî şer im` divê tu kes jî nebe asteng. Her*

*wiha ev der rêxistineke çînî û homojen jî nîn e, ji her kesî/ê re vekiriye”.* Hevalekî din jî piştgirî da gotinên hevalê me.

Kurt û kurmancî; herkes matmayî ma, me jê derxist ku weke qet hêvî nekin ku helwestên me wisa be, derketibû pêş. Matmayîna wan; ew me tûj-radîqal dizanin û li ser vê jî hêvî dikirin ku emê wî kesî ji wir biqewitînin. Civîn wek helwesta me qediya. Me xatir xwest; û şevên tarî yên Stembolê, kolanên serxoş-bêxoş, zarokên kolanan li rex dîwarên cemidî, destên di ber hev de kirî, lingên xwe kişandine zik û zik birçî…

## Ber bi Çiyê ve

1994, payîza dereng, rojên zehmet, der û dora me girtî ye. Li her derê lêdan, kuştinên kiryarên wan nediyar! Her roj dema em ji malê dertên wekî ku emê bêne kuştin (her endamekî/ê DEP'ê) ji malbatên xwe helalî dixwaze. Ji ber ku kî/ê dê kengê û çawa bê kuştin ango were wendakirin nayê zanîn.

Ez êdî nîv qaçax dijîm, mebesta min a gotina nîvqaçaxî, bi tenê nagerim, li malên partiyê, yan jî li mala dostan dimînim. Kesên hatine girtin, navê min ê nerast dane, hê bi temamî nehatime naskirin.

Roj derbas dibin, carinan direvim bajarekî û demekê xwe vedişêrim. Av. Meded SERHAT tê qetilkirin, bi girseyeke zêde em cinaze radikin, di merasîmê de ez û hozan Xanemîr di nava gel de sirûda EY RAQÎP dixwînin û gel jî bi me re tevahî sirûd dubare dike. Xwendina sirûdê xelas bû, diruêşmên *"bijî Kurdistan, Kurdistan ji faşîzmê re dê bibe goristan"* hate avêtin. Hevaleke ji YCK'ê, keçek ku min ew nasdikir hat cem min got *"polês em nîşanî hev dan, ka em zû ji vir dûr bikevin"* û em ketin nav kolanên Taksîmê.

## Şehadeta Şavaş Buldan

Stenbol, bajarê gelek êşan, xemgîniyan, derewkaran, feqîr û hejar an. Heval Orhan Kaya telefon kir da ku em biçin saziya Emniyeta Tirk a masa Partiyan dişopîne. Ji wir bang li me kirine û li ser belgên HADEP`ê kêmanî hene, dê ji me re çend tiştan bibêjin. Cihê avahiyê li taxa Gayret Tepe bû. Em herdu heval gihan deriyê avahiyê. Li ser min giraniyek çêbû û wer diyar bû ku ev nerehetiya min dabû rûyê min, rengê min mat-tel bûbû. Ez bawer im bala heval Orhan kişandibû ku li min zîvirî *“çi bû ji te”* min bi xwînsarî û dengekî nizm *“qet, ev avahî, gelemperî weke cihê êşkencê-zulmê tê nasîn û hîn jî wisa ye”.* Heval Orhan, *“netirse, em bi aweyek fermî hatine vê derê û em rêveberiya partiye ne tiştek nabe”.* Min bi keser bi bîr xist ku *“Apê MÛSA, Mehmet Sîncar wan ji bîr neke. Li cem van fermiyet, an jî rêveberiya partiyê ne tiştek e”.* Bi van gotinan em gihaştibûn cem nobedarê avahiyê. Nobedar bi medekî tirş nasnameyên me girt û got *“biçin li vegerê ezê nasnameyên we bidim”.* Min di dilê xwe de got *“gelo emê vegerin!”* Heval Orhan bi rûyê ken silav da polês û em derketin qata heştan.

Odekî rengê wî bi boyaxekî ewrî, masên hesin, kursiyên hesin, kesekî bi mudurê masaya partiyên ramyarî; birûyê ken, kêfxweş rabû li ser xwe pêşwaziya me kir, destê me girt û cihê rûniştinê nişanî me da. Me jî ji ber rêzikên dîplomasiyê bi kenên derewîn, rûkenî, çav biken dinêrî, lê di nav de metirsî, dudilî. Mudur *“çend dokumanên we kêm in min bo wê bangî we kir, her weha min hezkir em pêk ve qehwekî vexwin û rewşa xebatên we û her wiha ger di xebatên we de tengazariyek hebe ji min re bêjin ez alîkariya we bikim, ez jî sosyalist im”* û hwd. hevokên xwe domand. Lê dilê min hêjî nerehet bû, gelo ev pêşwazî, nazikî nîşaneya di

dema pêş de tiştek anîna serê me bû ango ev rewş ne zimanê neçirvan ê şîrin bin! Lê êdî em di destê wan de bûn. Karê me xelas bû, emê rabûna mudur got *"ev welatekî çi kambax e partiyên we HEP, OZDEP, DEP hatin girtin. Lê belê niha jî HADEP! Lê partî diguherin, tên girtin hûn nehatine guherandin, di wan partiyan de jî hûn bûn, niha jî hûn in. Pêwîst e hûn bên guherandin û li xwe hişyar bin"*. Me xatir jê xwest, em ji avahiyê derketin û me ji cem nobedar nasnameyên xwe wergirt. Em hatin Mecîdiye Koy min ji heval Orhan re got, *"gotinên mudur ne normal in, partî guherîn em neguherîn",* gorî min ev tê wetaya êdî kiryarên wan ê ne diyar ên di metropolan de dê despê bike, banga mudur ji bo vê bû, dokûman ne mesele bû. Heval Orhan li min temaşe kir, demekê bêdeng ma, li otobusa ku emê lê siwarbin dinihêrî û bêdeng, bikesereke kûr got *"em ji Apê Mûsa ne çêtir in"*. Em herdu jî bêdeng li otobusê siwarbûn, ketin rê.

Ji ser hevdîtina me ya bi mudur re hefteyek derbas bûbû, li taxa Gungorenê heval Orhan û sê hevalên rêveberiya HADEP ê, qontra dixwazin li kolaneke Stenbolê reşkujiyekê bikin. Heval ji erebê dadikevin qîr dikin, gelê taxê dadikeve kolanê û ew xelas dibin. Dibe ku armanca wan ne kuştin be, lê belê çavtirsandin û hişyarî bû.

Telefona HADEP a navça Avcilarê lê dida, ez dereng mabûm û mifteya navçê li cem min bû. Min derî vekir telefon bêrawestan lê dide. Min telefon bir gohê xwe, dengê heval Orhan *"ecele biçin Nexweşxana Jiyanê (Yaşam) ya qada Bahçelîevler. Li wir cinazê welatparêzan hene. Divê em lê xwedî derkevin, agahî bide der û dor jî."* Hema yekser, min çend nîşe ji YCK, hevalên legal, nelegal re nivisî da destên çend ciwanan û şand. Em çûne cem nexweşxanê, gel hatibû û kom bi kom jî dihatin. Heval Orhan û gelek hevalên nas hebûn, ciwan hatin, hevalekî ji ERNK berpirsyarê me bû, ew jî di nav gel de bû, wek hemwelatî tevdigeriya lê gel rêk dixist. Girseya gel gihîşt 7 hezarî, me cinazê SAVAŞ BULDAN û hevalên wî ji morgê derxist da ser milên xwe û girse bi dirûşmeyên *"Kurdistan ji faşîzmê re dê bibe goristan, şehîd namirin, Savaş û hevalên wî nemir in, Bijî Kurdistan"* diqîriya. Hevalek

jin li rex min dimeşiya, bi dengeki kelogirî *“jina Şavaş Buldan jî li wê nexweşxanê ye. Li qata jor e, ducanî ye dê zarokê wê çêdibe”* ez matmayî mam û min wer dizanî ku henek e, yan jî min nedixwest ji gohê xwe bawer bikim. Min jê re got *“tu çi dibejî, aqlê te li serête ye?”* hevala jin *“heval ez rast dibêjim, jina wî li benda zarokekî/ê ye”*. Qêrîna girse, astengiyên polêsan, hevûdin dehfdan, polês hezdikin girse belav bibe yan jî dirûşmên nezagonî neyên avêtin. Demekê alozî bilind bû, lê dîsa girse rêya xwe vedike. Em gihîştin goristanê. Cinazên welatparêzên Kurd bi girseyî hatin veşartin.

Kongra HADEP`ê, li Enqerê nêzî 20 hezar welatparêz li salona werzîşê kom bûye, jinên kurd bi rêngên xwe kongre xemilandine. Polêsên tirk rengên kesk û sor û zer welê ditirsin wek gayên Ispanyolî, nahêlin di salonê de rengek rabe lê jinên kurd bi cil û bergên xwe yên xwezayî ev helwesta polesên tirk pûç kiribûn. Jin him rengên xwe him jî bi tilîliyan pergala tirkan dîn û har dikirin. Ronahiya salona werzişê hemû vemirî, bi tenê yek pêketî ma ew jî deriyê dikeve nava salonê bû û ronahiya dihate ser dikê… Li ser dikê mûzika kurdî, lorîneke xemgînî û serhildêr lê dida, Selîm SADAK di destê wî de zarokek di nava pac pêçayî de hate ser dikê, hemû salon bêdeng, matmayî lê temaşe dikir, Selim Sadak mîkrofonê ragirt, zarok jî di dest de bi dengekî bilind *“Savaşek şehîd ket yek hate dinê”* salon bi çepik, tilîlî û dirûşmeyan hejiya, gelek kes digiriya, hestiyarî di asta jor de bû. Zarok, zarokê Savaş Buldan ê yek mehî bû.

**Rojnemeya "Ozgur Gundem" tê bombekirin**

*Çiyayê Nemrûd*

Rojnameya Ozgur Gundem hatibû bombekirin, sermaya çileya zivistanê, roj wek şevê lê hatibûn, êdî mirin li her cihî, her kolanê digot merheba… Cinazê Ersîn YILDIZ li taxa Gazî, li ser milê dehezaran û ber bi goristanê ve diherikî. Gel di şibakeyên xwe de bi dirûşma, çepikan hestên xwe didan der. Hevalekî, gelên li banî û penceran nîşanî me da *"gel radîkal e, xwedî helwest e, em pasîfîst in"* me matmayî ew heval temaşe kir.

Êdî rê, rêbazê ku ez xwe verşêrim û li bajara bimînim nemabû, her weha ti wetaya ku bimînim jî nemabû, êdî dem berê xwe dayîna çiyayên Kurdistanê bû. Li ser vê amedekariya derketina çiyê çêbû, hevalê têkiliya çiyê, dema çuyînê diyar kir, lê dayika min ê bi tenê bima! Li ser vê plansaziya min; dayika min dê biçe Kurdistanê li cem xalê min. Ez û dayika min li garaja otobusan a Stanbolê, min dayika xwe xapand da ku ewê biçe Qersê li cem xalê min ê nexweş, ezê jî saetek şûn de bi otobuseke din biçim çiyayê Semsûrê, lê haya dayika min ji plansaziya min nîn e. Ew li otobusê siwar bû, bi rê ket û bi hêviya hevdîtinê duayên xwe kir. Ez jî li rex otobusê, bi diltengî û êdî bi xema neditîneke bêdawî jê re dest hejand.

Em sê heval gihiştin çiyayê Semsûrê, gundekî çiyayî, rêya gund ax bû, derdora wê daristan bû. Em li benda hevalan man, da ku bên me bibin cem xwe. Şev demjimêr 21, kuçikên gund dihewtin, keça malê diçe der û demeke din du heval li cem wê hatin.

Hevalan xêrhatin dan me, çay vexwarin, kulepiştên wan dagirtî bû û bangî me kirin em ketin rê. Rêya me di nava daristanan de derbas dibû. Carinan em diketin newalên kûr, carinan jî di cokên avê de derbas dibûn. Tişta ku ez têgihiştim, heval em li derdorê digerandin da ku em rê nas nekin, ji cihê şiverê, cihên şop lê çêbe re em nedibirin. Berbanga sibê em gihiştin li cem hevalan. Zîrevan pêşwaziya me kir, em ji kuneke biçûk re derbasbûn, bi ketina hûndir re germahiya soba daran û dengê xewên giran, mirovên pişta xwe dane hev, ser wan vekirî, orxan, petû nîn bû pêşwaziya me kir. Em li quncikekê bi cih bûn. Hevalan çay danîn, nanê li ser sobê nû çêkirî û hingiva xwezayî…

Em 30 kes, yek xanî… Bi tenê roj, ew jî ji bo destavê yek yek derketin hebû. Lê wekî din heya êvarê perwerde bû. Em sih kes in, 12 çekên me hebûn. Cilên li ser me yên sivîl û bi cilên rengerengî gerîlatî dikir. Yanî em gerilayê feqîr bûn. Fermandarê me heval Xebat Amed bû, ew heval bi me re axivî. Bi aweyekî objektîf rewşa şoreşê û rewşa eyaleta Semsûrê şîrove kir, Terzî Cemal û kiryarên wî. Heval Xebat fêm dikir hêviya ku me ji gerîla dikir da ku çekên me, cilên me hebin lê nîn in. Ew jî li gorî wê her tiştî bi me re rast axivî, propagandayên derew ji me re nekir, rewş çi ye, çawa ye, divê çawa be û yê çi be şîrove kir. Ew rastgotinî û danûstandina wî ez bandor kirim, ti zorî yan jî bendewariyên min ên kesayetî ji min re nebû asteng.

Zivistan xelas bû, bihar hatibû. Meha Gulanê ye, lê em hê jî bi cilên sivîl, bêçek li çiyan digerin. Di nobetan de çekên hevalên xwe digirin. Heval Xebat hevalan erkdar dike, gazî min jî kir. Bi min re axivî da ku ez biçim nav gel, karê ERNK'ê bimeşînim. Min her çendî got ez têm nasîn, dewlet li min digere, lê heval Xebat *"Meletî bajerekî girîng e, ezmûnên te yên gel heye. Çend meh xwe*

*biparêze û cihê çend hevalan çêke ez ê bangî te bikim.”* Ji neçarî min heval neşikand.

Em 7 heval amadekariya xwe ya çûyîna bajêr dikin. Her kes rûyê xwe kur dike, cilê xwe dişo. Êvar bû em ketin rê, nêzî Semsûrê em ji hevalan veqetiyan, berbanga sibehê em nêzî bajêr bûn. 2 heval çûn Dîlokê, 3 heval çûn Stenbolê, ez û hevalekê jî çûn Meletiyê.

Li Semsûrê em hinek geriyan, li qehwexanekî me got em ji bo wext derbaskin, her wiha ji bo bala kesî nekişînin okey bilîzin. Em li masê rûniştin û wek qumarbazan okey dilîzin. Hevalê hember min, di nav kevirên wî de okey nîne lê hez dike okey bibîne. Herdu okey jî di destê min de ne û min okey danî. Hevalê min bi dengekî bilind got *“of heval te çima ji min re negot okêya min heye, ez jî vala vala kevir dikişînim.”* Wê demê peyva heval gotin xeter bû, min di bin masê de li lingê wî da ku hişyar be, ewî hevalî dîsa bi dengekî bilind *“of me fêm kir heval, çima li min dixî”*. Hemû awirên li çayxanê li me zîvirîn. Min bangî garson kir, perê çay dayê. Garson got *“zivêr nebin li vir herkes welatparêz e”*, lê dilê min nerehet bû, wek tiştek nebûye em ji çayxanê derketin.

Li navçeya Yazxanê ya Meletî, li mala dostekî danê xwarina nîvro du jin li masa me mêvanê zêde ne! Me xwe weke hevalên leşkertiyê yê xwediyê malê xwe da nasîn. Lê wan dizanibûn ku em heval in, wek reng nedidan diaxivîn, dida û distandin. Demeke din xwediyê malê gazî min kir got; *“ev herdu jin dixwazin beşdarî gerîla bin.”* Ez matmayî mam, ji ber ku çiyê, li cem hevalan hevalên jin nîn bûn û heval Xebat gotibû *“heya em agahî nedin hûn hevalên jin tevlî nakin. Ên ji saha Rebertî bên, wê demê emê agahî bidin, ew dem hûn dikarin bişînin”*. Min bi çend fêl û gotinên vala *“paşê, emê agahî bidin”* ew şandin. Dem derbas bû,

sal bihûrîn, di sala 2000`an de ez pê hesiyam ku ew 2 jin yek ji wan Hevala Zîlan (Zeynep Kinaci) bûye.

Li Meletiyê sê meh mam, di înşatekê de bûm karker, lê hevalê ligel min çû Stenbolê û hate girtin. Ez jî bi zor ji girtinê filitîm. Meha Gelawêjê operasyon li ser min çêbû, rojek zû derketina min a ji Meletî bû sedem ku neyêm girtin. Çûme Stenbolê. Têkiliyên min ji çiyê qût bûn. Hevalê li cem min li Stenbolê hatibû girtin. Navê min, karê min û têkiliyên min dabû dijmin.

Rojnameya tirkan behsa qampên Partiyê yên li Ermenistanê dikirin. *“Qampên PKK’ê li Ermenistanê hene. Milîtan li wir perwerdeyên xwe dibînin...”* Ez jî ji neçariyê difikirîm, gundê me nêzî sînorê Ermenistanê ye, biçim li wir û ji wir bigihêjim qampê û ji qampê jî derbasî eyeleta Serhedê bibim. Di bingeha vê fikrê de ez ketim ser rêya Qersê, da ku di ser sînor re derbasî Ermenistanê bibim.

Bi alîkariya dostekî ji DEV-YOL’ê min sînor derbas kir û çûm paytextê ango Êrîvanê. Bi rêya Kurdên Êzidî bi hevalên wir re têkiliyên min çêbûn. Heval nîv qaçax bûn, komaleyeke bi navê Kurdên Êzidî hebû. Wekî din ti tiştek tunebû. Ne qamp, ne jî perwerde… Çend hevalên me jî di zindana Ermenistanê de bûn. Pênc heval karên siyasî dikirin. Ew jî ti sitatuyeke wan a hiquqî nîn bû. Derewê rojnemeya tirkan ez anîbûm li vir.

Hevalê berpirsyar hate cem min got *“tu yê biçî Moskovayê, partî talîmat daye”*. Eman gidî, ma çi karê min li Moskovayê heye? Heval *“partî dibejê”* û xelas, *“tu yê sibê bi balafirê biçî”*. Talîmat e, ez çi bêjim. Balafirgeh, cara yekem e ku ez bi balafirê rêwîtî dikim. Ditirsim, xemgîn im, lê hevalê çiyê min sozek dabû wan, “ezê bêm” ev çi talîmat bû. Bêpasaport, qaçax di balafirê de me.

Moskova, balafir disekine tam hatim ber derî da ku dakevim polêsek pasaport dipirse ez bilêtê didim dest, rûyê min dinihêre, bangî yekî din dike û bi pîlot re diaxivin, tiştina li lênûsekê dinivîsin min paşê li balafirê siwar kirin. Tirsek kete dilê min, gelo dewleta Ermeniyan min nede tirkan, an jî nevêjên girtîgehê? Kursiya min jî ji dest çû, ez ber derî wek girtiyekî ser kursikî dam runiştin. Pîlot Azerîkî diaxivî min jê re got *“ma tu Azerî yî”* got, *“na ez Ermenî me”* min lê vegerand, *“bira ez Kurd im û partîzan im min nede dewletê, alikarî bide min”*. Pîlot matmayî *“tu rast dibêjî partizan î?”* *“belê”*. Pîlot, *“baş e, ezê li nav rêwiya binihêrim ka Kurd hene yan na, ger hebin tu xwe bi wan bide nasîn û tevî wan dakeve biçe, ezê kaxizê te dereng bidim polêsan, heya wê demê tu jî bireve”* min jê re spas kir. Demekê kurt pîlot hat ez birim nava balafirê malbeteke kurd a Êzdî, dayikek-bav kur, bûk û qîza wan. Di balafirgehê de min xwe da nasîn û min dest bi propagandayê kir. Ez kurtasî; partî, Serokatî, Kurdistan, bindestî, têkoşîna Serokatî û hwd. Şîrove dikim. Ev propagandayên min berdewam kir, em derketin derve û min hê jî berdewam dikir. Mezinên wan (pîremêr) bi acizî got *”bira lêbinêre, me te xelaskir ka biçe partiya te jî, serokê te jî li me nabe, em Apocî ne, te fêm kir?”*. Gotinên min li ser lêva min cemidîn *“ma ez jî Apocî me”*, zilam *“lê ev Serok û partiya te çi ye?”* Êdî ez çi bêjim, rastiya civakê, min du saetan vala vala propaganda kiriye. Êdi ez naskirim, ev car wan ez bernedam bi eraba xwe min birin Êrîvanê radestî hevalan kirin.

Ji Êrîvanê me berê xwe da ber bi Gurcistanê. Paytexta Gurcistanê Tibîlîs bajarekî di nav dolekê û di nav dolê de jî çemek diherike. Ji rojhilatê bajar dema ber bi Ermenistanê ve mirov diçe peykerekê xanima Tamara heye. Tamara di sed sala 16`emîn de

keybanûya Gurciya ye. Peykera wê di destekî de şûr, di destekî de jî fîncana şarabê heye. Wateya vê, yên ku bi dostayî bên vî welatî wê bi şarabê bêne pêşwazî kirin, na ger ku bi dijminayî bên wê bi şûr ve bêne pêşwazî kirin.

Li wir heval Zeynel ez pêşwazî kirim (Orhan Kaya), çend roj li Tibîlîsê mam û bi otobusekî ez ketim rê da ku biçim Moskova. Rê wê sê rojan bikişîne. Çentekî erzaq di rê de min dabû cem xwe. Rê di çiyayên Kafkasê re derbas dibû. Şofor soz dabû hevalan da ku min bêpasaport derbas bike. Em di deriyê Gurciyan de rihet derbas bûn. Lê dema em nêzî deriyê Rûsya bûn şofor got, *“mijara Çeçenan heye, ez nikarim te derbas bikim.”* Ez veciniqîm, tirsiyam *“ma te soz dabû”*. Şofêr qet min guhdar nekir, ji otobusê daket xwarê, deriyê dawî girt da ku herkes bila di deriyê pêş de dakeve. Du leşker hatin devê derî, da ku pasaportan bigirin bibin qontrol bikin û bên. Di otobusê de nêzî 15 jinên Kurd ên Êzidî hebûn, ev jin diçûn Moskova. Wê di bazarekî de pel bifroşin, ji ber ezmûna min a balafirê *“xuşka min ez Apocî me, ma hûn nikarin min xilaskin”*? Hemû li min zîvirîn *“tu Apocist î”?* Bi dengekî tirs, sivik *“belê”*. Gotin, *“were li cem me rûne, em ê leşkeran hildin nav xwe tu jî di nava lingên me re derbas be”* (bi gurura feodaltî zehmet be jî) min gotinên wan qebûl kir. Rastî jî van jinan li devê deriyê otobusê leşker kirin nava xwe, hinde qelebalix, tevlîhevî kirin ku leşker şaşo maşo bibin. Ez jî bi rihetî di nava lingên jinan de çûme derve, ketim nava girseyê. Karê qontrola giştî xelas bû, bi rehetî em li otobusê siwar bûn û wan jinên kurd ê wêrek heya Moskovayê ez parastim, bi rihetî gihiştim hevalan.

## ÇAR SALÊN LI SAHA YDS

***Kazakistan, Kirgizistan, Ozbekistan, Adirbeycan, Rûsya, Gurcistan, Ermenistan***

Li Moskovayê Mahîr Welat bi min re li ser karê gel, girîngiya kar, Kurdên saha sovyetê axivî. Piştî axaftinên Mahîr, min fêm kir ku, hevalên Ermenistanê ji Mahîr re gotine *"di karê gel de hevalekî biezmûn e"* Mahîr jî bi navê Partiyê bangî min kiriye. Ez di dilê xwe de pir ji hevalê Ermenistanê qehirîm lê êdî hatime, divê bixebitim.

Karê min ê destpêkê perwerde dayîna şervanên nû bû. Maleke çar ode, taxeke Moskovayê, şagirtê malê 20 kes in, sê jin 17 xort û her yek ji wan ji cihekî hatine; Gurcistan, Kazakistan, Ermenistan, Rûsya û bakurê welat. Cara yekem e kurdên Êzidî û Musluman li ba hev û pêkve xwarin dixwin, pêkve didin û distînin. Kesayetên wan; yek di artêşa Gurcan de Serheng e (fermandarê taburê) ên din jî xwendavan, serxoş, lunpen, feqîr, karker, yek jî dîn-şêt bû. Rojê pênc-şeş caran şer dikirin. Bi rastî min ne wan perwerde dikir, di kesayeta wan de rewşa kurdayetiya reel nas dikir. Êzidî û musilmantî, kesên sed sal e ji walatê xwe qut bûne, di nava çanda Rûsan, Ermen, Gurcî, Azerî jiyan e. PKK wan aniye ba hev, perwerde dike û bi wan re wê şoreşa Kurdistanê bike. Ev rewşeke zehmet bû, rojane şerên wan bû, nakokî kûr dibû û ev yek min ditirsand.

Di dawiya perwerdê de, ew kesên ku rojane şer dikirin niha li rex hev, wek bira di balafirê de ber bi welat ve difiriyan. Lê dînê me ma, hevalan ji wî re jî kar dîtin; di mala Kurdan de ji mêvanan re xizmet dikir.

## Moskova

Gelek tişt, bûyer hene pêwîst e bên şîrovekirin, an jî lêkolînkirin. Lê mijara min ne ew e, ne jî derfetên min hene ku lêkolîn bikim û binivîsim. Lê dikarim hin kurte bûyer, serpêhatiyan binivîsim. Di dema Sovyetê de pergalê, gelê Sovyet di bin banê biratiya gelan de bi her têgîn, rengdayîna sosyolojîk, ramyarî li ser bingeha şovenîzma Rûsan sazkiriye. Ji ber vê bêhtir Kurdên qada Sovyetê di bin bandora Sovyet û bi taybetî jî ya Rûsan de mane. Her wiha ji mirina Lenîn şûn ve Partiya Bolşevîk Moskova kiribû navenda her tiştî. Moskova navenda Partiyê û li navenda partiyê jî şovenizma Rûs bûye bingeh.

Li ser vê ferasetê destgirtina Kurdan, kambax û malwêran bûye. Partiya Komînîst di dema beriya Şerê Cîhanê yê duyem de, (salên 1936-37 û heta 1945'an) Kurdên Kurdistana Sor, Kurdên Kafkasya bi darê zorê koçberî Asya navîn dike. Di serbarê ser de; dewleta Tirk bi Partiya Komnîst re li ser Kurdan hevdîtineke veşartî ango peymanekî çêdikin. Li gorî vê peymanê *"Kurdistana Sor dê bê belavkirin, kurd ê koçberî Asya Navîn bibin, tirk jî axa xwe ji Almanan re, ji Hîtler re venakin da ku di ser Tirkan re êrişî Sovyetê neke".*

Derva hewayekî sar, berf dibare; dostekî di telefonê de got, *"pêwist e em hev bibînin, lê divê tu tenê werî"* û her wiha cihê em ê li wir hevdu bibînin terîf kir. Ji metroyê daketim heya gihaştim cihê hevdîtinê ji serman simbêlê min qeşa girt. Dost xwendevanekî zankoyê bû, piştî silav da û rewşa min pirsî, xwendevan yekî din bi min da nasîn; ew jî kurdekî koçber, penaberekî Rojhilatê Kurdistasnê bû. Em pêkve çûne mala hemwelatiyê Rojhilatî; Xanima dost Rûs bû, qehwe anî û kişya oda xwe, dost di nava çentê xwe de dosyayek dirêjî min kir. Di nava dosyayê

de nêzî sed rûpel hebû û bi nivîsa rûsî hatibû nivîsandin. Min bi rûsî nizanî bû, rûpel di ser hev de quliband û girt. Dost dizanîbû ez rûsî nizanim biken *"ka ji te re bibêjim, beriya her tiştî tu sozeke kurdewarî bide min da ku tu bêjî van belgeyan kî daye te, te çawa wergirtiye û hwd. Bi kurtasî tu min nasnakî û bi teybet jî ji Mahîr Welat re navê min nabêjî."* Wextê ku navê Mahîr got ez demekê fikirîm, wek rêgezekî PKK´ê divê ez bibêjim, lê ezmûnên min ên di nava gel de gelek tişt fêrî min kiribûn, pêwîst e her tişt "rasterast" nebe. Min got, *"belê, serê min jî biçe ez ê navê te nedim"* ew roj heya niha jî min navê wî dostî neda. Di belgeyê de çi hebû? Peymana di 1936´an de ya di navbera Tirkan û Sitalîn de ku wê dijberî kurdan çawa hevbeş tevbigerin, kêlî bi kêlî hatibû diyarkirin. Li gorî vê peymanê heya ku Sovyet hilweşiya jî di meryetê de bû; di rastiyê de hêjî didome.

Min belge anî mala Kurdan, da hevalên rojnama AXÎNA WELAT, KUDISTAN RAPORT. Wan hevalan jî beşeke wê weşandin. Rojname belavbû du roj derbas bû. Mahîr Welat hate mala Kurdan, bangî min kir û got *"heval dibêjin ev belge te aniye, ev belge pir girîng in, kî da te em jî wî/ê dostî/ê binasin ê baş be"*. Êdî ji bo min diyarbû ku Mahîr ji cem îstîxbarata Rûs hatine û wî/ê dostî/ê dixwazin. *"Wele ez jî nasnakim, di metroyê de em rastî hev hatin, me hev nasî û wî jî got sibê were çend belge hene ezê bidim te wê kêrî we were. Min jî fêm nekir çi ye û hê jî naveroka wan nizanim, ma çi ye? Ger xeter be ez rexnedana xwe bidim..."* Mahîr demekê li min nihêrî, *"na navarok baş e, lê ger cardin wî kesî bibînî bîne em jî binasin ê baş be"*. Ez ji oda rêvebiriyê derketim, hevalên rojnemevan li devê derî li benda min bûn, *"tu pirsgirêk derket?"*, *"na, wê çi pirsgirêk derê, belge baş bûn?"* Heval keniyan bi kêfxweşî *"pir baş bûn"*.

Li gorî wan belgeyan, Kurdên Kurdistana Sor sirgûnî Asya Navîn bibin û wê di sê welatê nijad tirk (Kazakistan, Kirgizistan û Ozbekistan) de bêne belavkirin. Ên li Adirbeycanê bimînin jî li ser bingehê nasnameya azerî qebul bikin ê destûr bê dayîn. Li ser vê plansaziya Komînîst, partiya sovyetê deskeftiyên Kurdan ên çandînî, aborî, polîtîk

ku dema di avabûna sovyetê de bi dest xistibûn hatin belavkirin, talankirin û ji sed hezarî zêdetir Kurd li şemendeferan (tiran) siwar kirin, berên wan dane çolên Asya Navîn. Di rêyan de gelek nexweş, zarok, jin û pîr ji ber dijwariyên rê dimirin. Kurdan bi tenê li cihekî yan jî li bajarekî bi cih nakin. Wek polîtîqaya tirkan a bi navê “mecbûrî Îskan” her gundekî, bajarekî, navçeyekî, newalekî; di nava tirkên misket an jî turkmen de belav kirin, niştecih kirin. Di nava asîmîlasyonê de asîmîle! Gorî agahiyên Prfesor Nadir Nadirov ji me re got, heya 1968’an jî ketin derketina gundiyên kurd a ji gundên xwe, bi îcazetê bûye, ango wek qarantîna lê tînin da ku Kurd bi cîhanê re pêwendî çênekin. Li ser Kurdên Adirbeycanê jî asîmîlasyon bingeh tê girtin û niha nêzi milyonek Kurd asîmîle bûne û bi kurdî nizanin. Yek ji van malbatan eşîra Celaliyan e, serokê Adirbeycanê Haydar Aliyev jî yek ji wan e. Niha kurê wî Serok-komarê Adirbeycanê ye. Rojekê li paytexta Adirbeycan Baku’yê, di taksiyekê de min li şofor pirsî tu ji çi miletî yî, wî jî got “atam Kûrttû ozûm azeriyem” (ango kal û bavên min kurd in lê ez bi xwe azerî me)”. Bêyî bifikirim û hema wisa bêhemdî xwe min got *“ma tu pîj î?”* Zilam taksî da sekinandin hindik mabû li min xista, min bineçarî nasnameya xwe ya siyasî jê re got, hinekî jî bi propagandayê min xwe xilas kir. Bi vî rengî zilam hema bibêje bû dost, heya ew cihê ku ezê biçûma, bir û perê rê jî ji min nestand.

## Adirbeycan

1996 bihar; heval bi min re axivîn da ku biçim Adirbeycanê û li wir civinekê bi rewşenbîran re çêbikim. Û delegên konferansa Kurdên YDS wê were sazkirin, her wiha li wir hevalan hin sazî avakirine, hin pirsgirêk hene pêwîst e ew jî bêne çareserkirin. Bi pasaporteke sexte ez ketim rê û bê qeza-bela gihiştim paytexta Adirbeycan Baku'yê. Baku navekî aryenî ye, wetaya wê bayê bakur e, rastî jî heftê sêh rojan bayekî bakur ê hişk lê dide û bêhna behrê, petrolê li rûyê mirov dide.

Randevuya min bi rewşenbîr û helbestvanê Kurd Şamîl ASKEROV re di parka bajêr a herî mezin de hebû. Apê Şamîl hat, li serê wî foterek, di dest de ji darê heyzaran gopalek, paltokî reş, serî rut- kurkirî hat û ji dûr ve silav da min. Wek di fîliman de kesên qaçax ango îstîxbarî li ser bankeke koşê rûnişt, der û dor temaşekir. Hêdîka ber bi min zîvirî *"heval tu yî"* cardin dûr nihêrî, min jî *"belê ez im"* bi vê gotina xwe re min hew dît Apê Şamîl dest bi axaftinê kir û du saet navber neda, nehişt ez jî gotinekî bibêjim. Di pêvajoya ku axivî de yekcar nezîvirî li min temaşe nekir, wek ji parka vala re diaxive bû. Paşê li min zîvirî *"kerem bike tu yê çi bibêjî"* ez hêdîka rabûm ser xwe, bêyî ku lê binihêrim *"tiştek nîn e, paşê emê biaxivin, bi xatirê te"* û ez meşiyam ji parkê derketim.

Êvarê ez çûme mala Mihemmed Babayev. Navê din Mehemedê Silo, ji eşîra Birûkî ye û di dema Komara Mahabadê de endamê îstixbarata Sovyetê bûye. Her wiha di navbera heyata Rûs û Qazî Muhammed de wergermendî kiriye. Li gorî ku ew dibêje, dema Sovyet ruxuyaye ji bo Kurdistana sor cardin ava bibe hewildan daye lê bi ser neketine. Lê di rastiyê de Apê Mehemed bi navê îstîxbarata azeriyan, navê Haydar

Aliyev nakokiya Êzdî û Bisilmanan derdixe. Her weha nahêle gel bê saziyê, dîsa nakokiya “kî bibe serok” û li ser vê li hev nakin; revşenbîrên din dikevin hev û piştre belav dibin. Erdê ku Kurdistana sor lê saz bûye, li ser wê jî Ermen û Azerî şer dikin û di roja îro de jî ev nakokî berdevam e.

Min bi Mehemedê Silo re xwarin xwar û di dema qehwe vexwarinê de got;*“heval min Kurdistana Sor ava dikir, lê PKK`ê nehîşt.”* Ez bi matmayî *“çawa, ev ji ku derket, dema Sovyet ruxuya PKK ne li vê derê bû. Her weha tu tesîra PKK´ê li ser we jî nebû mamo”.* Lê mamê Mehemed êdî despê kirîbû pesnê xwe dida, behsa xwe û Pêşawa Qazî Muhamed kir. Çawa alîkarî lê kiriye û çawa alî Mele Mustafa Barzanî kiriye, derbasî Rûsyayê kiriye. Êdî bi guhdarkirinê ez westiyam, min jêre got, *“mamo te fêlbazî û derewên Rûsan jî ji wan re got an negot, çawa Komara Mahabatê firotin jî tercûme kir an na?”* Mamo sor bû, keserek kişand *“mirov bi we re nikare biaxive, hûn mirovan poşman dikin.”* Rastî tehl bû, apê Mehemedê Silo ji min qehirî, çû oda xwe raza. Sibeh di roj başê de li ser taştê, apê Mehemed got; *“xwarzî wê demê tişt ji destê me nedihat, cîhaneke bêrehm bû, îro jî wisa ye hûn pir aqil germ in, lê dîsa jî hişyar bin, xetayên ku em ketin hûn mekevin.”* Min jî ji ber ku dilê wî şikandibû lêborîna xwe xwast.

Li Mala Kurdan, nêzî 60 rewşenbîr amede ne û emê civîn çêkin. Apê Şamîl Askerov hat cem min, *“ka were em kêmekî biaxivin, te wê rojê çima pişta xwe da min û çûyî?”* Em li ser kursî rûniştin, *“baş e apê Şamîl, di me kurdan de gava mêvanek were mirov despêkê xêrhatinekî didê, rewşa wî/ê dipirse, têr e yan jî birçî ye, cihekî xwe lê star bike heye yan nîn e... lê te bê ku tiştekî bipirsî destpêkir, rexne kir û du saet nehîşt ez yek gotinî bêjim. Ma min ê çi bikira, ez ji neçarî çûm.”* Apê Şamîl bi şermoke lêborîna xwe xwest, *“ez li dewsa bavê te me, tu jî şoreşger î, pêwist e dilê te vekîrîbe, nexeyîde”.* Em li hev hatin, derbasî salonê, nav rewşenbîrên din bûn.

Civîn despê kir lê ji her yekî dengek dertê. Her kes diaxive, kes kesî guhdar nake, ez her dikevim navberê da ku dest bi civînê bikim lê

nahêlin dengê min biçe yekî jî. Êdî min ji neçarî destê xwe hişk li masê xist *“hele bîr kîriyin, îndî sîz deyirsîniz bu dağdan gelîf eşehtî, başa tüşmür”* ( ka bê deng bin, hûn niha dibêjin ev ji serê çiyê hatiye, ker e fêm nake). Apê Şamil *“heşa kî ji te re ker bêje ezê bi her du tiliyên xwe çavên wî derînim”*, herkes bê deng bû, min despê kir, *“min bangî we nekiriye?”* gotin *“belê”* min; *“belê can, wê demê bêhelin ez biaxivim”* yekî got *“ha tu hezdikî biaxivî”,* “erê ez dixwazim biaxivim.”

Axivîm, civîn destpê kir, delegeyên Konferansê hatin hilbijartin. Ew rewşenbîrên sirgûn, bêwelat, feqîr hemû min vedixwînin mala xwe. Wê êvarê çûme mala Ahmedê HEPO. Apê Ahmed mêvanperwerekî hêja derket bi qasî ku diaxivî ewqas jî guhdar dikir. Paşê helbestvan Bahrî Bala hate serdana me. Roja dawî ez çûm mala Mehmed Babayev; Babayev *“xarzî tu ji vê eşîrî yî ………., yê vî bajarî yî, em jî malxalanê te ne”* min matmayî li wî temaşe kir, rast digot lê ev dihat weteya apê Mehemed hêjî bi îstîxbaratê re dixebite. Çûm cem Apê Şamîl Askerov di dest wî de pirtukek, keserek kişand, *“heval ev pirtuka min a helbestan e, min zimanê Azerîkî nivisî ye, li vir çap bûye lê ger derfeta we hebe hûn wergerînin zimanê kurdî û çap bikin, ezê pir kêfxweş bim. Min ê bi xwe ev kara bikira lê temenê min têrê nake her weha derfetên min ê çapkirinê jî nîne.”* Pirtuka Apê Şamil 540 rûpel bû, navê pirtukê “LAL KIZ” (keça lal), ew 540 hemû yek helbest bû û di kesayeta keçeke lal de dîroka Kurdistanê nivisîbû. Ew şev nerihet razam, di berbangê de ketim rê. Bi pasaporta sexte li balafira Bela Rusya, ber bi Miskê ve firiyam, şev saet dudu, li balfirgehê ji ber pasaporta sexte hatim girtin.

Min birin zindanê xistin nava serxweş, diz û dînan. Ez ketim gireva birçîbûnê. Armanca min heval pê bihesin da ku min xilaskin, pasaport a tirka ye, tirsa min ew bû ku min bidin tirkan. Roja sisêyan berpirsê îstîxbaratê hat min birin oda wî (zilamekî zexim, ser xwe, çavekî biçûk) li min temaşekir û got *“em te nas dikin, bi Moskovayê re me peywendî çêkir hevalên te agahdar in, xwarina xwe bixwe emê di demekê kin de te berdin.”* Ez ji odê derketim, gardiyan di pişt min re xwarin anî.

Roja dehan min li erebekî ser girtî siwarkirin birin balafirê û wek qaçaxî sînor derbaskiriye 150 dolar ceza birîn û dokumanekî rojekî dikarim di Miskê de bimînim dan destê min û ji min re gotin, *"dikarî biçî pasaporta xwe ji konsola tirkan bigirî".* Ez keniyam û min kaxiz wergirt ji odê derketim der. Li otobusê siwar bûm çûm nav bajêr û li garaja şemendefer bilet ji bo Moskova stand. Êvarê hatim deriyê şemendefer, li ber derî xanimekî zerik, makyejeke balkêş kirî *"pasbort"*, min jî bi rûsiya xwe ya *"niha hevalê min ê bîne"* xanim henekê xwe li rûsiya min kir, rê da min ez derbasî şemendeferê bûm. Şemendefer ket rê, xanima hostes hat, biletan qontrol dike, min 20 dolarek xist li nava biletê û wer da dest, bilet qontrol kir, li min nihêrî dolar kir berîka xwe silav da û çû. 12 saet şûn de gihiştim Moskovayê.

Çend roj beriya sala 96´an xilasbe hevalan erkek dane min da ku biçim balifirgeha Moskova da ku mêvanekî pêşwazî bikim. Li salona rêwî lê disekinin ez jî li cihekî vala rûniştim û min li ser kartonekê "Kurdistan raport" nivîsî da ku mêvan min nas bike. Mêvan ji Tirkiyê dihat, demjimêr 12´ê şevê anonsa daketina balafira tirkan got. Karton di destê min de çûm li deriyê rêwî jê dertên sekinîm. Demeke kin derbas bû, êdî rêwî derdiketin. Rêwiyên ku di destê min de kartona Kurdistan raport nivisî didîtin wek cinan lêdaye mat û xwe dûrî min digirtin. Tirse tirs li min dinihêrîn û bi lez dûr diketin. Mêvanê min ber bi dawî hat, silav da min. Piştî merhabayeke kurt em çûn taksiyekê siwar bûn.

Mêvanê min yekî nas bû, çawa nas? Ez 12 salî û şivan bûm, diçûm li ber canegan, ev mêvanê min bazirganê canegan bû. Hatibû gundê me, dixwest canegên me jî bikire lê bavê min perekî pir zêde xwestibû da ku nefroşe û nefirot. Ji ber ku bavê min canega nefrot ez ji bavê xwe aciz bûm, qaşo ger bifrota ezê ji zozanan bihatama malê. Dema bazirganê me çû, bavê min gazî min kir, *"ma tu dizanî min çima wiha kir? Binihêre kurê min, bavê wî bazirganî parlementerê Tirka ye, dewleta romê li pişta wî ye, ger paşê perê me nede emê çibikin?"* Ez neçarî bêdeng mam. Çend meh derbasbûn, bavê min mafdar derket; bazirganê me li

herêmê nêzî 300 canegên gel kirî bû, perê gelekan neda û xwar. Welhasil niha em di taksiyê de ne, ji min re behsa kurdeyatî û welatparêziyê dike. Em gihiştin malê, derengiya şevê ye lê dîsa jî me çay-nan xwar.

Beriya razê min jêre got;

– *"Ma tu berê ne bazirganê canegan bû yî?"* reng cemidî, lê bi aweyekî xwînsar

–*"Tu ji ku min nas dikî?"*

–*Bavê min li meydana dewaran, dewar dikirî û difrot..."*

– *"Navê bavê te çi bû, hûn ji kîjan gundî ne?"* min derew kir, nasnameya xwe jêre negot. Mêvanê min Kurê Melik Firat, Abdulqadîr bû. Çi bibêjim. Roj rabû got, min bivê ez hez dikim meydana sor, mozala Lenîn bibînim. Bazirganê min bûbû Lenînîst!

## Kazakistan

Li Kazakistanê nêzî 220 hezar kurd dijîn. Kurd bi giranî di gundan de dijîn. Di van salên dawî de xwendevan, an jî karmendên dewletê di bajaran de jî bi cih bûne. Polîtîkaya Partiya Komînîst a Rûs, kurdên Kurdistana Sor di 1936- 1937´an de sirgûnî li vir kiriye. Di vê sirgûnê de, Kurd der û dora Bajarê Alma Ata, Çimkent, Canbul û navça Çuye, kurtasî gund bi gund belav kirine û ev gundanan bi giranî nêzî tirkan, turkmenan, an jî li heman gundî cih kirine.

Kurdên li wir di hestên netewî û kurdayetî de welatparêz in. Giranî alîgirê tevgera azadî PKK´ê ne. Rojnemeyeke mehane ya fermî bi navê Kurdistan derdiket. Xebatên çand, şano, govend, dengbêjî û komên mûzikê dewam dikirin. Sazî, yekîtiya rewşenbîrên kurd, mala kurd, komala ciwan hebûn.

Dewleta Qazax bi riya rewşenbîrekî û berpirsiyarê Mala Kurda Bedir MÛSAYEVİC banî me kir, ez û hevaleke jin çûn. Hevdîtin neyînî bû, di otelekî de pêk hat. Heyeta wan du kes bûn û em jî sê kes. Em du heval û Bedir MÛSAYEVİC navbend û tercuman bû. Kesê ku bi me re rûniştin yek Rûs yek jî Qazax bû. Nêzîkatiyên dîplomatîk xêrhatin, bi rûyên ken dan û standin xilas bû, destbi fermiyetê hate kirin. Axaftina destpêkê Qazax kir û got; *"em û gelê kurd dostên hev in, helbestvanê me Canbul şagirtê Ehmedê Xanê ye, em jî hez dikin alî we bikin, lê hûn dizanin zextên dewlata tirk li ser me zor e û sîxurên wan li vir gelek in. Pêwist e em we biparêzin, ger we kesên wan nasî, ji me re bêjin da ku em jî alî we bikin".* Hevdîtin xilas bû, lê tişta min fêmkir ew hezdikin me bikin sîxurên xwe, qaşo emê sîxurên tirkan tespît bikin, ji wan re bibêjin ew ê jî alî me bikin. Dika politikayê bû, her kes hezdike berjewendiyên xwe biparêze.

**Amadekariya Newrozê**

Bernama me; em ê newroza 01/04/1997'an pîroz bikin. Saloneke nêzî 7 hezar kes lê bi cih be, me kirê kir. Perê kirê me di destpêkê de da ku piştre pirsgirêk dernekeve. Bilêtên Newrozê hatin belavkirin, ciwan gund bi gund, bajarê Alma Atayê tax bi tax di nava Kurd û dostên Rus, Qazax de digerin û popaganda dikin. Ji aliyê din ve dewatname hatin amadekirin. Dawetname di kovara rusî KURDISTAN RAPORT a li Moskovayê derdiket de jî hate weşandin. Wekî din di nava zarfekê de ji hemû konsolxaneyên li Kazakistanê, yên tirkan û her wiha kesên rewşenbîr, pêşeng û rûspiyên civakê re dawetname hatin şandin.

Xebat ji her milî ve dimeşiya. Li Kazakistan di Zankoyan de nêzî 200 xwendevanên Bakur û Başurê rojava hebûn, ev xwendevan her yek ji wan wek kadroyekî/ê dixebitîn, çalak bûn. Hêj ji pîrozbahiyê re deh roj hebû, erkdarên dewletê bangî Bedîr MÛSAYEVİC kirin. Bedîr çû û hat, medê wî tirş, bikeder bû. Me bi merax lê temaşe kir, wî bi xwe destbi axaftinê kir *"serokê îstîxbarat û yê polêsan ji min re gotin em destûr nadin hûn Newrozê pîroz bikin, divê hûn pîrozbahiyê betal bikin."* *"Te çi got?"* Apê Bedir li me nihêrî, *"min got ezê bi saziya xwe re biaxivim paşê biryar bidim"*. Me demekê guftugoh kir û biryara me, emê pîroz bikin bû.

Roja din apê Bedir bi telefonê serokê polêsan gerya û biryar jêre got. Polês di telefonê de neaxivî, bi tenê got *"baş e, emê paşê li ser bisekin."* Rojên din îstîxbaratê bîst û çar saet em şopandin, hiraşe, tirsandin bikar anîn. Ji pîrozbahiyê re sê roj ma, dewletê cardin bangî apê Bedir kir, evcar me pêre du ciwan şand. Ciwanan li ber deriyê saziya îstîxbaratê dihêlin û li jorê Bedir tehdît dikin, da ku gav bi paş ve bavêje, ji gel re

bibêje roja newrozê betal bûye, lê Bedir bi paş ve gav navêje. Bedir beriya ji saziyê derê, serokê polêsan jêre dibêje *“keçên te hene li wan guneh e”.* Apê Bedir ji bo keçên xwe tirsiya bû, me piştgirî da, da ku netirse gav paşta nevêje. Êdî du ciwan hertim bi apê Bedir re digeriyan û me şev li cem xwe dida razandin.

Yekê Nîsanê sibeh saet 08 bû. Em li ber salonê ne, polês jî hene. Deriyê salonê venakin, me jî wêneyê Rêber APO, Hevala Zîlan û ala partiyê dervayê salonê li cihê herî bilind dardakir, def û bilûr lêda, li pêş salonê gel kete govendê. Her çû gel zêde bû, nêzî 7-8 hezar kes hatibûn. Zarok, jin, ciwan û ji her çîna civakê beşdarvan hatibûn. Çapemeniya cîhanê hatibû, weşan zindî didan. Bedir, li dora wî nêzî bîst jinên kurd sekinîne, dewlet hewldide da ku gel belav bike, jinên kurd nahêlin polês nezî Bedir bin. Keça Bedir jî di parastina xwendevanan de ye. Hekîm Sefkan di serê govendê de ye, def û zurnê, govend û Kurd. Mêvanên ku me bang kirîbû hatin rewş ditîn. Hin kesan piştgirî dan, hin kesan jî pişta xwe dan û çûn. Dostê rojên zehmet Prefesor Nadîr Nadirov li cem me, daxuyanî da çapemeniyê û zextên dewleta Qazax şermezar kir. Rewşenbîrê kurd dervayê Hûsêynê NARÊ(Huseyn Museyeviç), Nadir Nadirov û Bedir hemû em tenê hiştin, ji koşê kolanê rewş temaşe dikirin, teybet jî Kinyas Îbrahîm.

Di wê tevliheviyê de jinekê ciwan, di dest de bîdonek û posterê Rêbertî. Polês dixwazin posterê daxînin, ew jin bîdona benzînê tîne ser xwe qîrdike û dibêje *“ezê xwe bişewîtinim”* polês direvin, lawa dikin da ku xwe neşewitîne. Hemû kamera wê dikişînin, ew jî poz dide, bîdon û heste li dêst de çep û rast vedigere. Ez û du ciwan çûne cem, Gulçê *“rastî benzîn e yan av e, lê ne xem e tu li vir be. Him ji bo te reklam e, him jî nehêle posterê daxînin.”* Gulçê *“bi xwedê benzîn e, ezê bela wan xwe bişewîtinim”* em jê dûrketin, lê rastî jî heya çalakî ber dewamkir Gulçê ew poster parast.

Demjmêr 13 kêm 15, mamê Nadîr Nadirov bangî min kir got, *“erkdarê dewletê dibêjin heya 15 xulekan eger hûn belav nebin emê belav bikin”.* Min jî got *“baş e Xalo sipas emê çareser bikin”*. Min

banê Hekîm Sefkan kir *"bikeve pêş gel, bi def û zurnê ve ber bi Saziya serok-komariyê bimeşin û astengiyên polêsan jî nasnekin".* Sefkan bi dengekî bilind bangî gel kir kete pêş, gel jî da pey û meş bi dirûşmên; bijî Kurdistan, bijî Newroz, bijî PKK, bijî Serok APO kolana paytext, Almatayê dagirkir. Li bajêr hatin çûyîna wesayîtan kilît bû. Ciwan li aliyekî, girse jî li aliyekî.  Girse wek parêzvan; ez jî di nav de dimeşiyam, du xwendevan li cem min û dudu jî ferman tînin û dibin paş-pêş. Polêsan rê birîn, bend danîn. Lê belê gel lêda û derbas kir. Kulm, lêdan û copên polêsan guhdar nekirin. Bi navê Welîd xwendavanekî Başurê Rojava, li ser darê bi kamerayê gel dikişîne. Di wê lehzê de dibîne ku yek di dest de kêr nêzî Qîza Bedir dibe. Hema bi tevî kamereya xwe, xwe ji darê avêt ser wî kesî. Êdî ew kes di nav gel de wek gogê lêhat. Ji lêdanê ji xwe ve çû. Wek nîv mirî, avêtin kêleka kolanê, nav polêsan. Em nêzî avahiya serok-komar bûn, ev car hêzên taybet pêşiya me birî. Wek diwarê hesin lê hat, ew li me dixin, em li wan dixin lê nikarin derbaskin. Di serî de Hekîm Sefkan gelek welatparêz û rewşenbîrên kurd çend cop, penko, pehîn û kulm xwarin.

Me berê xwe da kolanekî din, gel dimeşe, di wê meşê de hin jin û kal digirîn! Ev girîn ne ji lêdane lê ji çi ye? Paşê ez çûm malên wan, min pirsyarkir hûn wê rojê çima digiriyan? Gotin, *"em ji şabûnê digiriyan, berê du kesên me nedihatine cem hev, cara yekem ewqas kurd li ba hev, mil bi mil dimeşiyan û alîkariya hev dikirin".*

Berpirsyarê polêsan hate cem min, ji xwendavanê cem min re got *"bêje bila gel bide sekinandin, werin em salonê didin we".* Wekî ku pêwendiya min pê nîn e, *"çi karê min pê nîne, tu biçe bêje bila bizivirin".* Şefê polêsan *"ez nas dikim tu kî yî, soz didim werin salon ê we ye"* ez lê zîvirîm *"soz?"* wî jî biken *"erê erê soz, soza dostayî"* me ferman da ciwanan, gel zivirandin salonê.

Demjmêr 15. Salon tijî bû, Xalê Nadir Nadirov ê axaftin bikira lê westiyabû nikarî. Hunermend westiyayî. Ji sibehê ve qîr, hawar deng nemaye, nikarin stran bibêjin. Hekîm Sefkan hat li cem min û got;

– *Heval deng nema, ez nikarim stran bibêjim, emê çibikin"*

– *Baş e hevalê Sefkan 7 hezar gel ji sibêhê li cem me ne, di kolanan de şerkirin û tu stran nebêjî û bêyî mala Kurdan, paşê emê ji partiyê re çi bibêjin?*

– *Baş e ezê bi tenê du-sê sitran bêjim"*

– *Na heya ez îşaret nekim, ku tu ser dikê dakevî rewş ê xirab be.*

Sefkan camêrtî kir, bi rastî jî heya ku me îşaret neda ji dikê daneket. Ez û ciwanek li goşekî rawestiyabûn, ew kesê îstîhbaratê ku di otelê de me hevdîtin kirîbû, yê Rûs nêzî min bû silav da û Newroz pîroz kir, bê ku rawest e çû.

Evarê şahî xilasbû, em hatin Mala Kurdan, Heval Karasu ji Îranê telefon vekiriye, Rêber APO bûyer di televîzyonan de temaşekiriye û me pîroz dike. Rastî cara yekemîn di hevalekî raya jorê re axaftin û li ser navê Rêbertî pîrozkirinek girtin hişt ku ez tevlîhev bibim û min nekarî bi hevalê Karasû re biaxivim.

Wê rojê Mala Kurdan jî heyanê derengiya şevê govend hatin girtin. Gulçê li serê govendê bû. Nexwe di bîdonê de birastî jî benzîn hebûye. Roja din hemû tv qazax, rûs ev bûyer guftugoh dikirin. Apê Nadîr Nadirov di kanalekî de bi konsolê tirkan re nîqaş dikir, ev bûyer bi têra xwe ketibû rojevê.

**Kinyas Îbrahimov**

Kinyas Îbrahîm, zankoya Kazakistanê profesorê beşa zimanzaniya tirk e, lê bi eslê xwe Kurd e. Qaşo xwe welatparêz dide nasîn. Li wan salan, qaşo di rojnemeyên tirkan de, weke PKK`yî dihate afîşekirin, lê di rastiyê de (çendî rast e nizanim) di nava gel de Kinyas Îbrahim wek sîxurekî tirkan dihat nasîn, gel qet jê bawer nedikir. Hevalan jî ew nedikirin nav kar. Her weha hevalan ew hişyar kiribûn da ku dijminatiya gel neke.

Moskova, hevalan telefon vekirin; Serokatî heval hişyrakiriye, da ku Kinyas çima tehdîtkirine, wî qezenc bikin, di nava revşenbîran de erk bidinê. Rewş dihat fêmkirin, pêwîst e em jî Kinyas li dewsa ku dijber bikin sûd jê wergirin. Li ser vê me pê re têkilî çêkir. Bi Kinyas re me çend caran hevditîn çêkir, bi rastî jî kesayetekî politik bû, fêlbaz bû. Rojekê ji min re telefon vekir da ku em hev bibînin. Em li parkekê hatin cem hev, di milê min de çenteyek hebû. Bi min re diaxivî lê çavên wî li çente bû. Diyar bû ji çente ditirse, ji bo rehetbe min got *"pirtûk têde ye"* ew jî bi rengekî pijiyayî *"wa tu çi dixwînî?" "Oblomov dixwînim"*. Di dawî de ya di dilê de xwe got; xwasteka Kinyas ew bû ku, yekê gulanê rojbûna wî ye û dixweze em jî bên. Wê me bi qîza serok-komarê Qazaxîstanê Nazarbayev û zavê wî bide nasîn, her wiha di hatinê de em ê jêre koma muzîkê jî bînin. Min xatir jê xwest û hatim Mala Kurdan.

Em fikirîn, me nîqaşkir armanca Kinyas çi ye? Em gihiştin vê encamê; Kinyas dixwaze ji Tirkan re, ji Qazaxan re bibêjê *PKK di bin bandora min de ye û li ser me siyasetê bike.* Li ser vê me jî amedekariyên xwe kir. Li gorî vê koma muzîkê wê xwe amede bike,

heya roja Kinyas kesek jî yê tiraş nebe, bi cilên normal dê bên rojbûnê û me amadekariyên din kir.

1'ê Gulanê xwendevan di zankoyê de 1'ê Gulanê pîroz kirin, ala Partî û Kurdistanê rakirin, hatin. Em jî sê heval, koma muzîkê ber bi salona rojbûna Kinyas rê ketin. Cilê li ser me siportîf, eskerî, rûyê me dirêj, çentê min wek pakêta bombê, di çar goşên wê de pirtûk hene. Der û dora salonê polêsên sîvîl hene, lê devê derî eşîra wî, ciwanên wek erkdarên ewlekarî disekinin, legerînê dikin, em ditîn bi hurmet pêşwazî kirin, serme qontrol nekirin. Rojbûn despê kiribû, em bi wî halê xwe ketin salonê, her kes li me zîvirî, ne rengê me, ne jî cil û bergên me li gorî vir bûn. Maseya me hatibû veqetandin, erkdar maseya me li me nîşan da. Kinyas di masa xwe de rabû li ser piyan, mikrofon girt bi dengekî ricifî *"birêz …… hûn bi xêr hatin"* em rûniştin, her kes li me dinihêrî, çav li ser çente bû, gelo bombe ye yan na, hevalê rex min Îlyas *"heval ez çente bibim deynim erebê baştir e, dibe ku nerehetî derkeve"* û çente bir danî erebê, hat. Xwarin hatin xwarin, Kinyas, ligel wî keça serok-komar, zavê wî hate cem. Piştî silav dayînê, Kinyas em wek rojnemevan da nasîn. Lê pêşta gotubû ku ezê we wek nûnerê Partiyê bidim nasîn, rewş dihate fêmkirin.

Li ser dikê Komek haziriya xwe dikir û muzîk bi straneke dengbêjî destpê kir, a duyem gerîla roj baş. Di şevê de gelek karsaz, dostên nas hebûn me îşaret da wan û rabûn govendê, sitranên şoreşê û welatparêziyê li pey hev dihat. Govend, dirûşma "waye PKK rabû", şeva Kinyas bû şeva PKK`ê. Kinyas reng bi reng dide, konsola tirkan jî li wir bû rabû çû. Şev xilas bû me xatir ji Kinyas Îbrahim xwest.

Roja din apê Nadîr telefon kiriye da ku em biçin cem. Nadîr Nadirov di zanko de perofesorê fizîkê bû. Çûme li zankoyê, sekreterê wî *"kerem bike li benda we ye"* ketim odê, bi ken û kêfxweşî;

– X*warzî were rûne.*

– *Xalo tu duh nehatîbûyî rojbûna Kinyas.*

– *Na, ez nehatibûm, lê we jî şev, rojbûn pir rengdar kiriye, ka bêje min, we çima ew helwest nîşan da.*

– *Ger ez rastiyê bibêjim, Kinyas hezkir ji der û dora dewletê re bêje "PKK di bin bandora min de ye" peyama me jî "na em nakevin bandora tu kesî bû", hemû ev bû.*

Xalê Nadîr çaya xwe hema bi gulmekî vewxar û got; "*dewletê jî, dostan jî welê fêm kiriye.*"

## Kirgizistan

Li wir nêzî 25 hezar kurd dijîn. Giranî li der û dora paytext Bişkekê bi cih bûne. Li wir Saziya Mala Kurdan wek saziyekî heye û dewlet fermî dinase. Di rêveberiya wê de kesek hebû, navê wî Silhedîn bû. Li wir wek rewşenbîr tê nasîn, lê di nav gel de wek ajan-sîxurê Tirkan tê nasîn, bi rastî jî ew kes îspat bûbû ku sîxurê tirka ye. Ji ber ku di nava gel de eşkere bûbû sîxur e êdî nedihat Mala Kurdan. Em jî du heval çûn da ku konferanseke fermî sazkin, rêveberiyeke nû ji bo Mala Kurdan bê hilbijartin. Ji ber ku rewşa Silhedîn di nava gel de nerehetî dabû çêkirin.

Yek-du civînên gel û rewşenbîran roj û cihê konferansê diyar bû. Kesên-delegên beşdarbin hatin hilbijartin. Êvarê em dawetî mala rewşenbîrekî kirin, di malê de nêzî 30 kes hebûn. Qaşo evanan berpisyarên gel, rûspî û rewşenbîr bûn. Lê hemû jî erkdarên dewletê; dozger, polês, genaral û wekî din. Li ser masê xwarin pir zêde, curê xwarin zehf bûn, her reng araq hebû. Heval Gernas Koçer rûsî baş dizanî lê xwe li nezanînê danîbû. Qaşo rewşenbîrên me dizanin ku em rusî nizanin, di nav hev de diaxivin *“em zikên wan têrkin, sibê di konferansê de dîsa Silhedîn hilbijêrin”*. Heval Gernas gotinên wan ji me re got, me reng neda. Di nav wan de serokê gumrukê Bahrî, li heval Gernas pirsî *“tu me çawa dibînî?”* heval Gernas despêkê çend gotinên nazik got, pêda *“li cem me Eşîra Torî heye, yekî torî du segê wî hene û dibe bazarê bifroşe. Seg-kuçik yek biçûk e yek jî girs e, kesek tê, da ku kûçikê bikire dipirse; perê van, bûhayên van çend in? Ê Torî; yê girs hezarî, yê biçûk hezar û pênc sed. Yê hez dike bikire bihêrs, ma çima ev ê biçûk hezar û pênc sed, ê girs çima hezar î, Torî: bira yê gir seg e yê biçûk segê kurê seg e.*

Li ser masê hewayekî sar çêbû, Bahrî ji heval Gernas re got *"tu rusî dizanî?"* Gernas got *"na nizanim"*.

Li Salona konferansê yek paçeke me ya ala kurdî, remzek, gotinek, rengek ê kurdî tunebû. Dîwan pêşta hatibû amadekirin, kê wê biaxive ew jî hatine rêzkirin. Ji ber rengê, şêwazê rêvebirina konferansê me îtirazkir, gotin destûra vî welatê dest dide vê şêwazê. Yani her tişt ji jor de tê plankirin gel tenê destê xwe radike. Pêşkeşvan mêvan da nasîn di nav mêvanan de navê konsola Tirk jî xwend. Mafê axivtinê despêkê dane Silhedîn, paşê yekî din û mafê axaftinê dane hevalê me pênc xulek û çar caran dengê heval qut kirin. Rojev ber bi xilasbunê, êdî tahamul nema em rabûn ser xwe, pêşkeşvan ji me re got *"rûnên"*. Hevalekî bidengekî gur got, *"ka bêdeng be, hûn di nava xiyanetê de ne, tirk gelê we dikujin, konsola tirkan konferansa we birêve dibe, em vê konferansê nasnakin Silhedîn ne meşrû ye, ew ê derneke nava gel"* û em ji salonê derketin. Bi hevalan re hin welatparêz û rewşenbîr jî derketin. Paşê Silhedîn gelek kes xiste navber û derket pêş gel efûya xwe xwest.

Ger û xebat giştî Asya Navîn berdawam dikir. Li Ozbekistanê belavbûna Sovyetê dewleta Ozbek zextekî nijadperest li ser Kurdan dabû meşandin, li ser vê kurd bi giranî li Ozbekistanê derketîbûn û Rusya, Qazakîstan, Kirgizistanê belavbûbûn, tenê 30-40 mal li paytextê mabûn. Em qaçaxî çûn, demekê man yek du civîn çêkir, derketin.

Li Kazakistan gundekî nêzî sînorê Çînê, navê gund Agbastal bû. Bi rastî jî kurdên pir hêjan e, hele dayikek hebû navê wê Bîber, rastî navê wê Bîber bû, lê mafê wê nexwin ne bîber bû zimanek ser bû wek îsota Ruhayê bû. Di civînê de kesek şaş biaxiviya way halê wê/î. Ji heqê kesên durû derdiket, keça wê jî li cem me dixebitî, ew jî jineke welatparêz bû, di nava xebatê ciwanan de bû, tirsa Bîberê me wê diparast. Lê li wî gundî keçeke din bi navê Dilvîn hezdikir tevlê şoreşê be, were welat, keçik li Zanîngehê beşa tendûrustiyê dixwend. Me jî tevlî kir û me mala xwe şewitand.

Em çûn mala wê me jêre got, keça te çûye Moskovayê; dayika wê tekerên ereba me kunkir da ku em nerevin, bi kêrê ket ser min ez bi zorê

ji dest filitîm. Hate Mala Kurdan, dîsa kêr avête min, birayê wê generalê qazax bû, me bi wî wek mafya dabû nasîn û polêsan mala me dorpêç kir. Genaral hat berderî, me derî vekir got

– *Ez genaral ……..* û qirika min girt, min jî bi nermî destê wî girt;

– *Em jî PKK`yî ne.* Genaral destê xwe ji qirika min kişand li xwişka xwe zîvirî,

– *Ka te got ev mafya ne?* Dayika havala Dilvîn serê xwe daxist ber xwe.

Genaral;

– *Heval bibexşînin, ez jî kurd im, lê agahiyeke şaş dane min, em hinekî biaxiviyan dê baş bûya.*

– *Fermo were hundir, jorê.*

– *Na ger em bên Mala Kurdan ê baştir be* û xatir xwest çû.

Dayik nesekinî, kurê wê û hin xizmên wê di rê de kulm li çevên min dan, berçavka min şikandin. Dayik hate Moskovayê da ku Dilvîn bi paş ve bizîvirîne, lê Dilvîn nezîvirî, berê xwe da welat.

## 1997 Gulan- Moskova

Hevalên Kazakistanê bang li me kirin da ku heya meha Gulanê em xwe bigîhînin Moskovayê. Me kar û barên xwe xilaskir, 15'ê gulanê em gihaştin Moskovayê. Ji wir jî derbasî bajarê Yarislavya Gundê ku hevalan kirîbûn bû. Gund, gotin di cih de be, wek wateyê Gundan de ne gund bû, ev der di dema Sovyetê de wargehekî zarokan a seyrangehê bûye. Wargeh, bi gundê Lenîn ê rojnameya *Îskira* biveşartî derxistiye re cînar bû. Beşeke ava Çemê Volga di ber wargehê de derbas dibû, daristan, şînahî, hênik û aram bû.

Avahiya wargehê giranî bi daraba hatibûn çêkirin, salona sînema-şano, aşxane, pansiyonên ku nêzî 100 kesî bihewîne, cihê werzîşê û parka gerê hebû. Di salona şanoyê de konferansa me destpê dikir. Rêbertî, Mahîr Welat ji peywir dûrxistiye û peywir daye 12 hevalan, dema konferans destpê kir Mahîr li Moskovayê bû û pêwîstbû biçûya dibistana Rêbertî lê hê neçûbû. Vê rewşê di hevalan de nîgeranî çekirîbû. Ji ber ku Mahîr ji derva de destên xwe dikir li nava konferansê û heznedikir ku konferans bi ser bikeve. Dixwest konferansê mehkûm bike da ku ew cardin bê ser kar. Rastî jî hin kes xulamên wî bûn û car caran rojeva Konferansê berovajî dikirin.

Konferans di roja duduyan de bû, Rêbertî telefon vekir. Komîteya amedekar li cem telefonê bi Rêbertî re diaxive û hevalê Saît Botan (xizmê hevalê Hayrî Dûrmûş e) ji Rêbertî re dibêje;

*– Metirsiyên min hene ku Mahîr mudaxaleyê Konferansê bike, dixwaze konferansê vala derxîne.*

Rêbertî pir bihêrs:

– *Hûn hemû min guhdar dikin, kadro girêdayî Rêbertî ye yan na?*

Hemû hevalan got “*belê em girêdayî Rêbertî ne”.*

– *Wê demê ger Mahîr neyê vir, çi pêwîst e bikin*.

Her wiha Rêbertî perespektîfên konferansê da, hevalan li teybê tomar kirin, anîn konferansê û bi hemû berendaman dane guhdarkirin.

Di konferansê de rewşa herî balkêş a Bavê Nazê û Ezîzê Cewo bû. Bavê Nazê zimanzanê kurdî ye, lê keça wî zimanê Kurdî nizane. Ezîzê Cewo, dema Sovyet belav dibe, komek rewşenbîr diçin Kurdistana Sor îlan dikin û Ezizê cewo jî dibe wezîrê aborî, paşê wezîriya wî mehekî didome û hikûmeta wan belav dibe. Keçek û kurekî Ezîzê Cewo tevlê şoreşê bûbûn. Dema Serokatî dîl ket herdu zarokên xwe bi rêya YNK`ê ji refên şoreşê da revandin. Niha jî qaşo li Moskovayê kurdayetiyê dike. Ev herdu camêr jî alîgirê Mahîr Welat bûn. Di her navberan de hewldidan hevalên nepolîtîk bandor bikin da ku ew Mahîr biparêzin. Lê di dawiya hefteyekê de konferans nîqaşên xwe qedand, biryarên xwe girt, bername, plansaziyên xwe derxist.

Di konferansê de gelek tişt hatin gotin, belge û dokumanên wê di arşîva rêxistinê de hene. Ger wê demê gotinên konferansê baş bihatana guhdarkirin, şopandin, dibe ku yek ji lingên komployê li ser Rêbertî ya qada Rûsyayê hîna ji wê demê ve bihata vala derxistin.

Di konferansê de komîteyeke lêpirsînê hate amedekirin, lêpirsîn dê li ser pratîka Mahîr Welat çêbûya. Komîte ava bû û destbi karên xwe kirin. Di encama lêpirsînê de çi eşkere bû? Îstixbarata Rûs bi riya jinekê Mahîr xistî bû, jinek xistine hembêza wî û video kişandine û ev video wek şantajekî di maseya wan de amade bû. Kurd Îdrîs (mafya tirkan), Melîk Firat hatine Moskovayê û bi Mahîr re bûne dost. Paltoyeke 3000 dolar û xelatên din jêre anîne. Jina ku ketiye hembêza Mahîr jî, dayika wê Rûs, Bavê wê Kurd e. Ji Dihokê ye û endamê MÎT`ê ye. Her wiha xefk di nav xefkê de. Mahîr digewizî. Mahîr dema dihat, an jî diçû cihekî her tim di bin siya îstixbarata Rûsan de bû. Her wiha li derdorên wî gelek Bekoyê

Ewan hebûn. Her tim pesnê wî didan. Gotinên wî yên pir ji rêzê pirole dikirin, ew wek pir zane dixwestin nîşan bidin. Lê ev rewş fêlbaziyeke politîk bû. Ne bi tenê Mahîr, em kadro jî di vê rewşê de fetisîbûn. Tişta dihat jiyîn bi wateya polîtîk; korayî bû.

**Gotinên dostekî: Kamûran Simo**

Konferansa me xelas bû û cihê peywira min guherî bû. Li ser daxwaza hevalan ez ê biçûyama Gurcistanê. Em ji Yarislav hatin Moskovayê. Kamûran Simo ez vexwendim mala xwe. Kamûran Simo eslê xwe ji Mêrdînê ye û di salên 80`yan de tevlê refên gerîla dibe. Di sala 92`an de ji Zelê ji ber hin pirsgirêkan direve û diçe Rûsyayê. Paşê bi rexistinê re pêwendî çêdike û Rêbertî jî wî efû dike. Kamûran Simo li Moskovayê karê bazarê dike, tiştan dikire û difroşe. Du zarokên xwe ji Bakur aniye li cem xwe (yek kur yek jî qîz). Her du zarok jî li Moskovayê zanko dixwînin. Keça Kamûran, Fatim welatparêz e û di nav xwendevanan de xebatên YXWK dide meşandin. Fatim xebatê polîtîk û yên çandê jî li Mala Kurdan dide meşandin. Her wiha xebatên xwendevanên me pêkve dida meşandin. Ji ber vê hevaltiyeke me ya pir birêz hebû û tişta min hîskir ev hevaltî ber bi evînê ve diçe. Di rê de Kamûran wesayît da sekinandin da ku ji dikanê tiştan bikire. Di wesayîtê de ez û hevala Fatim tenê man. Min jê re behsa wateya şoreşgerî, evîna şoreşê kir da ku fêm bike, jiyana şoreşgeran ji eşq û evînê re dest nade.

Dost Kamûran hat wesayîtê em çûne malê. Xwarin hatin xwarin û em li hemberî televîzyonê rûniştin.

Kamûran Simo:

*– Heval, dizanî ji te re tiştekî bibêjim, mirovê asayî-welatî, wek kewa gewr in. Çi biçe ser mûyên wan diyar nake, lê mirovên şoreşger wek kewa spî ye tozek, noqteyek lê bikeve diyar e. Di şoreşgeriyê de nehelê leke li te bikeve, leke gava li te bikeve tu çi bikî jî vala ye.*

Min dersa xwe girt, sibehê xatir ji Kamûran û ji hevala Fatim xwast û ber bi Gurcistanê ve ketim rê.

## Gorgiya Ango Gurcistan

Pasaportek, ne ya min e û serpêhatiya xwediyê wî jî nizanim. Min nav û paşnav û dîroka xwediyê pasaportê ya dizanibû jî ji bîr kiriye. Bi tenê wêneyê min li ser e. Ma welatê min jî ne qedexe bû! Li ser cîhanê wek gel em fermî bi peymana Lozanê tune hatibûn hesibandin; ez karê qedexe nekim nabe! Kurdayetî ji aliyekî ve jî dihate wateya qedexetî, wendabûn, veşartîbûnê. Ez jî wek şoreşgerekî kurd divê veşartî-binerd bûma. Balafirgeha Moskovayê bilet di dest min de û ber bi deriyê kontrolê ve dimeşim. Xanimeke zerik, bi rûkeniyeke veşartî, *silav û rêz, ji ku de diçin* çend pirs kir. Çavên wê li ser pasaportê, tiliyên neynûk dirêj (biboyax) li ser wêneyê min digere… Mor lê da, dîsa bi keneke formalîte "*oxir be" û* ez derbas bûm. Lê min dizanî ew min temaşe dike. Weke ku ew qet ne li wir e ez meşiyam. Lê belê, ger wê di meşa min de tirs, dudilî bidîta dê teqez ez bidama sekinandin. Heya ku deriyên balafirê hate girtin ez di hûndirê metirsiyê de bûm. Piştî balafir bi hewa ket serê min rihet bû.

Balafirgeha Gorgiya, wer dixuya feqîr bû. Weke yên Moskovayê paqij an jî mezin, luks nîn bû. Cihê qontrolê zêde nedan sekinandin. Dostê me Miraz û hevalê Kendal dervayê balafirgehê li benda min bûn. Em çûn li cem wesayîtê, min jî wesayîteke normal hevî dikir, lê wesayîteke ecêp û luks bû. Jîpek bû, kaporta ji dema şerê cihanê yê duyem de mayî, motora ya Toyotayê (Miraz diziye), teker ê modeleke din, welhasil her parçeyeke jîpê cuda bû, lê hevalan xweş li hev anîbû.

Komek heval ji Dibistana Rêbertî û ji Serhedê hatibûn vê derê ku ji vir re derbasî Artvînê bibin. Li malekê diman. Hevalê Kendal behsa hin pirsgirêkan kir, lê rewş ne asayî bû. Berpirsyarê komê Mahîrê Tirk; ji bo

hevalan ji sînor derbas bike wan heta li ser xetê dibe, bi komployê du hevalan dide girtin. Çekên hevalan li ser sînor vedişêre-binerd dike û hevalan tîne daîrekê. Heval di daîreyê de benda gihîştina cihên xwe ne lê Mahîr jî ketiye li pey bêehlaqiyê. Tiştên dihatin gotin ne ji rêzê bûn. Min bi xwe çend rojan ew şopand. Birastî jî rewşeke kambax serwer bû. Ez bi Mahîr Tirk re axivîm; *hûn çima naçin Artvînê, hûn ê kengê biçin?*" Bersiv, gilover, rûxarkî û derewîn. Em çûne ligel komê me bi wan re civînek çêkir. Hemû hevalan dixwest demek zûtir ji wir derkevin û biçin cihên xwe. Li ser vê min bi hevalê Karasû re li ser rêya telefonê pêwendî danî û jêre rewşa heyî şîrove kir. Ji min re got; *"ez ê sibê bersiva te bidim"* û telefon girt. Roja din got: *"talimat e, hûn ê wan hevalan derbasî Serhedê bikin"*. Li ser vê min bangî Mahîr kir jêre got:

*– Talîmata rexistinê heye, hûn ê bizivirin biçin Serhedê. Wesayît amade ye, hûn ê îşev derbasî Ermenistanê bibin.*

Mahîr Tirk: (bi qehir)

*– Tu kî yî tevlî karên me dibî, min soz daye Serok ezê derbasî Artvînê bibim. Em naçin ti cihekî.*

*– Belê, dibe ku tu neçî lê heval ê îşev biçin. Tu dikarî li vir bî lê ger tu wê jî karibî!*

*– Çawa, tu yê me bi zorê ji vir derbixînî? Ev rayeya te nîn e.*

*– Tu karê me bi te nîn e. Hevalên din hemû amade ne, çentên xwe jî amade kirine. Lê tu dikarî bi cihekî de neçî. Kom diçe, tu jî fermandarê bêleşker î.*

Li ser vê Mahîr ji neçarî, êvarê li wesayîtê siwar bû, bihêrs ew jî ket rê.

Bêyî ku neyîniyek biqewime hevalan xwe gihandin Ermenistanê. Ez û Ordî Qaşaxî li Mala Kurdan çay vedixwin telefonê lê da, yê ku telefon kiribû berpirsê îstîxbarata Gurciyan bû. Apê Ordî pêre axivî. Îstîxbaratê dixwest hevalê "nû" binase. Ez û Apê Ordî çûne saziya Îstîxbarata Gurciyan. Xaniyekî dîwarê wî gewr bû. Li devê derî navên me nivîsîn, agahî dan jorê, bersiv hat û derî vekirin. Em ber bi jor derketin, weke tê bîra min avahiyeke şeş qat bû. Li qata sisêyan berpirsê Îstîxbaratê

pêşwaziya me kir. Di odeya wî de wêneyê heval Kemal PÎR daliqandî bû. Piştî rewşa me pirsî navê xwe got (Şalvajîxendî) me jî xwe pê da nasîn.

Şalvajîxendî, biken:

– *Navê te yê kod e ne wisa?*

– *Nasnameya min a polîtîk e, ê din nîn e.*

Çavên wî li ser min demekê bêdeng bû û kete mijarê.

– *Em û gelê kurd dostê qedîm in, çarsed sal berê di şerê me yê li hember Osmaniyan de fermandarê me yê yekem û cîgirê Keybanû Tamara, Îbrahîmê Mildirêj Kurd e. Heval Kemal Pîr jî laz e, yanî gurcî ye.*

Gotinên 'xweş' li pey hev rêz kir. Nîqaş heta noqteyekê û me bi hev nekir. Weke hemû karmendên dewletan gef li me xwar.

– *Em nahêlin hûn li vir xebatên xwe bimeşînin. Emê Mala Kurdan jî bigirin.*

Bi vî rengî dirêj kir. Ez biken:

– *Baş e, îcaze hebe em ê biçin.*

Bi awireke tûj ve:

– *Çawa, tu bersiva min nadî?*

– *Na, te gotinên xwe got. Dikarî me di vî welatî de qedexe jî bikî. Lê em li dinyayê û Tirkiyê çawa dixebitin emê li vir jî bi wî rengî bixebitin.*

Şalvajîxendî demekê bêdeng ma, hevkarê xwe temaşekir û paşê:

– *Li Tirkiyê û li cihên din gelê te heye, pişta te heye, li vir ew derfet nîn e.*

– *Ew tişt nêrîna te ye. Li vir jî piştgiriya me heye û ne bi tenê gelê Kurd ji gelên din jî heye.*

Şalvajîxendî rabû ser xwe, ber bi pencerê ve çû, demekê li derva temaşe kir û paşê bidengekî keser:

– *Tirk li ser me pir zextê dikin. Hûn jî hinekî hişyar bin, di hatin û çûyînê de xwe pir eşkere nekin. Em jî dixwazin gelê we azad be lê*

*welatê me feqîr e. Debareke me ya mezin li ser deriyê Tirkan e, me jî fêm bikin.*

Welhasil dema me ji hev xatir xwest, di kêliya merhabatiyê de destê min di yê wî de û ji min re got;

*– Pasaporta te bêvîze ye, te daye da ku vîze bigrî, ezê binêrim ger derfet hebe ez ê dirêj bikim!*

Ev jî zextek bû ango dixwestin bibêjin; ger em bixwazin vîze nadin te û emê te ji welatê xwe derxin. Dema me xwe gihande kolanê Apê Ordî bi kêfxweşî:

*– Hevdîtinek baş bû.* (Min zêde wateyek neda vê gotina wî, lê wî domand) *wan dixwest tu radestî wan bibî, lê nebû. Apocîtî jî ev e.*

*– Ma tu Apociyan ji kûr ve nas dikî?*

*– Hey xwedayê min, kuro ez du-sê caran bi Serok Apo re bi telefonê axivîme û min pirtûka wî ya Pirsgirêka Kesayetî jî xwendiye, ma tenê hûn xwe Apocî dihesibînin".*

Min ew hembêz kir,

*– Na xalo, min henekên li xwe te kir.*

Dem darbasbû me hin bûyer jiya, me lêkolîn kir, xwend û me dît ku di karê dîplomasiyê de ger ti bixwazî yê/a li pêşberî xwe bandor bikî û pêşhukmê wî/ê bişkînî divê tu behsa bûyereke hevpar bikî ku yê/a li hember xwe hinekî nerm bikî. Û bi vî rengî karibî hindik be jî gumanên wî/ê bişkînî. Qazaxan di hevdîtinê de behsa dostahiya Ehmedê Xanê û şaîrê wan Canbûl kiribû. Gurciyan fermandarê xwe yê 400 sal berî niha Kurd nîşandan. Û li heval Kemal PÎR jî xwedî derketin. Rûsan bajarê Moskovayê, mîmarê ku bi plansazî daye çêkirin Kurd nîşan dan. Dibe ku ev hemû rast bin jî, lê dewlet di polîtîkayê de wek amûreke xapandinê bi kar dianîn. A rast di destpêkê de kêfa min jî pê dihat, min wek serbilindiyekê ji xwe re dihesiband. Lê heyf û mixabin vê nezaniyê di wê dika sar, bêgiyan, bêehlaq ê dîplomasiyê de gelek tişt bi me da wendakirinê.

**Çûyîna Ermenistanê**

Hevalan ji Ermenistanê telefon vekirin, li gorî ku digotin Mahîrê Tirk fêlbaziyan dike û derbasî Serhedê nabe. Lê hevalê Karasu jî li bendê ye ku ew derbas bin. Min pasaporta xwe dabû vîzeyê ku dema wê dirêj bikim. Dayîka Zînê dihat û diçû. Li Ermenistanê li bazarê kel û pel difrot. Min jêre got:

- *Gelo tu bi rêya qaçax dikarî min derbasî Ermenistanê bikî.*
- *Belê, pir hêsan e. Tu xwe amade bike û em biçin.*

Şev bi dizî me çend mal guherand û sibehê em ketin rê. Dema em hatin li sînorê Ermenistan û Gurcistanê, dayîka Zînê çend pakêt malbora da erkdarê li ber derî, got "*ev kurê min e, me nasnameyên xwe li malê ji bîr kiriye"* û bi vî awayî em ji sînor derbas bûn. Ez gihîştim cihê xwe, me bi rêveberiya wê derê re civînek çêkir û plansaziyek pêk anî. Êvarê li ser bingehê plansaziyê du wesayît hatin li ber deriyê mala heval lê diman. Hemû heval lê siwar bûn lê belê Mahîr dîsa *"tu kî yî, tu bûyî belaya serê min? Em naçin, hîna karên me hene"* Bi tevî rêveberên me yên li Ermenistanê me Mahîr bire odeyekê û me jêre got; "*te bernameya rêxistinê ya Behra Reş vala derxist. Ger şerefa fermandartiyê di te de hebe tu yî fîşekekê berî serê xwe bidî. Wekî din jî ger tu niha neçî emê hevalan bişînin û vê rewşa te jî ji rêxistinê re bibêjin. Ha wê demê rêxistin di derbarê te de çi bibêje jî emê bixin meriyete. Heya rêxistin di derbarê te de agahiyekê ji me re bişîne ketin û derketina te ya derve jî qedexe ye.* Mahîr bi neçarî got *"temam ezê biçim, lê ezê li ser we ji Rêbertî re rapor jî binivîsim".* Hevalê li cem min *"tu serbest î, dikarî binivisî".* Heval li wesayîtê siwar bibûn û li benda me bûn. Mahîrê Tirk jî kelûpelên xwe girt û li wesayîtê siwar bû. Piştî zivistana 97-98'an

Mahîr li eyaleta Erziromê piştî şahadeta deh-danzdeh hevalan radestî dijmin bû, xiyanet kir. Bû îtîrafkar.

Karên min qediyabûn, ez û dayîka Zînê hatin li ser sînorê Ermenistanê, em ji wir re rihet derbas bûn. Lê yên Gurciyan destûr nedan. Diyar bû wan îstîxbarat girtibû ku ez derbasî Ermenistanê bûm. Dayika Zînê bineçarî:

– *Heval em ê çi bikin?* Min li der û dor temaşe kir, li jêra gumrukê av di nav her du sînoran de derbas dibû.

– *Dayê tu der û dor temaşe bike, ezê xwe li avê bixim. Tu biçe li wesayîtê siwar bibe, bawer im ez ê xwe bigihînim te.* Min cilên xwe ji xwe xist, da paşila xwe. Dayîka Zînê bimatmayî *“heval meke, xeter e”* lê min xwe li avê xist û derbasî aliyê Gurciyan bûm. Min cilên xwe li xwe kir, meşiyam ketim kolenekî. Gelên wir Terekeme (Qarapapax) bûn. Kalek ber bi min ve dihat min jêre bi Azerî got “*emî Tibilîse maşîn hardan gedîr” (ango, mamo ez çawa dikarim biçim Tibilîsê)?* Mamo rê nîşanî min da, ez çûm li wesayîta Tibilîsê siwar bûm. Hema hindik mabû ku wesayît bi rê bikeve dayîka Zînê jî hat lê siwar bû. Dema wê ez dîtim bimatmayî

– B*i xwedê hûn Apocîst dîn in. Tu çawa hatî? Di deriyê gumrikê de wan ez mijûl kirim. Digotin zilamê ligel te bi ku de çû. Pirsa te dikirin, ez tirsiyam min got dibe ku te bigirin.*

– Ew çax beriya em bigihêjin Tiblîsê em dakevin baş e. Dibe ku li wê derê pêşiya me bigirin.

Bi pesendkirina dayîka Zînê ve em li gorî plan-nameya xwe ya nû tevgeriyan.

## Pesin û Pesindayîn

Di mijdara sala 1997'an de, me amedekariya pîrozkirina sersala PKK'ê dikir. Koma Gulê Xerzan jî dê bihata, salon hatibû kirêkirin, şano, axaftvan, mêvan hwd. kurtasî her tişt amede bû. Roj diyar bû, Miraz bi wesayîta xwe ya entîke ve çûbû Ermenistanê ku koma muzîkê ji wir bîne.

Rojek mabû û Miraz Koma Gulê xerzan nîvê şevê hanî gîhande me. Me kom bir mala dostekî, şev li wir man û roj hatin salonê, di salonê de nêzî 700 kes hebûn. Di protokolê de endamê Polît bûro Partî Komunîst, rewşenbîr, karsaz, her weha mêvanên me yên her tim polês û îstîxbarat.

Bi navê ERNK'ê min ê axaftina destpêkê û ya polîtîk bikira. Kelacenek li min wer bibû. Ez difikirim ku çi bibêjim, hîtabateke çawa bikim, di kar de dengê xwe bilind û nizm bikim. Di nava van fikran de diçûm û dihatim. Lê belê min li malê li pêş eynikê prova kiribû, ruxmî vê jî kelacanek hebû. Pêşkêşvan navê min xwend, ez rabûm çûm ser dikê, silav da gel, mêvan, dost cuda cuda silav kir. Nêzî 15 xuleqan axivîm û hatim cihê xwe. Çepik, dirûşme, hatin qîrîn. Bêguman çepik ne ji min re bû, navê Rêbertî, Kurdistan dihatin qîrîn.

Ez li cihê xwe rûniştim, endamê Partî Komînîst destpêkir pesnê min da. Qaşo ez xweş axivî me, ez kesekî pir aqil im, gotinên min ku gotiye heya niha ti kesî nekiriye… Her wiha ew rewşenbîr, dost, îstîxbarat, hemû hatin min pîroz kirin û pesnên min dan. Rastî pir kêfa min jî dihat, "ku ez pir biaqil im". Vê rewşê sê rojan berdewam kir. Telefon li ser telefonê, rojnamevanan gotinên min dane rojnamên xwe, weke "siyasetmedarê kurd" nîşan dane. Sê roj gotinên herî qelew, zirt û gotinên qet min nebihîstiye ji bo min digotin. Lê roja sêyem ez fikirîm;

gotinên min gotibûn, min ji perspektîfên Rêbertî û ji gotinên Îsmaîl Beşîkçî berhev kiribû, şîrove kiribû. Ew çax ev pesin çi ye? Ew tiştên dihatin kirin pir bi zanebûn bûn. Ji lewre pesin, ji bo kadro ji xetê derbikeve, xwe li ser hevalan û li ser rexistinê re bibîne têne gotin. Rêbazekî şerê taybet e. Êdî min bersiva telefona ti kesî neda. Çend roj dereng be jî ez li xwe hisiyam.

Rewşenbîr û karsazekî xelkê Rojava Hesen Şêxo, Koma Gulê Xerzan em dawetî mala xwe kir û gelek rewşenbîrên Kurd jî hatin; Keremê Ankosî, Dr. Valot, Ordî Qaşaxî, Tital, Dr. Sîra, her wiha gelek kesên din. Li ser masa xwarinê hema te çi bigota hebû. Eraq tijî bû; şanpanya, şarap, vîskî, votka… Mihemed Şêxo dizanî em araqê venaxwin lê ji bo rewşenbîran anî bû. Li ser masê her ku qadeh radikirin pesnên me didan, şoreşger, egîd, qehreman. Feqîra hûnermend Rojda ji ber pesnên rewşenbîran mest bû. Li min zîvirî bi tirkî "*heval asteke me ya bi qasî ew dibêjin nîn e*". Rewşenbîran qedeh ji bo Rojda radikirin û wesfa Rojda wek; Zîn, Şirîn, Xecê û hwd. didan. Rojda êdî ji xwe ditirsiya. Birayê wê Çiya li min nihêrî, min jêre got, "*dev jê berde evan tev çanda reel sosyalîzmê ye*". Êvarê derengê şevê her kes çû. Hevalên hûnermend kişyane xewê. Sibehê hûnermend Rojda hê di şoqê de bû, min jêre got "*zû ji ser xwe ve were, rastiya xwe nas bike, ev pesnanan mirov ji rastiya xwe derdixin*". Rojda, bi şermoke "*na heval, tiştên wisa dibe".* Hûnermendên din amedekariyên xwe kirin, vegeriyan NÇM'a Stenbolê.

## Dr. Sîra

Dr.Sîra jinekê Kurd û berpirsyarê jinên Gurcistanê bû. Ev berpirsyariya ji aliya dewletê ve weke fermî jî hatiye nasîn. Dr.Sîra alîgirê serok-komarê wê demê Şawaknazê bû. Destpekê pir nêzî me nîn bû, lê bi encama hin hewldanan, her wiha bi erêkirina dewletê ve jî êdî Dr. Sîra bi me re dixebitî. Xebat dikir, amedekariya konferanseke Kurdên Gurcistanê dihate çêkirin da ku Mala Kurdan bi fermî bê nasîn. Wextê ezê ji Moskovayê biçûma Gurcistanê Serokatî di telefonê de gotibû;*"heya ji dest we were fermiyetê bi dest bixin"*. Li ser vê me xebatek dabû destpêkirin. Hin kesan asteng dikirin, hin kesan piştgirî didan. Yek ji wan kesên ku piştgirî dida jî Dr. Sîra bû. Sîra ji bo fermiyet bigire rêziknameya saziya Kurd amade dikir. Bidil û can dixebitî. Xwe amede dikir da ku bibe serokê Mala Kurdan. Ger ku bibe serokê Mala Kurdan, li ser vê pêkan bû ku di dema pêş de bi dengê kurdan ve bibe parlementer. Her wiha dewlet jî dê bi navbeyniya wê PKK bixista di bin venêrîna xwe. Me jî qet dengê xwe nekir. Sîra, hemû karên fermî xilas kir û êdî konferas amede bû. Lê belê Dr.Sîra û dewletê tiştek ji bîr kirin, hêza gel û delege alîgirên me bûn. Ji bo lîsteyeke rêveberiyê ji bo Mala Kurdan amade kir. Di lîstê de navê Dr.Sîra hebû lê ne wek serokê Mala Kurdan, wek endamê rêvebiriyê. Di lîstê de me navê Dr. Valot wek serokê Mala Kurdan dabû. Wisa jî hate hilbijartin, Sîra jî bû cîgirê wî û çend kesên din jî wek endamên rêveberiyê hatin hilbijartin. Hilbijartin û konferans xilas bû, Dr. Sîra bê gotin, bê xatir çû mala xwe. Roja din di telefonê de *"ez belgeyan nadim, min ev belgenan çêkiriye"*. Em çûne mala wê. Me her çi kir, Dr. Sîra ji ya xwe nehat xwarê. Ji dê û bavê min re dide xebaran. Hevalê ligel min Siyabend dema got "doktor tu nikarî ji

nûnerê partiyê re van tiştan bibêjî”, Dr.Sîra tam dîn bû; *“te jî partiya te jî devê min venekin”.* Min ji heval Siyabend re bi tirkî got; *“bira bav bavê min, dayik dayika min, ka tevlê hev meke ku em dokumana bistînîn”*.

Li Mala Kurdan Apê Ordî Qaşaxî û Miraz difikirîn ku em bi rêbazekî belgeyan jê bigirin.

Apê Ordî;

*– Heval ger tu destûr bidî ezê ji serokê îstîxbaratê re telefon vekim û vê mijarê ji wî re bibêjim. Ew dikare ji Dr.Sîra dokumanan bigire”.*

*– Ma tiştekî wisa dibe, çi peywendiyên wan bi hev re heye?*

Apê Ordî biken;

*– Ew hemû ji yek malî ne.*

*– Baş e, dibe lê li vir telefon veneke, biçe li derve veke.*

Apê Ordî çû telefon vekir û hat got, berpirsê îstîxbaratê ji wî re gotiye ti têkiliya me pê nîn e. Lê belê piştî nîv saetê Dr.Sîra ji me re telefon vekir û got *“werin dadgehê dokumanan bigirin”.* Her tişt dihat fêmkirin. Ez û Miraz çûne pêş dadgehê. Sîra li benda me bû. Min 500 dolar perê dokumanan da ku biçe îmze bide û dokumanan bîne. Çû dokuman anî da destê Miraz û li min zîvirî *“min gelek kes dîtin, kesî bi min nikarî lê tu kurê çi pîj derketî”* û pişta xwe da me çû. Me fermiyet bi dest xist, wê êvarê me bi kêfxweşî agahî da hevalan.

## Telefona Hevala Xanê

Tibilîs, êvara dereng hevala Xanê ji Moskovayê telefon vekir û got *“heval bi navê nûnerê ERNK`ê daxuyaniyekî bide û daxuyanî dê li dijî petrola Xazarê ya ku ji Kurdistanê re derbas bibe ye”* û li ser navaroka daxuyaniyê me nîqaş kir. Wê demê hevala Xanê berpirsyarê ERNK`ê ya qada YDS bû.

Roja din min bangî rojnamegerekî kir û roportajek da. Me him li ser pisgirêka Kurd û him jî li ser girîngiya rola jeo-stratejîk a petrola Kafkasan a li ser axa Kurdistanê guftoguh kir. Her wiha min anî ziman ku emê destûr nedin petrol bêyî destura me ji axa Kurdistanê re derbas bibe.

Rojnameger;

– *“ma ev ne terorîzm e? Zimanê neteweyekî ji 40 milyonî pêk tê, qutkirin ne terorîzm e?”* Rojnamê ev gotin di manşetê de dabû. Roportaj dengekî bilind da, him tehdît, hiraşe him jî kêfxweşî diyar dibû.

Qonsola Rûsan bangî min kir, cihekî veşartî, di pastaxaneyekî de berpirsê Rûsan ê leşkêrî, ê Kafkasan amade bû. Him em şiyar kirin û him jî gotin em hez dikin alîkarî bidin we! Lê belê diviya bû li hember vê me jî di Gurcistanê de ji aliyê îstîxbarî ve, di derbarê tirkan de agahî bida wan. Li ser vê;

– *“Em ne qadroyên we yên îstîxbarêtê ne. Em dostayî dikin lê hûn me weke amûrekî negirin dest baş e.”*

Genaral bi dengekî dostayî û zimanekî şirîn;

– *Na na, lêborîna xwe dixwazim. Em ti carî bi wî çavî ve li we mêze nakin. Em we wek nûnerê gelê Kurd digirin dest”.*

Me xatir jê xwast em hatin Mala Kurdan.

Li Mala Kurdan çar kesên xerîb rûniştine, wek kurdên welatparêz xwe dane nasîn. Ji Tirkiyê nû hatine, di bazarê de dikan vekirine û hezkirine werin serdana me. Piştî merhaba, xêrhatinê ez û hevalê Kendal, Siyabend derbasî oda rêvebiriyê bûn. Hevalê Kendal ji bêrîka xwe zarfek derxist *“ev ji Ermenistanê hevala pele şandine”* got û zarf da min. Di nav zarfê de hin eşqal, nasname diyardikirin da ku ew kes ajanê MÎT`ê ne, divê em hişyar bin. Min name ji herdu hevalan re xwend, hevalê Siyaben derî vekir û mêvanan temaşekir û li me zîvirî *“ev kesên rûniştine heman kes in”*. Rasthatiniyeke sosret bû. Birastî jî ew bûn. Me di Mala Kurdan de nikarî tiştek bikira. Em ligel wan rûniştin da ku hinekî din wan nasbikin. Birastî jî ew kes bûn, piştî demekê xatir xwastin û çûn.

Min ji îstîxbara Gurciyan re telefon vekir, hevdîtinek xwest. Di cî de rendevû dan û ez û apê Ordî çûn. Me agahî û navnîşana wan kesan da û em hatin. Piştre em pê hesiyan îstîxbarata Gurciyan MÎT agahdar kiriye. Di heman şevê de ew kes kişandine Tirkiyê. Me êdî fêm kir ku vîna van di destê tirkan de ye, bêyî tirkan nikarin tu gavî biavêjin.

**Dîlketin û Firoştin**

Ew du roj bû der û dora Mala Kurdan di bin qontrolê de bû. Li serê kolanan û di kuçeyan de polêsên sîvîl digeriyan. Ketin û derketina Mala Kurdan dişopandin. Jineke kurd hebû, weke rewşenbîrekê dihate nasîn. Ev du roj bûn ji sibê heya êvarê ji Mala Kurdan dernediket û qaşo çavdêriya min dikirin. Ez ketime li nava gumanan. Jineke din a binavê Marîna me dizanibû ji bo îstîxbara Gurciyan dixebitî. Hema em bi ku ve biçûyana ew jî dikir bi me re bihatana. Ji bo bi me re were carinan lawa dikir, bi zimanê şirîn nêz dibû. Êdî min fêm kir ku der û dora min hatiye dorpêç kirin. Min ê çi bikira? Rojnameger Malxaz hat ligel me. Ciwanekî hêja, welatparêz bû. Min got; *"ka em bi hev re heya bazarê biçin, ji xwe re hinekî bigerin, bila bêhna me derkeve"*. Bi kêfxweşî pêşwazî kir û got, "*kerem bike, em biçin"*. Herdu jinên ajan jî rabûn piyan ku bi me re werin. Min bi zimanekî hişk herdu jî red kir ku bila neyên. Bi neçarî li cihê xwe rûniştin.

Em ji Mala Kurdan hîna nû derketibûn. Dema me xwe gihande li pişt parlementoya Gurciyan çar kesên di destê wande bêsîm, çekên wan di ber wan de û bi ser me de hatin:

– D*ivê tu ligel me werî, emê biçin navenda polêsan.*

– *N*a, ez nayêm, hûn kê ne?

Lê wan bi zorê ez û Malxaz li wesayîtê siwar kirin. Em hatin navenda îstêxbarata Gurciyan, min avahiya wan nas dikir. Em derxistine qata çaran. Kesên ku ez wan nasnakim li der û dora min tên û diçin. Malxaz birin cihekî cuda ez jî xistime odeyeke cuda. Piştî qederekê serokê ewlekariya Gurciyan hat û bi zimanekî tund gef li min xwar. Gotinên weke ku ez di welatê wî de çi digerim, çima qaçax im û hwd. Min navê

serokê îstîxbaratê Şalvajîxendî da lê ew bêhtir zivêr bû û got *“yekî wiha li vir tune, em te nasnakin”*! Min mesele edî fêmkir ku ji bo min li Gurcistanê mayîn bidawî bûye. Lê ji vir û pêda dê çi bibe?

Serokê ewlekariyê (sê kes li cem bû) dîsa hat, di dest de belgeyeke ku bigurcî nivisî hebû. Ji min re got *“vê belgeyê îmze bike, emê te berdin”*. “*Ez zimanê gurcî nizanim, hevalê min bînin bila ew ji min re bixwîne da ku fêm bikim û îmze bikim. An na ez ti belgeyê îmze nakim.* Li ser vê zimanê şîrin-tûj tevlêhev, hiraşe kir lê belê min vajo (îmze) nekir.

Devê derî nîv vekirî hiştîbûn. Malxaz ji odaya din dihate dîtin û belgeyek pê didane îmzekirin. Malxaz biçavekî melûl li min nihêrî. Renge wî zer bibû, xuya bû ditirsiya, piştre ji odê derket çû.

Ewên li cem min jî çûn êvarê xwarin anîn dane min. Ê ku xwarin anî xwe weke dostê gelê Kurd dida nasîn. Lê êdî ne dema dîplomasiyê bû. Nêzî sibehê di demjimêra 03`an de sê kes hatin û ez hişyar kirim. Ketin milê min ez birim li wesayîtekê siwar kirim. Wesayît ber bi balafirgehê diçû. Ez difikirîm ku dê min bidin Rûsan, an jî Tirkan. Lê belê li gorî min dayîna tirkan nedibû! Ji ber ku têkiliyên me yên fermî hebûn, ji bo rêxistina Gurciyan ez difikirîm ku dê nekarîbûna vê rîskê rabikin.

Li pêş balafirê wesayît sekinî. Erkdarek daket çû jorê, demeke kurt şûn de hat em jî daketin. Berê me dane deriyê vîpê, ango deriyê dîplomatan. Min li wî kesê ku şev nan dabû min pirs kir, *“gelo ev min nedin tirkan?” “Na na, metirse tiştekî wisa nabe”*. Em ji deriyê vîpê derketin apronê, ber bi balafirekê ve çûn, wesayît sekinî û nivîsa Türk Hava Yolları hate xwendin. Min li wî kesê ku digot, em te nadin tirkan nihêrî, min dît ku giriya *“bibexşîne min nizanî dê wiha be, ev xiyanet e”*. Berpirsê wan çû li cem balafirê, di wê navberê de min ji bêrîka xwe hin nîşe derxist xist bêrîka wî kesî û jêre bidizî got, *“van bişewitîne”*. Weke ku bibêje temam serê xwe hejand.

Ez û du polêsên Gurcî li balafirê siwarbûn. Yek li min ê çepê û yek jî li milê min ê rastê rûniştin. Destê min girêdan û ji bo ku rêwiyên din jî nebinin paltoyek avîtin li ser. Balafir yekser rabû, diyar bû ku demeke li benda min in. Ango rêwiyê dawiyê ez bûm!

Dema balafir, ber bi balafirgeha Stenbolê dadiket ez rabûm piyan û min navê xwe yê rast qîrkir û got ev min direvînin. Her du polesên Gurcî xwe avêtin li ser min, bi destê xwe devê min girtin. Dema ku ez rabûm û min qîr kir him li pişt min û him jî li pêş min jinek û zilamek di cî de rabûn piyan. Min fêmkir ku tîmeke tirkan jî di balafirê de amade ye. Polêsê Gurcî di gohê min de *"tu biqîre ezê weke ku devê te digirim bikim lê ezê tam negirim"*. Balafir dema tam daket min dîsa qîr kir, nasnameya xwe got, hemû rêwî pê hesiyan. Piştî ku hemû rêwî daketin çavên min girêdan. Anîn li wesayîteke siwarkirin. Wesayît weke ya miriyan bû, sergirtî û dişibiya tabûtê. Yekî çavên min vekir, zilamekî simbêl zer, qelew bi dengekî ji xwe bawer; *"rovî çi qas bigere jî dê di dawî de dîsa vegere dikana çermxanê",* û bi navê min ê rast ve xitabî min kir *"daxuyaniyên te yên di rojnameyan de ji bo me giran bûn!"*. Cardin çavên min girêdan. Bi qasî ku min hîs dikir wesayît li kêleka behrê re diçû. Piştî demekê wesayît sekinî û ez xistime avahiyekî.

## Êşkence û Lêpirsîn

Avahiyeke nediyar, lembeyên wê her tim pêketî, marşên şovenîzmê, sitranên nijadperest, dengên mirovên di bin zulmê de, nalîn, hawar û lawa kirin.

Zulumkarên min, despêkê nazik, kubar axivîn. Behsa biratiyê kirin û belangaziya min, heyf û mixabinî ji ciwantiya min a "vala diçe" re anîn. Hemû rêbazên şerên taybet yeko yeko diketin meriyete. Bi derûnî re leyîstin, zimanê şirîn li gorî wan êdî pere nedikir. Qaşo hemû tişt ji bo berjewendiyên min dikirin. Herî dawî dev ji van rêbazên xwe berdan.

Bêhna avê, şilahî, der û dor dorpêçkirî bû. Ev der odeyeke nû bû, li gorî wan diviyabû rêbazên xwe yên nû bixin dewrê. Cil û bergên min ji min kirin û li ser maseyeke dirêj serpiştkirî dirêj kirin. Herdu ling, zendên destên min bi kêlekên masê ve girêdan. Her wiha ji bo bi hêsanî nekarim bêhn bigirim werisek jî bi şidyayî ji ser zikê min re bi masê ve girêdan. Jinekê têla ceriyanê bi serê tiliyê lingê min û bi cihê mîzê ve girêda û ji min re got, "*ma tu ne zilam î?"* Min jî êdî xwe ranegirt, "belê, te bi zilamtiyê ve têl girêdaye û dibêjî biaxive". Li ser vê hêrs bû, kifir kir û cereyan da canê min. Min wer dizanî bû ku hinavên min tên der. Demekê ceriyan dayîn bi vî rengî berdewam kir. Wexta ku li gorî wan dema ceriyanê tijî bû, ez rakirim birin li pêş dîwarekî. Ceriyanê laşê min ziwa kiribû, dilê min pir diçû avê. Bi xortemike mezin ve ava sar û şid bi ser min ve girêdan. Dest û çavên min girêdayî bû. Tî bûbûm, diricifîm û dicemidîm. Ji ber ku av pir şid bû ez carinan li dîwêr diketim. Bi zorê be jî min kêmek av xiste devê xwe, lêva xwe şil kir. Vê carê min birin xistin li nava sindoqekê. Sindoq weke tabûtê bû. Li ser piya incax dikarî rawestî, nikarî çongên xwe bişkînî yan jî ber bi çep û rastê ve vegerî. Di

demeke kurt de taqetên çongan xilas dibin û ji ser xwe ve diçî. Min hişyar kirin û cardin xistin li bin ava sar.

Vê rewşê sê rojan berdewam kir. Di roja sisêyan de celadên min hatin ketin bin milên min. Weke miriyekî bi xwe re bikişînin, ez birim li odeyekê û danîn li ser kursiyeke nermik.

Dengekî çors;

*– Waxtê ku tu hatî girtin kî li cem te bû?*

*– Ên ku ez radestî we kirim ew dizanin, biçin ji wan bipirsin.*

*– Ez li te dipirsim.*

*– Hevalê min ê rojnamevan bû.*

*– Hevalê te yê rojnamevan, rojnamevan… … baş e.*

Ew roj êşkence li min nekirin. Min fêmkir ku hevalê Malxaz agahî daye hevalan û raya giştî. Êdî ez kefxweş bûm, hevalan agahî girtine, gel pê hesiyaye. Êdî wan nedikarîn bi dizî min binerd bikin. Rojên din lêdan nebû, lê şerê derûnî dane meşandin. Di roja 20`an de dîsa min birin pêşberî erkdarê xwe û çavên min vekirin. Li pêşberî min zilamekî girs, cilên sportîf li ser, li ser çenga wî şopeke fîşekê. Diyar bû ku li Kurdistanê birîndar bûye. Bi dengekî nizm û giran;

*– Em jî dizanin pirsgirêka Kurdan bi çekê ve çareser nabe. Di dawî de dê li ser masê çareser be. Lê belê dê ev çawa be, fikrên te çi ne?*

*– Ez dîl im û di bin zilmê de me. Ez ê çi nîqaş bikim, biçin bi partiyê re biaxivin.*

Zilam bi ken;

*– Ma em ê çawa biçin ligel partiyê, ewê me qebûl bikin?*

*– Tu jî dizanî ku ev tişt li ser piyan, li kolanan nabin. Rê û rêbazên wê hene. Hûn wek dewlet vê tiştê ji min baştir dizanin.*

*– Wisa ne hêsan e, lê belê vê bizanibe di dawiyê de ev kêşe dê li ser masê çareser be.*

Piştre li ser dîroka Êzidiyan hin pirs li min kir. Dixwest fêm bike ka em di mijara Êzidiyan de çi difikirin. Paşê gazî erkdar kir da ku min bibin hucrê.

Serê salê derbas bibû. 15'ê çileye bû. Dengê lingan dihat. Hatin, berî ku derî vekin ji min re gotin, "berê xwe bide dîwêr". Derî vebû, yek hat hûndir û çavên min girêda. Kete milê min, ez birim cihê xwe şûştinê. Çavên min vekir, derî girt û got, "*xwe bişo, cil û bergên xwe li xwe bike".* Ava germ ji pêça kaniyê dihat, şampuan hebû. Min serê xwe şûşt û cilên xwe li xwe kir. Cardin hatin çavên min girêdan û derxistin derva. Hewa sar bû. Ji zû ve de bû min kesera hewayê dikişand. Wesayîtek anîn û ez lê siwar kirim. Li milê min ê çep û rastê du kes hebûn û her kes bêdeng bû. Dema çavên min vekirin li nêzî boxaza Stenbolê, li qada Tarabya, li ser kolana giştî wesayît sekinîbû. Wesayîteke nêzî 100 mêtro dûrî me li min nîşandan û erkdarekî got; *"biçe li wê wesayîtê siwar be ew ê te bibin cihekî".* Di mêjiyê min de hin şik afirîn. Ez fikirîm ku ew dixwazin ez birevim û li min bixin. Ji ber vê min got, "*ez naçim ti cihekî ger ku hûn ê min bikujin li vir bikujin".* Li ser vê demeke kurt bêdengî bû û zilamê li rex min bi dest bangî wesayîta sekinî bû kir. Wesayît hat ligel me sekinî, ez li wê wesayîtê siwar bûm. Teksiyeke sor, modeleke nû bû. Mûzîk lê dida. Dema em nêzî Aksarayê bûn min ji şofor re got, "*hûn min dibin Vatanê?" (Vatan cihê saziya polêsan bû) Bêyî ku xwe bilivîne û li min binihêre bidengekî erênî ve "belê bira, em ê te bibin emniyetê".* Dilê min êdî rihet bû. Ji ber ku li emniyetê girtin li gorî zagonên wan dihate wateya fermiyetê, dê êdî nekarîbûna min wenda bikin.

Li wir jî çend roj mam. Belgeyek amade kirin; qaşo ez bênasname li der û dora Tarabyayê geriyame û ekîbên polêsan jî bi tesadufî ez girtime! Ango bi rengekî dixwestin ji Gurcistanê revandina min veşêrin.

Ez birim ligel doktor. Qaşo ji qontrola doktor hatim derbas kirin. Li ber dadgehê çend kesên welatparêz, çepên tirkan hebûn. Min navê xwe û navê parêzerê xwe da kesekî welatparêz ku ger ew were berdan bila agahiya min bide.

Ligel min du polês em ji pêlekanên dadgehê derdiketin jor, parêzer Ozcan Kiliç jî ji jor ve ber bi jêr dadiket. Me berê hevdû nas dikir. Dema wî ez dîtim veciniqî, cemidî. Ji bo ku polês pê nehesin weke ku wî nas

nakim tevgeriyam. Ozcan derbas bû û em jî ketin odeya dozger. Dozger tiştên ji rêzê pirsî û biryara girtinê da.

Li girtîgeha Umraniyeyê di nava hevalan de pê hesiyam ku Malxaz ji Gurcistanê reviyaye û çûye Ermenistanê. Li wir civîna çapemeniyê çêkiriye, lîstoka Gurcistanê deşîfre kiriye. Çapemeniya Rûsan jî ev babet xistiye rojeva xwe.

Dadgeh; min û hevalavan bi hev re parêznameyeke nîv siyasî û nîv jî hiqûqî girte dest. Bi vê rêyê ve me revandina ji Gurcistanê aşkere kir. Di dadgehê de min parêznameya xwe xwend, dema mijar hate revandina ji Gurcistanê dadwer *"ma tu kî yî erkdarên dewletê te birevînin?"* Min got, *"tu wê tiştê ji erkdarên dewleta xwe bipirse"*. Dadwer piştî ku bi alîkarên xwe re şêwirî deh deqîqe navber da. Navber qediya cardin hate destpê kirin, vê carê dadwer "*bişert dê şexs were berdan, derketina derveyê welat dê were qedexe kirin, ewleyeta wî jê were girtin, di ... tebaxa pêş me de doz dê cardin were dîtin".* Bi rengekî matmayî min ji dadwer got, "*min fêm nekir".* Bersiv neda çavên min mêze kir, kaxizek nivîsand, erkdarê dadgehê kaxiz anî da min. Parêzerê min kêfxweş, biken destê xwe ji min re hejand. Birastî jî min tiştek fêm nekiribû. Leşker cardin ketin milên min û ez birim xistin wesayîta girtîgehê. Hevalekî me têde bû, min kaxiza ku dadwer dabû da wî hevalî. Heval xwend û got, "*tu bişert hatî berdan, lê dê doz berdewam bike. Dibe ku te cardin bigirin*".

Cardin azadî û xwe gihandina qadên têkoşînê. Çileya sala 1999'an em li Ermenistanê bûn. Rêber APO dîl ketibû. Em pênc heval kulepişt li pişta me, bi bombe, sarûx, çek derbasî Rojhilatê welat û ji wir jî derbasî Başûrê welat bûn.

**Qendîl**

Kongra 6’emîn nû qediyabû, heval ji qada kongrê dihatin quntarên Qendîlê. Hevalê Fuat, hevalê Îsa û gelek hevalên din hatin. Min kesek nasnedikir. Hevalê Fuat bangî me kir. Ew, hevalê Îsa û Ferhat bi me re axivîn. Qada ku em jê hatîne û gelek tiştên din ji me pirsîn.

Çend roj şûn de heval hemû kom bibûn. Dihate gotin ku dê hevalê Cûma were û li ser rewşa siyasî şîroveyan bike. Em nêzî sêsed kes hebûn. Hevalê Cûma hat û min cara yekem Ew didît. Yek bi yek silav da hevalan û em derbasî dibistanê bûn. Heval rewşa polîtîk şîrove kir û navber da. Ji navberê şûn de rewşa hevalan pirs kir. Piştre;

*– Hevalek nû hatiye, Gurciyan ew radestî tirkan kiribû.*

Ez rabûm ser xwe û min xwe da nasîn. Lê kelacanekê min girt, xwedan, germahî laşê min dorpêç kir. Hevalê Cûma;

*– Tu bi xêr hatî, rewşa te çawa ye? Hevalekî din niha li wir e, lê Gurciyan ew nedan Tirkan gelo çima, tu çi dibêjî?*

*– Heval, ew heval berpirsê yekem e, dewlet jî hezdike bibêje “me berpirsê we nedaye”.*

*– Baş e, wekî din tiştekî din dibêjî?*

*– Yek jî hez nakin têkiliyên navbera me de tirk bizanin.*

*– Wekî din?*

Ez sekinîm, demekê bêdeng mam;

*– Nokteyeke din jî heye lê nizanim çawa bibêjim.*

*– Baş e, min fêm kir, wekî din tiştekî bibêjî, pêwîstiya te bi tiştekî heye?*

*– Na heval, spas.*

Ez li cihê xwe rûniştim lê xwêdanê ji ser min re diavêt. Hevalên li der û dora min li min mêze dikirin.

Rêber APO nû dîl ketîbû, gerîla amadekariya çalakiyên fedaî dikir. Hevalên bijarte, hêzên xweser dihatin avakirin. Pirtûka KELHA ALAMUT di dest hevalan de, her kesî dixwest wê pirtûkê bixwîne. Min jî xwend lê qet kêfa min jêre nehat. Ji ber ku egîdê pirtûkê ne bi bîrdoziyê ve, bi madeya hişbir ve dihate amadekirin û di vê de jî jin weke amûrekî dihate bikaranîn. Bihûşta derew, di naveroka wê de jî jin û şerap. Lê belê di PKK'ê de her tevger, livandin, her helwest bîrdozî bû. Xwe fedakirin li ser bingeha welatparêzî û ji ber nasnameya azad pêk dihat. Her wiha Hesen SABAH li hember navenda Selçukiyan şer dikir, lê PKK li hember mêtîngeriya cîhanê şer dikir. Wê deme çeka herî bibandor şûr-tîr bûn lê niha çekên komkujiyê dihatin bikaranîn. Kurtasî ew pirtûk li gorî roja îro ne rasteqîn bû.

Lê belê Ferhat dixwest her kes wê pirtûkê bixwîne û di her civînê de behsa wê pirtûkê dikir. Di perwerdeyan de ev pirtûk weke materyala sereke nîşan dida.

**Peywira Zozanan!**

Hevalan bangî min kirin. Min kulepişta xwe girt, çek û rextê xwe şidand û berê xwe da biryargehê. Li Biryargehê Ferhat li benda me bû. Tevî min nêzî deh hevalên din jî amede bûn. Ferhat yek bi yek navê me xwend, em kî ne, çi ne, kengê tevlêbûne yeko yeko pirsî. Paşê ji me re girîngiya karê ku em nû bikin şîrove kir. Peywira me li zozanên Qendîlê di nava gel de karê propaganda, birêxistinkirina gel û alîkarî komkirin bû. Lê diviya bû ev kar him di nava axa Rojhilatê Kurdistanê de û him jî di nava axa Başûrê Kurdistanê de were meşandin.

Em komek, bi qasî deh kesan ketin rê, riya me ji bo herêma Berde Nazê bû. Destpêkê li Berde Nazê me yê du hevalên din bigirta û ji wir dest bi karê xwe bikira. Yek hevaleke jin û yê din jî Dr. Mahîr bû. Em şev û rojekî meşiyan û gihîştin Berde Nazê. Berde Nazê li ser sînorê Başûr û Rojhilatê Kurdistanê ye, li ser nokta kevirê herdû sînoran e. Weke qadeke tampon, di valahiyekê de heval disekinîn. Li aliyekî bajarê Pîranşehir, aliyê din Hecî Umran-çoman.

Herêma Berde Nazê navê xwe ji girdekî-kevirekî mezin digire. Herêm zozan e, darek lê nîn e. Hemû mêrg, gonî û stirî ne. Di bilindahiya wê de zinarekî bilind heye. Li gorî ku gundiyan digot keçek ji xortekî hezdike û malbata wê nade xort û ew jî tê xwe ji ew zinarê bilind berdide xwarê û dimire. Peyva "berd" di soranî de zinar an jî teht-kevir e, Nazê jî navê keçikê ye, êdî navê wê heremê bûye Berde Nazê.

Tabûrek heval li wir bû, hevalê Dr. Mahîr bi kulepişteke tijî hate li cem me, min cara yekem hevalê Mahîr didît, lê min pirtûka wî ya bi navê "Şırnak Cumhuriyeti" xwendibû. Hevalên li taburê xwarin û çay dan me. Tişta bala min kişand, dest û suretê hevalan weke ku şewitiye,

deriziye bû. Min li hevalê Mahîr pirsî, ji min re got, "*ava vir wisa dike, ava vir pir sar e"*. Li ser vê ez çûm ser kaniyê. Kanî di nava mêrgan de xuya nedikir. Weke ku di bin erdê de av dikeliya derdiket, xwe hildiavêt. Hindî zelal bû mirov wêneyê xwe didît. Min bi têra xwe av jê vexwar. Birastî jî sar bû. Dr. Mahîr di kulepişta xwe de derman jî anî bû da ku ger di zoman de nexweş hebe derman bike.

Qendîl, ji aliyê Rojhilat ve gelê Başûr, eşîra Akoyan konê xwe lê vekirîbû. Nêzî pêncî-şêst mal hebûn. Em li devê dolê nêzî avê çûn malekê. Xwediyên malê hatina me dîtin. Kalekî nêzi 90 salî pêşwaziya me kir. Silav da, hal û xatir pirsî. Navê wî pîremêr Mam Sofî bû; Mam Sofî, keça wî û jina wî. Jina Mam Sofî ji wî ciwantir bû. Di navbera wan de nêzi 40 sal hebû. Mam Sofî 94 salî bû, hevjîna wî jî ji ser pêncî re bû. Mam Sofî xwedî rîşekî spî, cilên kurdî li ser bû. Keça mam Sofî ji me re ava sar û dew anî. Tehma ava zozanan, dewê ji mastê pêz bi rastî jî nayê vegotin. Mam Sofî li me temaşe kir halê giştî, şoreşê pirsî û gotin anî ser Rêber Apo. Keserek kişand, gotina xweya dîrokî kir, "*heval ez zanim hûn ji ber Serok APO xemgîn in, lê em hemû xemgîn in, lê metirsin. Hûn dizanin; Yahuda, ÎSA pêxember îxbar kir, serok APO jî cihuya-yahudiya îxbar kir, girtin dan tirkan. Îsa çarmixkirin, Îsa bû cîhanî. Ango Îsa bû Îsayê niha. Serok APO girtin. Berê Serok APO bi tenê serokê we bû, lê niha bû serokê hemû Kurdan. Girtina Wî hemû kurdan kir yek, bûne yek giyan. Niha li girtîgehê ye, Serok APO dê girtîgehê jî bike cîhanî. Qet xemgîn nebin, a rast weke hawariyên Îsa karkirin e"*. Me hemûyan bi matmayî kalê zanyar guhdar dikir. Piştî demekê em rabûn me destê kalo ramûsand û ji reşmalê derketin.

**Dr. Mahîr Gel Derman Dike**

Li konekî em sekinîn da ku ger kesên nexweş hebin Doxtor lê binihêre. Dibe ku ji sermaya zozanan be gelek nexweş hatin. Li gorî derfetan hemû hatin derman kirin, jina xwediyê malê ji doktor re;

– Hevalê doktor ez jî nexweş im.

Mêrê jinikê hema ji cihê xwe bi aweyekê lezûbez,

– *N*a doktor, ew ne nexweş e.

Hevalê Mahîr bêyî ku guh bide zilam,

– Xwuşkê kî dera te diêşe?

– *Ta di min de heye.*

Mêrê wê dîsa xwe negirt,

– *Na ne wisa ye.*

– *Hestiyên min jan didin.*

Zilam dîsa kete navberê,

– *Naêşe, tiştekê wê nîn e.*

Jinikê dîsa berdewam kir,

– *Pişta min diêşe.*

Hevalê Mahîr berê xwe da jinikê,

– *Xwuşkê ka destê xwe dirêj bike ez nabiza te qontrol bikim.*

Dema jinikê zendê xwe dirêj kir û hevalê Mahîr zenda wê girt û nabiz qontrol dikir zilam vê carê jî keserek kişand pişta xwe li me zîvirî bi dengekî zivêrbûyî,

– *Binihêr doktor, binihêre.*

Min xwe ranegirt, ji hevalê Mahîr re bi zimanê tirkî,

– *Ev zilam, heçko wê ji bo namûsê li te bide.*

Hevalê Mahîr bihêrs bi zimanê tirkî,

– *Ka tu bêdeng be.*

Zilam tiştek fêm nekir lê di bin çavan re doktor temaşe dikir.

Em ji wir derketin û çûn. Çend roj şûn de çûne ligel hin konên din. Li wir nû destpê kiribûn pez didotin. Pîrejinekê,

– *Heval bûka min nexweş e, ger derfet hebe doktor karibe lê binihêre dê pir baş be.*

Bûk hat, hevalê Mahîr piştî ku nexweşiyên bûkê guhdar kir daxwaz kir ku biçin çadira vala. Ew ji cem me derketin çûne li çadira hember ya vala. Mêrê bûkê ligel me rûniştî bû. Bi dengekî giran,

– *Heval, ew ji bo çi çûne wê çadirê?*

Hevalê Îskender jî wisa pir xwezayî,

– *Çû derziyê li jinê bide.*

Rengê zilam çû, qehirî,

– *Bira, çawa zilamek biçe derziyê li jina min bide, ez qebûl nakim…*

Vê carê jî hevalê Îskender bi neçarî kete li nava propagandayê ku şivan rihet be. Lê wî her çi kir jî zilam qanih nebû. Ji ber ku mêjiyê zilam çûbû, ji ber qehrê peyv û gotin nedigirt. Doktor hat, heya ku me xwarin xwar zilam li rûyê doktor nenihêrî, pêre neaxivî. Wer dixuya bû ku hevalê Mahîr jî zêde wateyek nedabû vê rewşê. Dema em ji zomê derketin min mesele ji doktor re got. Hevalê Mahîr bi ken,

– *Li cihê ku divê hûn alîkarî bidin min, hûn radibin fêlbaziyan dikin, karê min zehmetir dikin.*

Tiştek ketibû serê min û min pir meraq dikir. Di meşê de min bang li hevalê Mahîr kir ku bisekine.

– *Hevalê Mahîr ez tiştekî meraq dikim, em her çûne li kî derê jinên xwedî zarok hema li cem me zarokên xwe dimêjandin. Wisa pir rihet in.*

– *Ma tu nizanî ji bo çi ye? Min jî digot ev kesekî jîr e. Ev çanda kurdan a kevnar e. Li gorî çanda Zerdeştî memikê dayîkê pîroz e. Ji ber*

*ku zarokê têr dike, diparêze. Ji ber vê nabe ku ew weke amûreke, objeyeke cinsî were temaşekirin.*

Dema doktor gotinên xwe xilas kir, min şerm kir û sed mixabinî anî ku em ewqasî ji çanda xwe xerîb in û nas nakin.

**Pêşmergeyê 95 Salî**

Êvareke bêdeng, aram û em jî bi têra xwe westiyayî bûn. Koma me ber bi lûtkeyên Qendîlê ve dimeşiya. Beriya ku em bigihêjin lûtkeyên Qendîlê zomên gundiyan li ser rêya me hebûn. Dema em hinekî nêzî zomê bûn, bû ewte ewta kûçikan. Nêzî hev sê kon hatibû vegirtin. Pîremêrek, gopalê wî di dest de û bi dengekî kamil, *“heval kerem bikin werin. Metirsin seg we nagirin. Segê bigire diranê xwe nîşan nade”*. Me silav da hev û derbasî kon bûn.

Çend farşên kevin li ser axê hatibû raxistin, li der û dor çend firax, meşka şîr. Zarokên pêxas, bêgore li der û dora kon dibeziyan. Bêyî ku bifikirin strî ango tişteke din di lingê wan re biçe ji xwe re dilîstin. Bala min kişand, dayîka malê jî bêgore û pêxas bû. Paşê, bi domana nîqaşê re min fêm kir ku ev rewş ji ber belengaziyê nîn e, elimandinek e.

Hevalê Şoreş, ji Mêrdînê ye. Kêmekî soranî dizanibû û bi pîremêr re li ser kurdayetî û pêşmergetiyê ketiye nîqaşê.

Pîremêr jêre dibêje; *“ez ji sala 1940`an vir ve pêşmerge me. Ez pêşmergeyê Mele Mistefa bûm. Çûme Komara Mehabadê, ji wir çûme Rûsya û paşta hatim. Ji sala 1967`an heya sala 1992`an li cem Mam Celal min peşmergetî berdewam kir. Paşê di dema birakujiyê de min jî dev ji pêşmergayetiyê berda. Her wiha ez ji we ra tiştekî bibêjim, berê xwendina me nîn bû, me cîhan nas nedikir. Ji ber vê xiyaneta li nava hizban de tam nedihate têgihiştin. Lê PKK hat, cilê ku xiyanetê xwe pê veşartî bû çiritand. Êdî em jî hin tiştan fêm dikin.”*

Welhasil, zilam bîranînên xwe dirêj kir ha dirêj kir. Birastî jî kesekî têr û tijî bû. Dîroka dema nêz a zindî bû. Li ser van gotinan hevalê Şoreş

jî (xwedê jê razî be!) weke ku pir difikirî, awirê xwe noqande erdê û kete axaftinê, *“ mamo tu dizanî Kurdistan çar parçe ye, bindest e…”*

Mamo, bi rengekî nîv henekî û nîv hêrs, *“jixwe mamo ker e tiştekî nizane, tu xwedê tu rast dibêjî?”*

Em tev matmayî man, weke ku ava kelandî di ser me de hate rijandin. Demekê em tev bêdeng man. Piştre hevalê Îskender birêz destûr ji mamo xwest û em rabûn. Lê belê wê rojê, rojeva têkmîla me heval Şoreş bû. Û ez bawer im ew roj ti carî ji bîra wê koma me neçû.

## Ber Bi Şerê YNK`ê Ve

Payîz e, lutkeyên Qendîlê pir sar in, lê quntarên wê hîna germ in. Hevalên Bakurê Kurdistanê paş ve vekişiyane, ango hatine Başûrê welat. Giraniya wan li çiyayê Qendîlê, Zelê nêzî Çiyayê Mamend gundê Alîreşê bicih bûne. Hevalan navê wargeha Şehît Ayhan lê danî bûn. Ew der hîna jî bi vî navî tê nasîn. Nêzî hezar heval lê bicih bibûn.

YNK ji vê rewşê pir acis bû. Ji ber ku qaşo herêm di bin qontrola wan de bû û heval jî bêyî “destûr”a wan li wir bicih bibûn. YNK`ê dest bi karên kirêt kirîbû. Li aliyekî hevdîtin, dostayî ji aliyekî ve jî ji bo PKK`ê parçe bike bi riya hin kesan dest dirêjî nava rexistinê dikir. Ji bo vê xebateke taybet dida meşandin. Di nava vê xebatê de sekretera Ala Rizgarî Xetice YAŞAR, îstîxbarata Îranê, MÎT û CIA her wiha gelek kesên xwefiroş hebûn.

Ji bo PKK`ê parçe bikin ji van saziyan her yekî karek dikir. Tirkan radyoyeke bi navê “umut” xistibû meriyetê û ev radyo li herêma YNK`ê weşana xwe dikir. Xetice Yaşar bi destê YNK`ê dest avêtibû Dr. Suleyman û çeteyên wî. Hewldida wan rêxistin bike. Îranê her roj bi leystikeke nû ve dixwest qadên gerîlayan tengav bike. Car caran dida li ber topan. Ji bo gerîlayan bide revandin hêzên taybet dabû amadekirin. Ji ser gundan re xetên revê vekirî bûn û hatibû gotin ku ger gundiyek karibe hevalekî/ê bide revandin dê pereyeke pir cidî bidin wan. YNK`ê du jinên ketî şandibûn gundê Alîşêra. Armanc bi rêya zayendî gerîlayan bide revandin an jî agahiyên navrêxistinî kom bikin.

Her du jin jî weke gundiyan xwe nîşan didin. Rojekî hevalên xebatên gel dimeşînin diçin wî gundî. Di wî gundî de jî diçin li wê mala ku herdu jinên ajan lê dimînin. Du hevalên jin û sê hevalên xort in. Sekn, nêzikatî

û axaftina wan her du jinên ajan bala hevalan dikişîne. Neynûkên dest û lingên wan her du jinan ojekirî ye. Hevalekî xort dibêje, “*hûn ne li gund, hûn li bajêr dijîn”*. Hevalê xort hîna gotina xwe naqedîne jina malê ya ku bi meşkê ve dew dikêyê, “*ew keçên min in, li bajêr dijîn. Ji bo dîtina min hatine. Yek mêr kiriye û ya din jî li cem xwişka xwe dimîne*”. Heval li hember vê refleksa jina malê diheyirin. Dema ji wê malê derdikevin hevala jin ji hevalê xort re dibêje, *“ ma te çawa pê derxist ew jin gundî nîn in?”* Hevalê xort, *“ji ojeya neynûkan, rûja lêvan û ji helwestên wan. Divê em van lêkolîn bikin. Bi mîlîsên jin re biaxivin, divê em fêm bikin ev her du jin birastî jî ji vî gundî ne yan na”.*

Piştî sê rojan hevalên jin diçin wî gundî û tên. Li gorî agahiyên girtine her du jin jî ji bo YNK`ê dixebitin. Armanca wan revandina hevalan e. Hevalan ew her du jin jî ji gund qewitandin.

Gelek karên kirêt dihatin kirin. Xetice Yaşar, li bajarên ku di bin venêrîna YNK`ê de ye bi jinan re civînan çêdike û li dijî Rêber APO propaganda pêş dixe.

Rêbertî, Parêznameya Îmralî pêş xistibû û li gorî vê diviyabû ku PKK xwe ji nû ve saz bike, partiyên parçeyan pêş bikeve, her wiha di rêxistinê de bernameya, rêziknameya guherankarî pêş bikevin. Ji bo vê jî amedakariya kongreya awerte ya 7’an dihat kirin. Di vê pêvajoyê de kovara ku bi destê îstîxbarata YNK`ê dihate weşandin bi sernivîska *“an PKK dê belav be, an jî dê bibe du parçe”*. Bêguman ev ne tişteke asayî û bêbingeh bû. YNK li gorî xwe bi Dr. Suleyman û hevkarên wî piştrast bû ku ewên PKK’yan belav bikin an jî parçe bikin.

Dema Kongreya 7. li Qendîlê, li Dola Kokê kom bibû sala 1999 diqulibî 2000‘î. Dostekî ji me re agahî şandibû da ku em bilez xwe ligel wî. Em rêya şeş demjmêr di berfê de meşiyan û çûne gund. Dostê me li benda me bû. Dostê me peşmergeyê YNK’ê û fermandarê tabûrê bû. Ji me re got, *“heval xiyanet tê! Di radyoyê de YNK`ê hişyarî da û di amadehiya şer de ye. Li cem min cebilxaneya hevalan heye bila werin bigirin. Hizip dizane li cem min e. Paşê dê ji min bistînin. Dîsa birayekî din jî dixwest we bibîne. Niha li gundê Suredê li benda we ye.*

Em ji cem gundî bilez ketin rê. Ji ber ku ew dostê ku dixwest me bibîne dostekî girîng bû. Her wiha ji navenda YNK`ê agahî dianî. Em êvarê gihîştin gundê Suredê. Derbasî malê bûn. Sobeya daran pêketibû, bêhna agirê daran da difna me. Lingên me şil bibûn, daxwaz kirin ku em gorên xwe derbixin li ber sobê germ bikin lê me spasiyên xwe vegot û li ser daxwaza dost ez û ew derbasî odeya din bûn. Dostê me destpêkir;

*– Heval, Xosret Resul çûbû Tirkiyeyê. Li gorî ku peymana çêkirine Tirk dê alîkariya pere, lojîstîk û çek bikin û li ser vê YNK dê bi we re bikeve şer.*

*– Ev agahî teqez e?*

*– Belê heval, ji niha ve destpê kirine cilên pêşmergeyan, çadir, erzaq dikişînin.*

Rewş safî bibû, em derbasî salonê bûn. Hevalan ez di nava fikaran de dîtim û hevalê Rohilat bi tirkî got, "*heval çi bû?" "Em xwarina xwe zû bixwin û biçin baş e."* Ruxmî ku lingên hevalan şil bûn, westiyayî bûn û tarîtî jî têra xwe ketibû erdê qet nîqaş nekirin. Hema piştî xwarinê em derketin. Piştî em ji gund derketin me xwe xiste du beş. Ez û hevalê Omer di riya çiyê re emê biçûyana ligel hevalan û hevalên din jî dê ji bintara çiyê re biçûyana.

Di rê de hevalê Omer guhê min ker kir. Spî ketibûnê û wî cara yekemîn tişteke wiha dijiya. Derûniya wî xirabibû. "*Heval ezê çawa xwe ji vê mîratê rizgar bikim? Nexweş nakevim ne wisa? Laşê min birîn nabe ne wisa?"* Êdî ez aciz bûm, lê min qet bersiva wî neda. Hemû derdê min xwe gavek zûtir gihandina hevalan bû. Em gihîştin ligel hevalê Demhat wan, min hevalê Omer li wir hişt û ji wan re got, *"bidin xatirê xwedê, vî hevalî bixin avê, cil û bergê wî jî bikelînin. Ez ê sibê werim cem we"* û çûme li cem rêveberiya Qalatûkan. Hevalên rêveberiyê ji xew şiyar bûn, min agahî da wan. Hevalan siharê bi rêya bêsîmê agahî dane dîwana kongreyê.

Agahî rast bû. Çend rojê din rêxistinê ev agahî ji çend cihê din jî piştrast kir. Kongre bi serkeftî xelas bûbû. Çemkê xiyanetê têk çûbû,

derbekî mezin xwaribû. Li ser vê YNK mat bû. Vê carê jî pêşmergeyên xwe li bintara Qendîlê bi cih kirin.

Pêşmerge pir nêzî me bûn. Hevalan bangî me kir da ku em biçin bi wan re biaxivin bila nekevin şaşitiyan û diviyabû em têbigihêjin armancên wan çi ne. Ez û hevalekî ji Hepepçê navê xwe Şivan rabûn çûn.

Nêzî sed pêşmerge di çadirê de bicih bûne. Bi dîtina me re rabûn ser xwe, me yeko yeko silav da wan. Diyarkirin ku bi hatina me kêfxweş bûne. Min pirsa fermandarê wan kir. Kesekî 50 salî bû, xwe da nasîn. Me da diyar kirin ku bila hemû pêşmergeyên xwe kom bike em ê çend gotinan bibêjin. Fermandar li kesê kêleka xwe nihêrî, kesê li kêleka wî "*heval hûn ê ji bo çi civînê çêbikin?*" Me fêm kir ku ew kesê diaxive jî xwedî rayeyekê ye. Min got, *"tu kî yî?" "Ez siyasî komser im."* Min xwe negirt, *"siyasî qonserve, wexta em biaxivin tu yê jî bizanibî, niha pêşmergeyan kom bike"*. Siyasî komser li me nihêrî û hevalên li jorê ewlekarî girtine nihêrî û bêdeng ma. Pêşmerge hemû kom bûn. Me li ser xiyanet û birakujiyê hin şîrove kir. Pêşmergeyekî mafê axaftinê girt, "*heval em ji bo şer nehatine vê dere. Ji me re gotin heval ê biçin Tirkiyê biçin ewlekariya wan bigirin. Û paşê jî ew ê çekên xwe bidin we"*. Min li siyasî komser nihêrî serê wî berjêr bû. Mijar hatibû fêmkirin. Pêşmerge pir germ nêzî me bûn. Piştî civînê çay amadekirin û me hin sohbet kir. Yekî kal;

*– Heval zayînda te çi ye?*

*– 66.*

*– Heval min rastî pirsî, ji bo çi wiha dibêjî ?* (hîna min tiştek fêm nekir wî cardin dubare kir) *na, ez rast dibêjim.*

Min fêm kir ku sarbûnek çêbû, pêşmerge bêdeng ma. Heval Şivan kete nav;

*– Heval wateya 66 nizane. Birastî jî zayîna wî 66 e.*

Di rê de min li heval Şivan pirs kir ka ev mijara 66 çi ye. Biken ji me re behs kir; "*heval, di 66`an de Mam Celal çekên Saddam digire û li dijî pêşmergeyan şer dike. Di Başûr de YNK wek cehşê 66'an tê nasîn.*

*Wexta ku bibêjî 66 weke ku tu ji wan re bibêjî cehş fêm dikin. Her wiha li Dihokê dema tu tiştekî bikirî mînak bihayê wê/î 70 dînar be wextê tu pere dihejmêrî li dewsa 66 dibêjin "mam celal" û piştre dibêjin 67 . Li Silêmanî jî dema di karekî de vê hejmarê bikarbînin dibêjin "hurmeta min heye" û paşê dibêjin 67.*

## Qendîlê Ensarîl Îslam

Gundê Pişteşan, taştiya sibehê, zarokekî deh salî ji dayika 60 salî Helîme re tiştan dibêje. Dayik reng dide ber bi me ve tê û bi dengekî bi tirs *"heval li ser re kesên bi ruh, nêzî sed kesên çekdar çadir vedane, gird-senger çêkirine"*. Em jî heşt heval in. Çar jin û çar jî xort in. Me li ser bêsîmê bi hevalên Qalatûkan re pêwendî danî û li ser şîfreyê rewşa heyî diyar kir. Hevalan gotin, *"hûn werin, emê li jêrê bergiriya pêwîst bigirin"*. Li ser vê agahiyê em ji malê derketin. Dayîka Helîm û hevserê wê bitirs û dudulî, *"heval meçin, li vir bin. Ka hinekî bisekinin dibe ku biçin…*" Dayê dilerizî, gelekî birakujî dîtibû. Di 1982'yan de şerê Partî Şûî (kominist) û  YNK'ê dîtibû, şehadeta hevalê Mehmet Karasungur, Îbrahîm Bîlgîn wan jî li heman herêmê bibû.

Em ji malê dûr ketin. Li dola jêra gund me civînek li darxist. Hevalan nîqaş kir û nêrîneke hevpar derket. *"Em bi rengekî veşartî, bêyî ku wan bibînin ji vir biçin, ew ê fêm bikin ku em ji wan tirsiyane û reviyane. Her wiha ev rewş dê ji bo prestîja partiyê jî nebaş be. Dîsa em nizanin ew kî ne, çi ne. Divê em vê jî fêr bin"*. Me fîşek dan ber namlûyê, mesafeya pêwîst xiste navbera xwe û ber bi wan ve çûn. Hevalê Şivan di pêş de dimeşiya. Dema em nêzî wan bûn zîrewanê wan li sengera xwe bû û berê namlûyê li me bû. Çend kesên din jî li rex zîrewan biçek li me dinihêriyan. Hevalê Şivan bi dengekî bilind bangî wan kir, *"berpisyarê we kî ye, bangî wî bikin karê me pê heye"*. Ji wan yek meşiya hat nêzî me bû, silaveke sar da me, di bin çavan re jî, li hevalên jin dinihêre. Li gorî planê; heval dê nesekin, bimeşin. Ez û hevalê Şivan jî me yê bi wan re biaxiviya. Heval bidîsîplîn meşiyan. Piştî demeke kurt yekî din hat û got "*mesûlê me ne hazir e"*. Heya wê demê hevalê Şivan ji wî kesê bi

me re diaxiviya fêrbibû ku nêzî 60 kesî ne, YNK`ê ew anîne vir û cih daye wan.

Di astekî de me hin agahî girtibû. Em ji wê qadê dûr ketin. Hevalan li ser bêsîmê pêwendî bi me re çêkirin. Heval hatibûn pêş me. Li gundê Suredê em gihîştin hevdu. Nêzî 40 heval li hev civiyabûn. Em tev çûne biryargehê, li wir me agahî da rêxistinê.

Piştî çend rojan şandeyek heval çûn ligel rêxistina Îslamî. Bi wan re axivîbûn û wext dabûn wan ku herêmê biterikînin. Nedixwestin herêmê biterikînin, lê belê der û dora wan hatibû dorpêçkirin. Ji neçarî çûn. Piştre li gorî agahiyên me girt ev rêxistineke tarî û qontra ye. Di nava wan de Hizbul Qontra, MÎT, Îtlata Îranê jî di nava wan de bû. Armanca YNK`ê qaşo me, bi navbeyniya van qontrayan ve bi îslamiyetê re bide şerkirin. Herî dawî YNK`ê ew li Helepçê bicih kir. Ev rêxistin piştî demekê li dijî YNK`ê kar kir. Bi destwerdana Emerîkayê ya Iraqê ve YNK`ê bixwe mudaxaleyê vê rêxistinê kir. Di navbera wan de şerên dijwar qewimîn.

## Partiya Agirê Sor

Agirê Sor, rexistineke li Rojhilatê Kurdistanê tevdigere ye. Serokê vê rêxistinê berê endamê PDKÎ bûye, lê paşê qaşo nakokiyê ramanî jiyane û PDKÎ cudabûye.

Piştî ku Rêber APO dîl dikeve li Rohhilat serhildan bi pêş dikevin, ev rêxistin di nava gel de belevokan belav dikin da ku gel piştgiriyê bide PKK`ê. Xwe weke alîgirê PKK`ê didin nasîn.

Dawiya meha Sibatê, li Qendilê em çend heval çûne Gundê Bêpalan. Li gund keçek hat pêş me û got, *“heval du kes hatine li mala me û dibêjin em heval in. Lê belê qet naşivin hevalan û niha di odê de di xew de ne”.* Em rabûn çûne wê malê. Bergiriyên ewlekariyê hatin girtin û hevalê Şivan çû ew şiyar kirin, anî li cem me. Hal, xatir, merhaba û xwe dane nasîn. Endamê Agirê Sor in. Hatine li cem Kanî Yilmaz û Kanî jî notek daye destê wan. Di notê de hatiye gotin ku heval dê dest nedin van û ev ê biçin Rojhilat. Min bernama, rêziknameya wan û navê serokê wan pirs kir. Bersiva min dan û gotin, navê serokê rêxistina me Mahmûd Pencewîn e. Min rewşenbîrê Başûr Mehmet Pencewîn nas dikir, li ser vê min cardin pirsî lê dîsa heman bersiv dan.

Firavîn hat, me pêkva xwarin xwar. Piştî xwarinê hevalê Şivan banî min kir û got, *“ev zilam bi xwe Mahmûd Pencewîn e. Ew kesê li rex wî ji herêma Helepçê ye”.* Me ji hev xatir xwest û em çûn ligel hevalan. Me rewş ji hevalan re vegot, haya hevalan jê hebû. Hate gotin ku rêxistineke kurdî ya nû ye, alîkarî ji me dixwazin. Dixwazin li dijî Îranê derbikevin. Her wiha stratejiya wan çar parçeyê Kurdistanê bingeh girtine.

Ez daketim cihe mêvanxanê, hevalekî ji Rojhilat navê xwe Sîrwan, bi temenê xwe mezin û demeke dirêj di PDKÎ de pêşmergetî kiriye ye. Di

dema dîlketina Rêbertî de hatiye tevlî me bûye. Silav da û bi dengekî xemgîn "*heval ew kesên ku duh hatibûn, ê ku navê wî Mahmûd Pencewîn endamê Îstîxbarata Îranê ye. Her wiha bi dehan pêşmergeyên PDKÎ'yê bi destê xwe qetil kiriye. Heval çawa bi vî zilamî bawer dikin*". Ez matmayî mam, min got, *"te ev agahî daye hevalan?"* got "*na*". Min fêmkir ku ev heval nû ye, alaniyeta PKK`ê baş nas nake. Ez ji neçarî cardin vegeriyam ligel hevalan û min ev agahî da hevalan. Hevalan got em ê bişopînin.

Di bihara 2000´an de hevalan rêxistina Agirê Sor ji Qendîlê ji Dola Eyşo derxistin. Demekê din em fêr bûn ku Îranê li herêma Berde Sorê avahiya qereqola xwe daye wan. Agirê Sor jî gel dişêlîne. Du gundî kuştine. Bi serî lêdana gundiyan ve hevalan bi rengekî nepen dora qereqolê dorpêç kirin. Şehîd Akîf û çend hevalên din bi rengê hevdîtinê çûne li cem wan. Li gorî plan-nameyê hevalê Akîf dê wan bidana axaftinê û hevalên dîtir jî dê xwe nêzî sengerên wan bikirana. Dema hevalan li ser bêsîmê bigotina "em amade ne" hevalên hûndir dê Mahmûd Pencewîn bêbandor bikirina. Rastî jî plan bi serket. Bêyî ku fîşekek were teqandin nêzî 30 kesan an jî hemû endamên rêxistina Agirê Sor hatin girtin.

Derket holê ku du keçên ji bajarê Sineyê hatine ku beşdarî PKK`ê bibin. Lê vana van jî gotine; "*em PKK ne*". Bi kirêtî nêzî van keçan bûne, demekê dirêj ligel girtine. Hevalan ev her du keç jî rizgar kirin.

Li ser vê, dewleta Îranê har bû. Dest bi top avêtinê kir. Daxwaz dikir ku em van qontrayan berdin. Lê rêxistinê demeke dirêj ew bernedan. Herî dawî bi şertê dê ev kes li ser axa Kurdistanê ti karan nemeşînin hatin radestkirin. Di dawiyê de li gorî ku me bihîst dewleta Îranê Mahmûd Pencewîn wenda kir. Lê çi anî bû serî wî nedihat zanîn, bi vî rengî Agirê Sor jî temirî.

**Silêmanî**

Newroza 2000'an me li çiyê pîroz kir**.**

Gerîla û gel di nav hev de bûn. Bernama Newrozê asayî, bikenok, şox û şeng… Pêşmergeyên YNK'ê, ji dûra ve temaşe dikirin. Hevalên rêveberiyê bangî min kirin. Cihê peywira min guheriye û li gorî vê ezê biçûyama Silêmanî. Min karên xwe, kel û pelên xwe komî ser hev kir û êdî ji bo çûyînê amade bûm. Li ser kar û peywira me ya nû nîqaş û guftogoh bi me re hate kirin. Min ê li Silêmanî karê rêxistiniya gel bikira. Me yê (hevalê Helmet –Diyar Xerîb-) xebatên nepenî, binerd an jî xebatên îlegal bimeşanda. Ez zêde ne xerîbê vî karê bûm. Ji ber ku di van karan de ezmûneke min hebû. Lê belê pirsgirêka min a sereke di milê zimên de bû. Min bi zaravayê soranî nizanîbû. Lê diviya bû ku ziman ji bo şoreşgeran nebe asteng û ez jî wisa tevgeriyam. Lê divê ez mafê wî nexwim; hevalê Helmet û gorbihûşt bavî wî Mam Xerîb pir alîkarî dane min.

YNK`ê êdî bi aşkereyî; şerekî derûnî, polîtîk dabû destpêkirin. Li aliyekî zext li malbatan dikirin ku bila hevalan qebûl nekin û li aliyê din jî zext dikirin ku bila zarokên xwe biçin bînin, bidin revandin. Her wiha kî/ê bi me re vekirî dostayî bike, yan digirin an jî wan ditirsînin, tahdeyî li wan dikin.

19`ê gulanê, Dr. Suleyman û hevkarên wî ji refên azadiyê revîn. Xwe spartin hembêza YNK`ê û li cem hevkar û jina wan Xecê Yaşar. Yekser destbi xebatên li dijî bizava azadiyê kirin. Bi taybetî jî li ser malbatên hevalên me bi sedan derew dikirin. Malbat dihatin reşkirin da ku malbat biçin zarokên xwe bînin. Ji bo vê bi taybet tanzîm çêdikirin.

## Partiya Zehmetkêş

Serokê wê Qadîr Ezîz, di navbera me û YNK'ê de navbendî dike. Rojekî bangî hevalan kir. Berpirsiyarê me Hevalê Zana gazî min kir û got;*"hevdîtinek heye, were em bi hev re biçin".* Em rabûn çûn ligel Partiya Zehmetkêşan. Avahiyeke du qat, fireh û li ber derî du zîrevan sekinandîbûn. Di ketina avahiyê de cîgirê Qadîr Ezîz, Dr. Serdar pêşwaziya me kir. Qadir Ezîz di oda xwe de li benda me bû. Xêr silamet, zimanê dîplomasiyê... Tişteke welê pir girîng nîn bû. Bi tenê hez dikin her du rêxistin hevdu nas bikin û pêwîstiyên me bi tiştekî heye yan na alîkariya me bikin.

Dema me xatir dixwest, Qadîr Ezîz cîgirê xwe derxist, em tenê man. Qadîr Ezîz;*"heval çi karê we hebe werin li cem min, şev jî be werin, ezê alîkariya we bikim, dervayê min baweriya xwe bi kesekî din neynin"* me xatir xwest û em ji odê derketin. Qadîr di oda xwe de ma. Cîgirê wî Dr Serdar me ji salonê derbas dike, wî jî destê hevalê Zana girt bidengekî nizm "*heval ez çûme cem Serok, çi tengasî, çi kar hebe werin li ba min. Wekî din ji kesî bawer nekin. Ez yekî ji we me. Heval Cûma min nas dike, ji wî re jî silavên min bibêjin".* Me ji wî jî xatir xwest. Li taxa jêrê endamê Meclîsa wan Dr. Bêstun silav da me. Em heya li ber wesayîtê bi hev re hatin. Berî ku em li wesayîtê siwar bin Dr. Bêstun;*"heval rewş xeter e. Bi kesî bawer nekin. Agahiya min bi gelek tiştî heye. Ez şev û roj li vir im, metirsin tiştek hebe werin li cem min"*. Em bi zorê li wesayîtê siwar bûn. Di wesayîtê de;

*– Hevalê Zana te çi fêm kir?*

*– Wellê mirovên baş in, mêvanperwer in. Çûne li gel Rêbertî jî.* Ez demekê bêdeng mam. Hevalê Zana li min nihêrî,

*– Ma çi bû?*

*– Di rêxistinekê de sê deng, ango sê serî. Her yek jî ji aliyekî ve dikişîne.*

*– Tu jî her tiştî biguman dest digirî.*

Hevalê şofor kete navberê;

*– Rast e, heval jiyan bêguman nameşe.*

## Hevdîtina Îtlaata Îranê

Serokê Rêxistina Zehmetkêş Qadîr Ezîz notek ji heval Zana re şandiye. Di notê de hatibû gotin ku Îran dixwaze bi we re hevdîtin bike. Hevalê Zana xwe amade kir. Bi tevî şofor em ketin rê û çûn avahiya rêxistina Zehmetkêş. Di avahiyê de Qadîr Ezîz pêşwaziya me kir. Şandeya Îranê hîna nehatibû. Piştî çend xulekan kesekî bi cilê sportîf li ser, ruyê wî kêmekî dirêj, temenê xwe nêzî 40`î kete odê û ji dûra ve silav da me. Em bendê bûn ku destê me bigre lê ew çû li cihê xwe rûnişt û lingê xwe avêt li ser hev. Bi wê rûniştin û nêzikatiya xwe ve qaşo peyam dida ku em we zêde cidî nagirin. Ji tebaxa li ser masê hurmiyek rahişt, bêyî ku hûr bike gezeke çors lê xist. Ji aliyekî ve hurmiya xwe dixwar û ji aliyekî ve jî bi awirên ji xwe razî ve li me dinihêrî. Min jî lingên xwe avêt li ser hev, ji tebaxa fêkiyan hêjîrek girt di yek carî de avête devê xwe. Îtlaatî demekê wisa li min nihêrî. Hevalê Zana îşaret da min ku ez xwe komî hev bikim. Lê belê min qet xwe nelivand.

Îtlaatî kete axaftinê, Qadîr Ezîz jî tercumanî dikir. İtlaatî her diaxivî heya Qadîr Ezîz werdigerand kurdî min tirkiya gotinên wî ji hevalê Zana re vedigot. Îtlaatî sekinî li min zîvirî *“farsî beledî?”* min bersiva wî neda. Dîsa dest bi axaftinê kir, di axaftinên xwe de gef, şantaj hebûn. Di dawî de got *“ger hûn dixwazin em bi we re bibin dost, divê hûn kurdên muxalîfê yên Îranê dernexînin Medya tv”.* Hevalê Zana li min nihêrî, min jî ji Qadîr Ezîz re *“jêre bibêje televîzyon a gelê kurd e û mafê her kurdekî/ê jî heye ku têde derbikeve”*. Îtlaatî dîsa li min zîvirî *“berpirsyar tu yî?”* min dîsa bersiva wî neda. Hevdîtin xelas bû. Em ê rabûna, min ji heval Zana re got, *“di xatir xwestinê de destê wî negire, hema ji dûr ve em jêre bibêjin bi xatirê te û biçin”*. Me wisa jî kir.

Em li wesayîtê siwar bûn, hevalê Zana ji min qehirî, *“ma berpirsiyar ez im an tu yî? Te çima nigên xwe havête li ser hev, ji bo me eyb e”*. Ez keniyam, *“meqihire heval, armanca min ne tu bûyî. Ji bîr neke di dîplomasiyê de tiştê ji gotinê girîngtir helwest û nêzikbûn in. Li gorî min şerekî giran di devê deriyê me de ye û Îran jî di nav de ye. Û tu rapora xwe jî bi vî rengî binivisî dê baş be”*. Hevalê Zana demekê bêdeng li min nihêrî û got;*“ez bawer nakim şer çêbe”*. Hevalê Şofor, *“şer destpê kiriye heval, her roj êrişî saziyeke me dikin, ez bawer im di demeke nêz de şerê germ jî dê dest pê bike”*. Hevalê Zana biqehir *“hûn herdu jî wek hev difikirin”*.

Ji wê rojê şûn de birastî jî YNK`ê di her qadê de êrîşên xwe zêdetir kir. Li gorî ku agahiyên me bidest dixist tirkan sê tir cebilxane ji YNK`ê re anîne, xebatên qontrawarî zêde bûne. Di wê pêvajoyê de kesekî ku ji nav me reviyabû, navê xwe Doxan (ji Mûşê bû) ji bo min bibîne agahî şandibû. Hevalê (şehîd) Îskender Dirbespî û ez çûne cihê hevdîtinê. Doxan hat, bi kelegirî *“heval xiyaneteke mezin li ser partiyê heye, lê ez nizanim tam çi ye. Hêzên qontra ava dikin, kesên biyanî hene yên ji nav me revîne bi darê zorê dixin nav. Dîsa dê kanpanyayeke propagandaya reşkirinê li Ewropa û li qadên din li dijî Partiyê bidin destpêkirin”*. Gotinên wî û agahiyên me bidest xistibûn hevdu piştras dikirin. Min jêre got, “*ka bi me re were. Bizîvire, metirse heval dê te qebûl bikin”*. Doxan giriya, pişta xwe da me û çû.

Qendîl, qadên hevalan her ku diçû ji aliyê YNK`ê ve dihate tengkirin. Li ser rê, kanî û di ketin û derketina gundan de, di hatin û çûyîna erzaq de astengî dihatin derxistin. Heval dihatin tahrîk kirin. Ji bo şer dernekeve hevalan xwe hinekî paş de kişandine, li bilindahiyên Qendîlê bicih bûne. Lê YNK bi vê ve jî nasekine; radestbûnê, parçebûnê, tunêbûnê li tevgerê ferz dike. Ev harbûna YNK`ê ji du tiştan dihat; yek hêzên giregir mîna YDS, YE, Îran, Tirk jî ev tişt ji YNK`ê dixwestin. Duyem; Dr. Suleyman, hevkarên wî, Xetîce Yaşar, Îbrahîm Guclu qaşo aqil dane ku *“gerîla êdî şer nake, tu biçî li ser wan an dê belav bin an jî*

*dê radest bin”*. YNK, li gorî van herdu argumanan tevdigere û armancên wî yên polîtîk jî; mîrateyê PKK`ê ji wî re bimîne bû.

Silêmanî, Çarqurne, Ranya; hevalan li van deran karên erzaq û dîplomasiyê dikirin. YNK`ê nêzî 30 hevalên ku van karan dikirin girtin. Di van girtinan de armanc qadro teslîm girtin û bandora qadro ya di nava gel de bêbandor kirin bû. Lê belê tişta dihate hêvîkirin pêk nehat. Ji kesên girtî yek jî hevalên di nava xebatên gel de nîn bû. Ji ber ku hevalên xebatên di nava gel de xebat dimeşandin xwe ji zû ve de binerd kiribûn. Beriya ku YNK operasyon bikişîne, rêxistinê bergiriya xwe girtîbû. Hevalên ku pir dihatin nasîn hemû hatibûn kişandin. Ên nû, ên nayên nasîn û di bajaran de xwedî ezmûn hatibûn şandin. YNK`ê her çi dikir nikarîbû pêşiya propagandaya PKK`ê bigirta. Li her navçê, bajarê xebat dihate domandin, rojname derdiket û dihate belavkirin. Dr. Silo û hevkarên wî nekarîbûn bigihêjin armancên xwe.

YNK`ê, ji bo hevalên girît ji PKK`ê qut bike şerê derûnî dabû destpêkirin. Di çarçoveya xebatên xwe yên xinîz de, Xecê Yaşar çûye girtîgehê û bi hevalên girtî re yeko yeko hevdîtin kiriye. *“PKK xelas bûye, Abdullah OCALAN şaş e, werin ligel me emê destbi şoreşeke nû bikin...”* qaşo bi gotinên bi vî rengî ve hewldaye hevalan li der û dora xwe bicivînin. Ji bilî du kesan ti kesî gotinên Xecê cidî negirtibû. Lê belê du kes be jî ji aliyê Xecê ve hatibûn xapandin.

Rewş her ku diçû giran dibû. Li ser vê rewşê ji aliyê navendê ve talîmatek hate şandin, “*kî/ê bêyî ku li ber xwe bide û şer bike bikeve destê YNK`ê emê weke xiyanet bigirin dest”.* Ev talimat bo hevalên îlegal dixebetin rihet kiribû. Ji ber ku beriya vê talîmatê ger rewşeke şer bipêş biketa dibû sedema pravakasyon an jî şerekî bêwext. Êdî hevalên bajaran xebatên xwe bêhtir bidizî dimeşandin. Hemûyan tabance û bombeyên destan rakiribûn.

YNK`ê bangî hevalê Zana kiribû û jêre gotibû, *“biçe Qendîlê, ji hevalan re bibêje em dixwazin hevdîtin çêbikin”.* YNK`ê bi vî rengî hevalê Zana xapandibû, anîbû lîstokê. Hevalê Zana ji bo hevdîtinê ji mala fermî, dîplomasiyê bi lîstikekê ve hatibû derxistin û bêyî ewlekarî

xistibû rêya Qendîl û Ranyayê. Di vê rêwitiyê de hevalê Zana wek "qaçax" hate girtin û avêtin girtîgehê.

Hevalan civîn û tekmîlên xwe di mizgeft û goristanan de çêdikirin. Êdî dem û cihê xebatên propagandayê pir zêde diyar nîn bû. Kengê valatî û derfet bihata dîtin wê demê ev xebat dihatin kirin.

Hevala (şehîd) Tanya û Ayten belevokên rêxistinê êvarê belav dikirin. Di demeke vê xebatê de belevokan diavêjin hewşa mala Xosret Resûl. YNK, ketibû di nava gumanan, pir tirsiyabû. Ji ber ku heval heya li ber deriyê hewşa wan çûbûn ewlekariya rêveberên xwe zêdetir kiribûn.

## Çûyîna Qeredaxê

Hevalan talimat şandibû, hatibû gotin ku ji bilî çend hevalên nayên nasîn û karibin xwe biparêzin bila hevalên xebatên bajaran dikin xwe vekişînin çiyayê Qaradaxê. Li ser vê talîmatê hevalên îlegal li mala dostekî kom bûn. Nîqaşa divê kî/ê bimîne û biçe, yên biçin dê çawa biçin, veşartîbûneke çawan bingeh were girtin û hwd. hate nîqaşkirin. Hevala Tanya xwest li bajêr bimîne. Xwesteka min jî hebû lê belê hevalan nepejirandin. Çend heval man û em 17 heval dê biçûyana çiyayê Qaradaxê. Bername hate çêkirin. Em li gorî bernamê tevgeriyan û ber bi êvarê koma me gihîşte çiyayê Qaradax.

Hevalê Helmet pêşengê me bû. Di nav me de bi tenê wî rêya çiya baş nas dikir. Ji lewre ew zarokê vê herêmê bû. Heval hemû tî bibûn. Ji bo avê hevalê Heval em birin dolekê da ku li wir kanî, av heye. Lê ne kanî û ne jî şopa avê hebû. Çavên hemû hevalan li ser hevalê Helmet bû. Pêwîst bû wî şîroveyek bikira. Li der û dora xwe temaşe kir, demekê bêdeng ma û di dawî de, “*heval bi xwedê wexta ez zarok bûm li vir av hebû, niha çikyaye”.* Hevalan destbi henekên xwe kirin; wê demê tu çend salî bûyî, bihar bû yan payîz bû…

Bi wê tîbûnê ve, bizor û zehmet em gihîştin li cem hevalan. Hevalên li Qaradaxê pir germ pêşwaziya me kirin. Piraniya hevalên wir nû û ji Rojhilatê Kurdistanê bûn. Bi tenê di rêveberiyê de hevalên kevn hebûn. Hevala Rojger rêveberiya hevalên jin bû.

Fermandarê giştî kesayetekî ji xwe razî û popîlîst bû. Nakokiyên wî bi hevalên jin re jî hebû. Diyar bû ku ji hatina me zivêr bibû. Em hemû hevalên kevn bûn, êdî weke berê nikaribû ferasetên xwe ferz bike. Ji ber vê jî di navbera me û hevalên di perwerdê de cudahî da çêkirin. Qaşo

hevalên din nû ne, perwerde dibînin û em ê jî cuda bikevin lêhûrbûnê. Sedamê vê jî "em" nerihet nebin bû!

Çend roj bû me dest bi karên xwe kiribû. Ji bo perwerdê me bernameyek amadekiribû û bi vê tevahî civînên nirxandina kardariyê jî dihate kirin. Hevalê Efser hat got, "*heval mêvan tên hûn jî nayên em biçin pêşwaziya wan bikin".* Em hemû rabûn çûn. Du kes bûn, cil û bergên kurdinî li ser wan bû. Temenê yekî 30, wek meleyên Îranê rî berdabû. Hewa bêhn kir û got *"bêhna Rêber APO ji vir tê, wek qada Rêbertî ye".* Bi ken û dilgeş heval hembêz dikir û carinan jî maç dikir. Mêvan çûn cihê rêveberiyê û em jî hatin cihê xwe. Min ji hevalan re got; "*ev gotina qada Rêbertî çi ye, ma vî zilamî Rêbertî dîtiye?* Hevala Tanya; *ez bawer nakim, dibe ku ji ber hevalê rêveberiyê xizmê Rêbertî ye ji bo wê wisa dibêje".*

Roja din mêvan çûn. Hevalê ku qaşo xizmê Rêbertî bû perwerde dida şervanên nû. Di nava axaftina xwe de, *"êdî partiyên parçeyan bi pêş dikevin. Ez jî serokê Rojhilatê Kurdistanême".* Bi bihîstina vê hevokê ve hevala Tanya, "*Gotina mîlîs niha baştir hate fêm kirin, lewma jî vî zilamî xwe wek serokê Rojhilat îlan kir".* Hîna hevala Tanya gotina xwe neqedandibû hevala Şerzan û hevala Jînda ji cihê xwe rabûn, bikifir, "*ev alçax çawa xwe dixe dewsa Serok APO. Ezê wî bikujim".* Me bi zor û zehmet ew dane sekinandin. Hevalekî ciwan got, *"heval ev rêbaza îstîxbarata Îranê ye. Pesin bide, biwerimîne û wek balonê lê bîne. Dema karê te qediya jî bi derziyê ve biteqîne! Divê em bisebir tevbigerin. Dîsa divê em bikevin li nava hevalên nû, divê em hevalên nû li hêviya wî zilamî nehêlin".*

**Şerê Qeredaxê**

14`ê meha Îlonê. Êvarê ez û du heval heya derengiya şevê di kemîna bizinên kovî de man. Şans li rûyê me nekenî, di yeke şevê de em dest vala vegeriyan ligel hevalan. Hevalê zîrevan; *"hevala Tanya li benda we ye. Hin kes hatin heval bi wan re axivîn. Hevala Tanya got çawan heval hatin werin min agahdar bikin"*. Ez ber bi cihê hevalên jin ve çûm. Min bang kir, hevala Tanya çeka wê di dest de, li ber darekî, li benda min bû. Li gorî ku heval behs kir; pênc kesên wek nûnerê Partiya Komînîst hatine û gotine Mam Celal gotiye, bila bilez Qaradax vala bikin û ji wir biçin. Na ger neçin, ewê bi zorê me derxînin. Hevala Tanya, *"li gorî ku min ji wan fêm kir ew pênc kes hemû ne endamê Partiya Komînîst bûn. Di nava wan de du kes endamê YNK`ê bûn û armanca wan ew e ku êrîşî me bikin. Ji ber ku di axaftinên wan de gef-hiraşe hebûn"*. Me hinekî nîqaş kir. Di encamê de biryar hate dayîn sibehê civîn were çêkirin, nêrînên hevalan bigirin û li gorî wê tevbigerin.

Bi roj başê re em rabûn. Hîna 04:30`ê siharê bû. Dengên fîşekan hat. Deng ji rojavayê wergehê dihat û bêyî navber fîşek diteqiyan. Rojavayê wergehê ew cih bû ku heval siharê diçûn wir qontrol bikin û ewlekariyê bigirin. Hemû hevalan dilezand, amadekariyên xwe dikirin. Em bilez çûn ligel rêvberiya wergehê. Hevalê Rêveberiyê di destê wî de bêsîm bi hevalê Şaho re diaxivî. Hevalê Şaho,

– *Heval der û dora me girtine, ji me re dibêjin radest bin.* Hevalê Firat,

– *Ji wan re bibêje em heval in.*

– *Heval me jî wisa got lê evanan dizanin em heval in. Ji me re dibêjin radest bin, heqeretan li Rêbertî dikin û der û dora me pêçane*.

Hevala Tanya li Firat zîvirî,

*– Ji hevalan re bibêje bila lê bidin, xwe biparêzin heya ku heval xwe bigihînin wan.*

Firat bi awirekî tel,

*– Çawa, ma emê şer îlan bikin?*

Min xwe negirt,

*– Te hevala Tanya bihîst. Ji hevalan re bibêje bila xwe biparêzin. Ma ew ê radest nebin.*

Firat demeke kurt li me mêze kir û bi dengekî jixwe bawer,

*– Heval hûn lê bidin, emê xwe bigihînin we.*

Gotin êdî qediya bûn. Piştî demeke kurt du bombe teqiyan. Hevalan xwe gihandin hevalê Şaho û ew ji nava çemberê derxistin anîn. Pêşmerge xwe pir nêzî hevalê Şaho dikin û ew jî di nava pênc kesan de bombe diteqîne.

Êdî cîhan ronî bibû. Bi dûrbûnê me der û dora xwe temaşe dikir. Her çar aliyê me hatibû dorpêçkirin. Nêzî sê hezar pêşmerge hatibûn li ser 60 hevalî. Çar heval gazî, 33 şervanên nû û em jî ji ber ji nav xebatên gel çûbûn wir hinekî me bêçek bûn. Bi giştî 15 qilêş, 1 BCK, 1 B-7 û çend jî bombeyên destan. Me hevalên nû li gorî hevalên kevn belav kir û li gorî vê senger hatin girtin. Armanc şer heya êvarê domandin bû. Wisa jî bû. Me heya êvarê cihên xwe parast. Êvarê me rewş nirxand lê Firat hîna tam bawer nake û dibêje, “*ev taktîk e, YNK hez dike me bitirsîne”.* Roja duyem YNK`ê bêhtir hêz kom kir, êrîşên xwe dijwartir kir. Em çend heval kom bûn, me rewş nirxand û me biryar da ku em biçin ligel Firat li ser bêsîma mezin agahiyê bidin hevalan û li gorî wê tevbigerin. Na, ger Firat vê pêşniyara me nepejirîne jî emê dest bidin ser peywira wî û wî girêdin.

Ez û hevala Tanya çûn cihê bêsîma mezin. Firat jî li wir rûniştiye da ku tekmîlên cîhazê guhdar bike. Hevala Tanya,

*– Emê bi hevalên jor re biaxivin. An jî dixwazî tiştên emê ji wan re bibêjin em ji te re bibêjin tu bibêje.*

Firat matmayî, wisa li me nihêrî. Pişt re,

– *Baş e, hûn çi bibêjin ezê ragihînim hevalan.*

Tekmîl û agahî hat dayîn. Talimata rêxistinê; komek hevalên bijarte bila li wir bimîne û yên din xwe bigihînin Qendîlê.

Şer berdewam dikir. Dengen fîşek û roketên B-7`an tevlêhev bibû. YNK`ê çar doçka anîbî û bi wan ve li sengerên hevalan dida. Me plansaziyek çêkir da ku êvarê em ji qadê derbikevin. Di encama vê de plan-namyeke nû hate çêkirin: heval Helmet û neh heval dê li qadê bimînin. Ew ê çiyê vala nekin û li gorî rêbazên gerîla tevbigerin. Dê çalaki û xweparastinê ji xwe re bingeh bigirin.

Me çekên herî baş, fîşek, bombên xwe da hevalan û ji wan xatir xwest. Bi neçarî be jî dest ji hev qut dibin lê dil ji vê rewşa kambax re dişewitî. Di nava fîrmêskên çavan de me heval li dû xwe hişt û di nava daristanan de bi tarîtiya şevê re bûn yek.

Hevalê Raman çûbû keşifê. Bi lez û bez hat û bi kelacan, "*heval hemû rê hatine girtin. Bi tenê milê Sengav kêmekî vekirî ye û daristanên wir jî xweş in. Her wiha li ser kaniyê him berpirsên YNK`ê û hin kesên xerîb jî sekinîne. Bi qasî ku min fêm kir ew kesên xerîb Tirk û Îranî bûn. Pez serjêkirine, ger hûn destûr bidin em dikarin çend heval êrîşî wan bikin. Em dikarin wan hemûyan dîl bigirin*.

Hevalan ev pêşniyar nîqaş kir lê nehate pejirandin. Ji ber ku di rewşeke neyînî de dibe ku fîşek bihatana teqandin û vê jî dê rê li ber deşîfrebûna me vebikira. Di vê navberê de hevalê zîrevan hat û got, "*çend dayîk ber bi me ve tên. Wer diyar e ku malbatên hevalan in.* Sê dayîk bûn, yek dayîka hevala Tavar bû. Hevala Tavar ev şeş meh bû tevlêbibû, xelkê Mahabadê bû. Di nava şer, teqîna fîşekan de hevalan hevala Tavar ji sengerê anîn, ew û dayîka wê hevdû dîtin. Nêzî saetekî dayîk ligel me man. Berî ku biçin dayîka heval Tavar, *"hevalno dema ez hatim YNK`ê ji min re got biçe keça xwe bîne. Lê ez xiyanetê li keça xwe nîşan nadim. Belam daxwaziyeke min ji we heye, kîsek axa vir bidin min. Ger keça min şehîd bikeve, bila axa keça min li ser şer kiriye li cem min be".* Hemû hevalên amade pir hestewar bûn, me hemûyan destê dayîkê maç kir.

Ber bi tariya êvarê, kesekî destê wî di hewa de hatiye ligel sengerên hevalan û xwestiye hevalê berpirsyar bibîne. Hevalan zilam anîn. Bêçek bû, di berîka xwe de zarfeke girtî derxist. Fermandarê YNK`ê Mahmûd Sengavî û berpirsê îstîxbarata YNK`ê Mamoste Ezîz name şandibû. Di nameyê de hatibû gotin ku em hemû biçin li cem wan ewê bixwe me bibin Qendîlê. Yan na dê me hemûyan bikujin. Di dawiya nameyê de jî heqeret li Rêbertî kiribûn. Me ji zilam re got, "*tu dikarî biçî". Zilam, "heval hûn bersivekî nadin?" "Na, tiştekî em bibêjin nîn e. Bila ew karên xwe bikin em jî karê xwe".*

Di 14`ê mehê de şer destpê kir. Ber bi êvarê em ketin rê. Wê rojê di radyoya Hizbê Zehmetkêş de di derbarê Qaradax de nûçeyek hate weşandin. Em şeş heval li ber dareke berûyê rûniştine. Bêyî ku haya wan ji me hebe me pêşmergeyên ku di binya me re derbas dibûn temaşe dikir. Ji ber em ji qampê vekişayabûn pêşmerge ketibûn qampê. Çi heye derdixin ji xwe re dibin. Kursiyeke hevalê Heqî yê taybet hebû, pêşmergeyekî ew kursî daye pişta xwe dibe. Hevalê Cigerxwîn birengekî tiraneyî, "*Hevalê Heqî te kursiya xwe nedida em li ser rûnin. Vaye kursî jî çû".* Hevalê Heqî bêyî ku bersiv bide û li wî binihêre tutûna xwe dipêça.

Hevala Tanya û Şerzan hatin li cem me. Di destê hevala Şerzan de radyo hebû, hevalê Armanc radyo jê xwest da ku nûçeyên herêmê guhdar bike. Radyoya Hizbê Zehmetkêş şehadeta me dida û di nav navên nêzî 15 kesan de navê min jî hebû. Lê di rastiyê de heya wê demê difna yek hevalî/ê jî xwîn nebibû, kesek birîndar jî nebibû. Hevalan ev nûçe kirin pêkenok. Hevala Tanya demekê bêdeng ma û piştre, *"ev nûçe diyar dike ku dê bi renge îmhayê werin ser me. Û radyoya YNK`ê jî dibêje ku PKK`ê bi Saddam re hevdîtin kiriye ji bo ku li me bixin. Bi kurtasî van bizanebûn berê me dane vir". Ev qad, herêm sînorê wan û Saddam e. Ger ku em dakevin deştê ber bi Kerkûk û Mexmûrê ve biçin YNK dê di deştê de me hemûyan qetil bike û dê ji raya giştî re bibêje, vaye PKK ji cem Saddam tê*". Bêdengeyik serwerî li nava me bû. Me

biryara; berî ku çiya xilas be û bêyî ku em ji Firat re bibêjin emê destbi şer bikin, mirin jî be lê divê mirina me li ser Partiyê nebe bargiranî.

Du roj bi kemîn, bi birçîbûn û bêaviyê ve derbas bû. Hevalên nû pir tengav dibûn, ewqas î zehmetî nekişandibûn. Şert û merceke wiha ji bo wan pir nû bû. Lê belê ruxmî vê qet dudulî nejiyan. Êvara 18`ê mehê di tarîtiya şevê de me xwe da lûtkeyên çiyayê Sengaw. Heval pir bêtaqet bûn. Ji ber bêaviyê li çend cihan aveke bêhna genî jê dihat vexwarin. Lewma jî gelek heval zikêşî bibûn. Ji ber ku rewşa hevala Şerzan bêhtir giran bû, hevalan ew da pişta xwe…

Sibehê, roj hîna nû hilhatibû. Piraniya hevalan ji ber westana çend rojan di xeweke giran de bûn. Ez, Raman û Armanc ji bo tiştek li ber dilê hevalan bikeve kezwanan kom dikin. Armanc bangî min kir, ez çûme cem. Bi destê xwe bintara çiyê nîşan da. Bi hejmareke zêde pêşmerge ber bi me ve dihatin. Bilez me hevalan şiyar kir û di sengeran de bicih kir. Li ser hev heşt qilêş, BKC`yek û çend jî tabance. Hevala Tanya şervanên nû hemû hilda li cem xwe û hevalan bir di nava tehtan de bi cih kir. Her kes li benda pêşmergeyan bû. Firat li holê tunebû. Em piştre pê hesiyan ku du ciwanên li cem xwe jî girtiye û ji qada şer dûr ketiye, reviyaye.

Di sihara 19`ê mehê de saet di heştan de şer destpê kir. Fîşek careke din teqiyan. Di destpêka şer de generale YNK`ê Nerîman Koxe hate kuştin. Nerîman Koxe dixwaze bikeve sengera hevalê Şaho û heval jî lê dide.

Nerîman Koxe, bi eslê xwe ji Helepçê ye. Fermandarekî YNK`ê yê, sala 1997`an bû. Keça birayî wî hevala Aşitî bi hevala Viyan re tevlî Tevgera me dibe. Li ser vê Nerîman Koxe tê Silêmanî. Der û dora komalê hevalan digire. YNK wek rêxistin dikeve navberê da ku aşitî çêbe. Di encamê de bi hevalan re peyman çêdibe da ku hevala Aşitî biçe malê, dayîka xwe bibîne û dîsa vegere. Nerîman Koxe hevala Aşitî li wesayîtê siwar dike, dema derdikevin dervî Silêmanî li cihekî disekine, li kêleka rê 75 fîşek berî canê hevala Aşitî dide û cinazeyê wê jî diavêje

li kêleka rê. Heval diçin cinaze radikin û sond dixwin ku dê tola hevala Aşitî rabikin. Bêyî ku heval nas bikin jî kuştina Nerîman Koxe di herêmê de olan vedide.

Şer heya piştî nîvro domiya û fîşekên me hema hema xilas bibûn. Ji her aliyê ve peşmerge dihatin. Her aliyê me hatibû dorpêçkirin. Hevalê Şaho hate cem min, ji serê xwe birîndar bibû. Mermî ji min xwest û got, *"hûn hevalên nû rizgar bikin, ezê bi fîşekên dawî ve we biparêzim"* û kete sengerê. Min û hevala Tanya şervanên nû komî serhev dikir. Roketek li hevalê Şaho ket û roketa duyem jî li hevala Tanya û Tavar ket. Hevala Şerzan li erdê bêhal, ji ser hişê xwe çûbû. Ez di nava toz û barûtê de mam.

33 hevalên nû, 33 can. Hemû jî bêçek li der û dora min kombûne. Jarjorên min jî vala bibûn. Pêşmergeyekî bi qasî 20 mêtro ji me dûr bang kir, *"heval bide xatirê xwedê meke, bisekin ezê we bibim".* Me hevala Şerzan da pişta xwe, pêşmergeyan li dora me helqeyek çêkirin. Fermandarê wan got, *"heval we serokeşîrê wan kuşt, wê niha werin, kêmekî lez bikin. Ez ne dijminê we me. Ez kadroyê Komaleya Rejdar ê kevn im".* Me lez da meşa xwe lê belê eşîra Nerîman Koxe gihîşte me. Pêşmergeyên ku li dora me çekên xwe zîvirandin wan. Kifir û gefên giran li hev kirin. Tevlîhevî derket lê di encamê de kadroyên Komala soza xwe girtin. Nehîştin bila tiştekî li me bikin. Di mewziyên din de du hevalên nû, bêçek înfaz kiribûn. Em piştre fêrbûn ku bi giştî heft heval şehîd ketibûn. Ji YNK`ê jî nêzî 30 pêşmerge û generalek hatibû kuştin.

**Dîlketin …**

Dîlketin, wek teyreke ku ji baskên xwe fîşek xwariye ye. Bi her livandinê re xwîn zêdetir diherike. Rewşa ji vê jî kambaxtir û kirêt bi navê biratî ji aliyekî ve hewldidin xwîna te birijînin û ji aliyekî ve jî destê xwe dirêjî te dikin û dibêji “em bira ne”. Kirêtiya “biratî”yê wê rojê min bi rengekî pir sotîner jiya. Di ti kêliya jiyana min de peyva biratî-birane ewqas bêwate û kirêt nebibû û nemiribû.

Em daxistin nêzî rêya weseyîtan a nêzî navçeya Qaradax. Kameraya televizyona YNK`ê û kesekî di destê wî de av, parî nan û di nava nan de jî penêr-bacanê sor dixwaze bide hevalan. Him xwarinê belav dike û him jî dibêje “em bira ne” û kamera jî dikişîne. Ew hevalên ku 20 roj bû tevlî partiye bibûn ji bilî du kesan yek kesî/ê jî xwarina wan negirt. Wan hinekî dan zorê ku heval hemû bigirin lê hevalekî bi destê xwe ve lê da nan ji destê pêşmerge firiya, pekiya li erdê ket. Mêzekirin bi zorê nikarin ji neçarî sekinîn. Ya rast heval hemû ev demek bû tî û birçî bûn.

Min û heval ji hev cuda kirin. Mahmûd Sengavî ferman da du pêşmergyan *“wî bibin cihekî cuda bila cihê Firat bibêje ger nebêje hema li wê derê bikujin”*. Hemû hevalan kirin qîr û hawar lê bi qundaxa çekan li hevalan xistin û ez ji hevalan dûr xistim. Namlûyê çekê spartin serê min, bi dengekî çors, *“Firat li ku ye?”* Nizanim ji ber çi bû lê dilê min pir rihet bû. Mirov digot ew tirsa mirinê ji giyana min bar kiribû û konên xwe li wergehên dûr vedabûn. Min di dilê xwe de digot, *“her çawa be heval ê pê bihesin û tola me hilînin”* û ez keniyam. Pêşmerge, *“tu ji çi dikenî?” “ken qedexe ye? Hûn dereng nemînin karê xwe bikin”*. Pêşmerge li der û dora min çûn û hatin, çi kirin encam negirtin. Herî

dawî çûn li gel fermandarê xwe û piştî demekê dîsa hatin ez rakirim û birin li gel hevalan.

Em li wesayîtê siwar kirin, ber bi Silêmanî ve ketin rê. Li navçeya Qaradax em dan sekinandin. Hevalekî kêmekî birîndar hebû û hevala Şerzan jî hîna nehatibû ser hişê xwe. Doktoran li wan mêze dikir. Di vê navberê de min ji hevala Zîlan Sine re bi dengekî nizm ve “*bi farisî ji hevalan re bibêje heya me hemûyan neynin ligel hev bila hemû heval bikevin gireva birçîbûnê”.* Hevala Zîlan gotina min hema di cî de ji hemû hevalan re got. Pêşmergeyekî hez kir asteng bike lê gotin êdî gihîştibû cihê xwe. Hemû hevalan bi nîşaneya serkeftinê ve tiliyên xwe bilind kirin. Doktoran birîna hevalan pansûman dikir, em jî di wesayîtê de li benda wan bûn. Hevala Zîlan Sine 16 salî bû û porê wê dihat li ser çongên wê. Pir tî bibû, ji min re got, *“heval ez pir tî me tu dikarî avekê bixwazî?”* Min ji pêşmergeyekî av xwest. Pêşmerge çû îskanek av anî, weke heqeret bike dirêjî hevala Zîlan kir. Hevala Zîlan ji ber vê helwesta pêşmerge ava di îskanê de firande li rûyê pêşmerge. Li ser vê helwesta hevala Zîlan, pêşmerge hewlda li heval bixe lê pêşmergeyekî din nehîşt û wî pêşmergeyê berê xwe da hevala Zîlan û got, “*bijî xwişkê ji te re”*. Vê helwesta hevala Zîlan bandoreke erênî li kesên nexweşxanê kir.

## Zindan

Zindana Sadam daye ava kirin. Cihê leşerî ya biryargeha YNK`ê ku bi navê Mî Ekser Selam tê nasîn. Di nava wergeha leşkerî de girtîgehek hatiye avakirin. Avahiyeke yek qat. Odeyên wê weke sîstema hucreyên yek-kesî hatiye sazkirin. Cihên du kesî jî hene. Lê belê di van cihên wisa biçûk de carinan deh kes jî dihate rawestin. An jî bi zorê deh kes têde dihate bicihkirin. Koma me hinek dudu û hinek jî çar çar hatin rawestandin.

Ez û hevalê Şoreş di heman hucrê de diman. Ruxmî ku ewqas westiyayî û bêxew bûn, lê belê xew nediket çavên me. Ji ber ku me hîna nedizanî çend heval şehîd ketine, Firat bi ku de çûye. Agahiya me nêzî ji 20 hevalan nîn bû. Fîşekên wan jî nema bû û nêvî wan bêçek bûn. Di yanzdehê şevê de deriyê hucra me vebû. Yê ku derî vekir kesekî sivîl bû, pêşmergeyek pêre hatibû bangî min kirin. Em çûn odeya mudurê girtîgehê. Di odê de çend kesên cilên leşkerî li ser, li ser piya, qelew, qure û zikmezin sekinîbûn. Bi tenê kesek sivîl û rûniştîbû. Kursiyek li min nîşan dan, ez li ser rûniştim. Çayek anîn, bi zimanekî nazik *“fermo bira, tu ne dîl î, mêvanê me yî”*. Min jî bi helwesteke aram ve çay danî li kêleka maseyê û *“em ne bira ne û ez jî ne mêvanê we me. Xwîn rijiya. Ez li vir ne takekes im, nasnameyeke min a rêxistinî heye. Çaya xwe jî rahijin ez çaya we venaxwim”*. Kesê por spî û cilên sivîl li ser vê nîqaşê dest bi axaftinê kir. Nêzî 20 deqîqeyan axivî. Bi giranî li ser propangandaya dij PKK´ê “qaşo PKK şaş e, êdî xilas bûye…” Gotinên xwe qedand li benda helwesta min sekinî.

Min ew naskiribû. Ew berpirsê Îstîxbara YNK`ê Mamoste Ezîz bû. Di sala 1997`an de hevalan ew ji destê PDK`ê rizgar kiribûn. Min rasterast bi navê wî ve hîtabî wî kir. Bimatmayî,

*– Tu ji ku min nas dikî?*

Bêyî ku bersiva pirsa wî bidim min gotinên xwe domand. Diyar bû ji besiva min zivêr bû bihêrs,

*– Cemîl Bayik ji ber çi ji Mam Celal re got siyasetmedarê fahîşe?*

*– Ev gotin ne gotinên Heval Cûma ne. Ev gotin destpêkê serokê JÎTEM'ê Cem Ersever bi kar anî. Ez bawer im tu wî baş nas dikî. Dîsa wezîrê karê derve yê Îranê Kemal Xarazî jî ev gotin bi kar dianî. Çima ji bo wan gotinekî we nîne?* Ezîz bi hêrs û gefan ve ji odê derket.

Roja din ji ber dengên dihatin me fêm dikir ku çûyîn û hatineke zêde heye. Me nedizanî ewqas deng ji ber çi ne. Bi tenê tişta me dizanî heval hemû ketine mangirtina birçîbûnê û kesekî xwarin negirtiye. Ew dem ewqas çûyîn û hatin ji ber çi ye! Her îxtîmala nû îxtîmala beriya xwe pûç dikir. Em di nava van fikran de digevizîn. Ji ber van fikaran dem her diçû girantir diherikî. Dengê lingên ber bi deriyê me ve dihat bêyî ku haya me pê hebe di heman demê de dihate hawariya fikarên me jî. Hatin deriyê hucra me vekirin. Bi rûyekî ken û nermik em vexwendin derve. Sê kes hatibûn. Dema ez ji derî derketim û kêmekî meşiyam, min dît hevalên nû (deriyê hucreyên wan vekirîbûn) xwarin dixwarin. Min ji wan re got, "*hûn çi dikin û çima xwarin dixwin?"* Dane diyar kirin ku, Firat hatiye ji wan re gotiye hûn dikarin xwarin bixwin. Êdî rewş hatibû fêmkirin.

Pêşmergeyan em birin odeya mudur. Firat û cîgirê Mam Celal mamoste Ezîzî Cundiyanî pêkve çay vedixwin. Hevala Şerzan ji nexwaşxanê anîne, ew jî li koşeyekê bêdeng rûniştiye. Bin çavê wê şîn, reng sipî çolkî û bêhal xuya dike. Min bi tirkî ji Firat pirsî "*te greva hevalan çima şkand"* lê ez bibersiva wî bêhtir tahrîk bûm. Dem dema nîqaşê nîn bû, min dîsa bi tirkî "*divê em hevalan tenê nehêlin, pêwîst e em hevalên nû hildin li gel xwe. Ger ku vî şertê me nepejirînin emê*

*greva xwe berdewam bikin. Ji ber ku ger hevalên nû ji me bêne dûrxistin teqez YNK dê li ser wan bi hezaran lîstokan bileyîze û dîsa pêwîst e em rêxistinbûna xwe li vir biparêzin”.* Hîna min gotinên xwe neqedandibû mamoste Cundiyanî, *“çi bû, heval ji ber çi diqehire”* û Firat jî xwestekên me jêre got. Cundiyanî daxwazên me yekser pejirand.

Hevala Şerzan bi îşaret gazî min kir û bi dengekî sivik

*– Xetîce Yaşar li nexwaşxanê hate cem min û ji min re got ´silavên Yilmaz, Dr. Suleyman û Mam Celal ji te re hene. Ger tu ji PKK`ê qut bî emê te bilez derbixînin Ewropayê û tedawiya te li wir berdewam bikin`. Min tifî rûyê wê kir, jêre da xeberan û ew qewitand.*

Li ser vê ez li Cundiyanî zîvirîm,

*– Ev Xecê kê ye, çi ye?*

Cundiyanî biken,

*– Ew jî ji we ye, hevalek ji we ye.*

*– Binihêre mamoste, Xecê mefroşin me. Ew ne hevala me ye, hevala we ye. Û ez nasnameya wê baş dizanim. Ez ji te re bibêjim ger ew cardin nêzî hevalên me bibe emê cinazeyên xwe bikin bela serê we!*

Cundiyanî wek bibêje “belê” serê xwe hejand.

Derencam em sê mehan di girtîgehê de man. Ji hevalên Rojhilat, bi tenê me karî çar heban weke bakurî nîşan bidin. Bi tevî Firat YNK`ê 27 heval radestî Îranê kir. (Îranê Firat çar meh girt û piştre anî nêzî Qendîlê cihekî berda.) Em; şeş xort û çar jî jin serê salê, di cejna remezanê de li hemberî 70 pêşmergeyên di destê hevalan de radestî hevalan hatin kirin.

Tişta herî xirab û kambax heyeta di navbera me û YNK´ê de peywirdarên Îranê bûn. 70 pêşmerge dirûşmeya “bakur, başûr, rojhilat Apo serokê welat” diavêjin û em jî 12 heval di binê baranê de li benda hevalan sekinîn. Di dema xatir xwestinê de hevalan destê heyeta YNK`ê Dr. Nebez negirtin. Min xatir jê xwest û wî bi rûyekî şermok û hin jî biqehr “*heval bila nehlet li birakujiyê were, ger şaşitiyeke me çêbûbe bibexşînin”.*

Di bin wê baranê de her gava me diavêt dikete li nava heriyê. Lê him ji ber germahiya hevalan û him jî ji ber hesreta Qendîlê ev rewş ne di xema me de bû, heta hinekî jî romantîk bû.

**Pêvajoya Başûr**

Şerê me û YNK`ê nû rawestiyabû. Li Qendîlê dibistanên perwerdê hatibûn sazkirin. Dibistan bi navê; Dibistana Rojhilata Navîn, Dibistana Kadro hatibû vekirin. Perwerde bi kurdî û tirkî dihatin dayîn. Li Dola Kokê nêzî 500 heval kom bibûn. Berpirsyarê qadê Ferhat (Osman Ocalan), Berxwedan Serhed û Kemalê Sor bû.

Ferhat gazî min kiribû. Ez çûm cihê lê dimîne. Beriya ku bigihêjim di rê de hevala Şerzan û hevala Jînda Pazarcix rastî min hatin. Me rewşa hevdu pirsî, ew jî ji cem Ferhat dihatin. Behsa nîqaşên xwe yên bi Ferhat re kirin. Li gorî ku wan digot Ferhat polîtîqa û nêzikatiyên me yên li Qaradaxê şaş dîtiye. Qaşo li gorî Ferhat diviya bû me ji ber şaşitiyên Firat (berpisyarê qada Qaradax) ew bikuşta. Di vê mijarê de taybet jî ez tewanbar kirime ku min nehîştiye heval Firat bikujin. Bi rastî jî wisa bû; hevala Jînda û Şerzan çend caran xwestibûn Firat bikujin lê min nehîştibû. Herdu heval jî (Ferhat jî biewle) ji min re gotin, "*heval bi rastî jî tu şaş bûyî, te wê demê nehîşt em wî bikujin".* Ez keniyam û "*we jî bawer kir ne wisa? De baş e, li bendê bin di demeke nêz de Firat dê were berdan û were vir. Her wiha Ferhat jî dê wî bike berpirsyarê we"*. Herdu heval jî matmayî man, wisa li min temaşe kirin. Min ji wan xatir xwest û ez çûm. Dema ez gihîştim cihê Ferhat lê dima hevalên di peywira ewlekariyê de gotin, *"were, heval jî li benda te ye".* Ez derbasî odeya ku lê dima bûm. Odeya wî germ, betaniyên stûr li ser hev komkirî, farsekî stûr li erdê raxistî û Ferhat pişta xwe dabû wan betaniyên li ser hev hatiye rêzkirin. Bêyî ku rabe li ser xwe ji cihê rûniştî destê xwe dirêj kir. Bi dengekî nerihet û weke ku ji zikê xwe de diaxive,

*– Tu bi xêr hatî çiya. Hemû heval di bûyera Qaradax de navê te didin, te çima nehîşt heval wî bênamûsê Firat bikujin?*

Bi dengekî nîv tirs,

*– Ma qey divaya bû me bikuşta?*

Ferhat bi hêrs;

*– Belê. Lê fikra te çi bû û ka ji min re bibêje li wê derê tam çi qewimî?* Min bûyer jêre şîrove kir. Demekê sekinî li min nihêrî. Min jî helwesta wî meraq dikir ka wê çi bibêje. Hevalan çay anîn. Firinî li çaya xwe xist û li min zîvirî,

*– Weke ku ez difikirîm tu derneketî! Lê dîsa jî te yê bihîşta bila hevalan Firat bikuştana.*

Piştî hevdîtinê ez derketim ber bi Dibistana Kadro ya kurdî ve meşiyam. Hevalan bi meraq dipirsiyan çi bû çi nebû. Destpêkê min wate neda van pirs û mereqa hevalan. Di rojên pêş de ez têgihîştim ku her kî/ê biçe ligel Ferhat an tê girtin an jî rayeya wî/ê mezin dibe. Rewşeke sosret bû lê ya min herdu jî nebû.

Demekê din Îranê Firat anîn li ser sînor berdan. Firat demekê rapora xwe nivisî û piştre bû rêvebirê qada bîrdozî. Hevala Şerzan û Jînda li ser ava dolê, li cem pirê li benda min bûn, ez jî biçek û rext diçûm karê gel. Piştî hevpirsîneke kurt dema me ji hev xatir xwest hevala Jînda bidengekî melûl “gotinên te rast derketin”.

Bi şerê me li Qendîlê gelek gund ketibûn bin qontrola tevgerê. Ji bo birêxistinkirina gel, hevalan bi navê BIZAVA ÇARESERÎ rêxistinek ava dikir û em jî tevlî vê xebatê dibûn.

Cihê peywira min dola Balayan bû. Li wir 12 gund hebûn. Dola Balayan ji gelek şoreşger û rêxistinên ji bo doza welêt têdikoşin re malovanî kiriye. Gelê wir xwedî ehleq û edebeke çê bûn. Vî gelî kî/ê nedîtibû? Kî hatibû û çûbû? Coş, êş, şer, şahî… YNK`ê kongra xwe ya yekem di vê dolê de li gundê Mawnan çêkiriye. Di gundê Mawnan de jineke şoreşger a bi navê Pur HELÎM li refên YNK`ê bi demdirêjî di nava şer, di her sengerê de, li hemû lûtkeyên çiyayên Qendîlê geriyaye û têkoşiyaye. Piştî sala 1991`an radiweste. Vedikişe mala xwe, ligel zarok

û neviyên xwe dijî. Di sala 1996'an de di bihara bêbext de ji ber ava ji helîna berfa çiyayê Qendîlê û barana zêde lehî radibe û dayîka şoreşger ber pêlên avê dikeve û jiyana xwe ji dest dide. Ruxmî kesayeteke ewqas mezin bû mixabin ti kesekî ew bîr nedianî û keda wê binav nedikir.

Gelê herêmê di hemû aliyan de alîkariya hevdu dikirin. Çi bûyer dibe bila bibe rûspiyên wan li hev kom dibin, weke dada gel tevdigerin û bûyerê çareser dikin. Dizî nabe, ger bibe jî gel kom dibe diz derdixin pêşberî gel û bi vî rengî ew kes ango diz tê teşîrkirin. Gel bi karê çandinî debara xwe dikir. Bi gelemperî tutun, genim-ce, bacan û bîber dihate çandin. Her wiha Dola Balayan bi gûzên xwe ve tê nasîn. Mirov dikare bibêje darên gûzan ê hemû malan heye. Gûzên wir qalikên xwe zirav lê belê girs in. Dîsa darên tirî, hêjîr, behîv, mişmiş jî qederekî hene. Di milê hewaya xwe de jî hin cuda ye. Weke ku cîhaneke cuda be. Havînan li gorî cihên din hênikî û êvaran bayeke wê ya ewqas xweş heye ku mirov dibêje qey westandinê ji hemû şaneyên mirov hil dike, radike. Zivistanan sar e, lê belê ne sermayeke mirovan biêşîne û nexweş bixîne. Li nêzî wê Dola Akoyanê heye, ev der havînan pir germ e, zivistanan jî têra xwe sar e û axa wê her şil, herî ye.

Çemek di nava dola Balayanda diherike. Ev av ji çiyayê Qendîlê bi giranî ji girê Şex Nasir ji yek kaniyê dertê. Navê kaniyê Kaniya Sipî ye. Kanî ji pala zozanên gundê Memkan dertê. Dema mirov ji jêr ve temaşe dike ev av wek berfeke spî diherike û ber bi xwarê ve tê. Ava wê ewqas sar e ku mirov dema vedixwe wer dizane kuliyên berfê dikevin gewriya mirov.

Nêzî sal û nîvekî li wê qadê mam. Gelek bîranînên me li wir çêbûn. Di wî geliyî de min bêhtir bi kurdeyatî bawer kir û jê hez kir. Çanda kurdan a edep, tore, ahlaq û wekheviyê…

Ez bawer im 12 gund hebûn. Navê yekî Kûlî bû. Kûlî gundê herî jor a li pêsîra, pala çiyayê Şax Gawir de bû. Me jêre digot gundê Neolîtîk. Ji ber ku hemû cihên wan pêkve bû. Ango her tiştê wan hevpar bû.

Çomsakê gundê herî jêra dolê bû. Niştecihên vî gund seyîd bûn. Gundekî ku ola îslamê bandora xwe pir zêde lê hebû bû. Niştecihên vir ji xwe re digotin, *"em ji mala Hz Pêxember in"*. Jin di nava çarşefa reş de û nedihatin cihên zilam lê ne. Çay dianîn devê derî, bi tenê destên wan dihate dîtin.

Di salvegera 15`ê Sibatê de gel li gundê Qalatê dê kombibûya û civîn, xwepêşendan dê çêbûya. Hemû gundî hatin, lê ji Çomsakê bi tenê zilam hatin. Zilam jî ne rehet, zivêr bûn. Dostekî ji wir û seyîd hatin li ba me û gotin, *"heval emê ji vir koç bikin, gundê xwe vala bikin"*. Em matmayî man. Xêr e, çima û hwd. pirs li pey hev rêz bûn. Rewş vegotin, hevalên me yên ku çûne bangî wan bikin bi tenê hatina zilaman û nehatina jinan aciz bûne, di vê mijarê de nîqaş kirine û çek kişandine hevdu.

Êvarê me civîna xwe çêkir, rewş aloz bû. Pêwîst bû mijara Çomsakê bihatana çareserkirin. Lê çawa? Di çanda Seyîdan de; dervayê seyîdan keçên xwe nadin kesî, her wiha jinên wan naçin malên kesî û nayên. Lê herdu hevalên me çanda wan nasnakin îdeolojîk nêzik bûne, mafê jin û wekhevî... Di dawiya civînê de me biryar da ku herdu heval û ez pêkve biçin gundê Çomsakê bi gel re civîn çêbikin û di wê civînê de bila herdu heval jî ji gel lêborîna xwe bixwazin. Me Civîn di mizgeftê de çêkir. Hevalê Êrîş beriya ku lêborîna xwe bixwaze ayetek ji Qûranê xwend û wisa lêborîna xwe xwest. Gel lêborîna hevalan bes dît û gund neterikandin.

**Hêzê Bergirî Netewî**

Di despêka bihara 2001'an de civîna rêveberiya Partiyê çêbibû. Di civînê de gelek biryar hatibûn girtin. Lê bîryara herî girîng û balkêş li Başûrê welêt hêzeke herêmî dê bi pera-maaş bihata avakirin. Navê hêzê Hêzê Bergirî Netewî bû. Projeya Ferhat bû, lê meclîsa partî bi şerhan be jî ev pêşniyar pejirandibû. Li gorî vê projeyê; li gundên Qendîlê yên ku gerîla lê dimînin û li ser gund û civakê yên ku bi awayekî bi bandor xwe rêxistin bikin dê maaş bidin wan. Maaş; mehê 80 dolar, taximekî cil, cotek pêlavên mekap bû.

Gorî vê xebatê Ferhat bangî hevalan dikir û gorî vê xebatê qad, gund, çiya û perwerdeyên wan plan dikir. Ferhat bangî min û Şehit Yilmaz Amed jî kiribû. Em herdu jî di nava xebatên gel di karê rêxistinêkirina qada Balayan de bûn. Em çûn dola Şehîd Harûn, ligel Ferhat. Ferhat ji me re behsa projeya Hêza Bergirî kir. Li gorî gotinên wî, bi vê projeyê ve em ê di Başûr de xwe birêxistinî bikin, di herêmê de wek hêza sêyem a bi bandor bin. Ji me pirs kir ku bê ev proje baş e yan na. Bêyî ku em lê bawer bin me weke bawermendan bersiva wî da. Lê belê di rastiyê de me herduyan jî pê bawer nekiribû. Ji ber ku gelên herêmê ji PDK`ê û YNK`ê ditirsiyan. Dê êdî zade wan a ku Netewên Yekbûyî dide were qutkirin. Dîsa em qebûl nekin jî bi navê van herdu rêxistinan vî gelî şehîd dane, gundê wan hatine şewitandin, koçber bûne û piraniya wan hîna jî di refên pêşmergeyan de cih digirin, xwedî maaş û peywirdar in. Lê me ji ber tirsa Ferhat negot poroje şaş e û bi ser nakeve. Ger em li dijî wî biaxiviyana dê weke ku em li dijî rêxistinê derketine, li dijî Rêbertî ne teşhîr bikira.

## 2002 Dola Kokê

Di Newroza 2002`an de PÇDK hate damezrandin. Kongra wê di Dola Şehît Harûn de çêbibû. Bizavê Çareserî fesih bûbû û li cihê wê Partiya Çareserî hatibû damezrandin. Projeya partîbûna Başûrê welat; Rêber APO di sala 1991`an de xistibû rojeva rêxistinê, lê çemk û rewşên wê demê dest nedabû ku ev proje bikeve meriyetê. Lê Rêbertî hewildanên xwe nedabû sekinandin, li Başûr xebatên rêxistinî bi gelek navên cuda pêş xistîbû. Her wiha bi pêşengiya Dr. Sîrvan partiya bi navê PAK ji 1993`an şûn ve hat avakirin. Piştî ku hevalê Sîrvan di heman salê de şehîd ket partiya PAK her ku çû bandora xwe wenda kir. Ji bo xurtbûna rêxistiniya xebatên Başûr Komalên Rewşenbîran, Saziya Çandê hate avakirin. Ji bo xurtbûna van komeleyan û rêkûpêkbûna xebatên vê qadê di 1998`an de bi navê "PKK BAŞÛR" tevgerek dîsa ava kir. Rêbertî di girtîgeha Îmraliyê de jî di pirtûka xwe ya bi navê "Parêznameya Îmralî" di beşa parçên Kurdistanê de behsa rêxistinên baskên Tevgerên Azadî dike. Li gorî rasteqîna parçeyên Kurdistanê divê partî bêne avakirin. PÇDK jî li ser van bingehan hate avakirin. Lê belê Ferhat, projeya PÇDK`ê û tanzîma wê weke projeya xwe bi nav kir.

Ez ji PÇDK`ê derketim, bêyî destûra hevalan çûme Dola Kokê. Biryargeh li wir bû. Ji ber ku bêyî destûra hevalan hatibûm Ferhat ji min rapora îzahatê xwest. Min jî, bi dilê saf an jî polîtîk di raporê de rexneyên xwe rasterast li projeya Ferhat kir. Ferhat raporê dixwîne, dibêje "*bila yan were girtin an jî li pêşiya hevalan platforma wî were çêkirin*". Lê belê hevalê Azad Sîser ji bo min xilas bike ji Ferhat re dibêje ku *"ew nebûye meclîsa PÇDK'ê lewma bi wê şêweyê nivîsiye"*.

Paşê hevalê Azad bi min re axivî û min rewş fêmkir. Lê belê ez hê jî aqil nebûbûm, min bûyer dûz, seranserî dest digirt.

Rojekî hevalan bang kir, gotin civîna giştî heye. Civîn di şikefteke mezin de bû. Nêzî 400 heval lê bûn. Ferhat hat, parkeyekî sitûr li ser bû. Em hemû li şikeftê amade bûn. Ferhat dest bi şîroveyên siyasî kir. Hinekî dem derbas bû hevalekî bêhemdî (cemidî bû) devê xwe vekir û nefes kişand. Ji ber dengê gewriya wî Ferhat zivêr bû û gotinên xwe rawestand li wî hevalî nihêrî û got;“ *bênamûs, mêş çû gewriya te?”* Ew heval matmayî ma, rabû ser piyan di cihê xwe de cemidî, bêdeng nêzî saetekî heqeretên Ferhat guhdar kir. Civîn qediya, di min de fikirên mîna; gelo ew heval ê bimîne, bireve yan jî dê xwe bikuje derbas dibû. Bi hezaran pirs û guman di serê min de diçûn û dihatin. Di vê rêxistinê de me heya niha tiştekе wisa nedîtibû û ev ne çanda me bû.

Ji civînê du roj şûn de nîşeyên hevdîtina Rêbertî û parêzeran hat. Peyamên Rêbertî di perwerdeyê de dihatin xwendin û min jî ji zimanê tirkî werdigerande kurdî. Tişta bala min kişand di civîna du roj berê de şîroveyên Ferhat û naveroka peyamên Rêbertî pir nêzî hev bûn.

Xwendina peyamên Rêbertî qediya û nirxandinên hevalan bi pêş ketin. Tişta balkêş hevalên dinirxandin; nirxandinên Ferhat û yên Rêbertî dişivandin hevdu. Dixwestin bibêjin ku Ferhat jî weke Rêbertî difikire.

Di kongreya yekemîn a Kongre Gel de (ji pêvajoya 2002 şûn de), me fêm kir ku Ferhat hemû nîşeyên hevdîtinên Rêbertî du roj berî di nava hevalan de weke ku ev gotin ên wî bin dianî ziman û di nav hevalan de belav dikir. Bi vî rengî berî xwendina hevdîtinan, di civînan de qaşo nirxandina siyasî dike û pişt re jî dema hevdîtinên Rêbertî tên heval wer dizanin ku fikren wî pir nêzî fikrên Rêbertî ne. Kurtasî, Ferhat bi nêrînên Rêbertî ve xwe weke rêberê alternatîf nîşan dida. Ya rast me hemûyan jî ev fêlbaziya Ferhat dixwar û jê bawer dikir.

Di payîza 2002`yan de hevalan, ez û çend hevalên Dola Kokê ji bo perwerdeya kadro şandin qada Xinêrê. Emê tevlî perwerdeya kadro ya Dibistana Mazlûm Doxan bibûyan. Em nêzî 135 heval ji bo perwerdeyê

kom bibûn. Bi giştî sê dibistan hebûn. Perwerdeya me di 8`ê Adara 2003`an de xilas bû. Hevalê Abbas cihê peywira me hemûyan diyar kir. Hemû hevalan xatir ji hevdu xwest û amadekariyên derketina rê dikirin. Her kesî berê xwe da cihê peywira xwe ya nû. Koma me nêzî 50 heval bûn û me berê xwe da Qendîlê. Ji nav wê koma me jî 17 dê biçûya karê gel.

Li Dola Kokê hevalê Cûma pêşwaziya me kir. Peywira li pêş me diyar kir û got; "*çend roj şûn de emê cihên ku hûn biçin diyar bikin, heya wê demê li vir li cem hevalan bimînin. Wexta dema çûyina we hat, emê bangî we bikin".* Di civînê de hevalê Cûma behsa girîngiya xebatên Rojhilat kiribû. Dê li wê derê gaveke nû bihata avêtin. Tengezariyên di xebatên wir de têne jiyîn jî diyar kiribû. Ji bo xebatên Kela Reşê, hema bibêje hemû heval difikirîbûn ku dê kê bi hevalê Dr. Afat re were şandin. Ji ber ku di nav me de kesê herî zane û xwedî ezmûn ew bû.

Sê rojê din hevalê Cûma bangî min kir. Ez çûme cem, Ferhat jî li derva bû, ew û heval Cûma diaxivîn. Em derbasî odê bûn. Heval Cûma tenê hate hûndir. Hevalekî navê xwe Mazlûm jî di odê de bû. Hevalê Cûma nêzî saetekê axivî û li ser xebatên Rojhilat perspektîf da. Herî dawî ji min re got, *"tu diçî Kela Reş û di dereceya yekem de tu peywirdar î. Hûn ê şaşitiyên ku li hember gel çêbûye ji holê rabikin û bi navê rêxistinê jî ji gel lêborînê bixwazin. Gotinekî te, tiştekî tu diyar bikî heye?"* Di dilê min de derbas dibû ez bibêjim "*ev kar girin e ez nikarim*" lê ev heval Cûma bû! Tiştekî wiha gotin li hemberî hevalê Cûma bêhurmetî bû, eyb bû. Ger ev peywir Ferhat bida min ez bawer im min ê birihetî bigota ez nikarim. Min got, *"heval rêxistin peywirekî dide li şaneyên min, ya dikeve li ser min jî ez layiqî hevalan û Rêbertî bim".* Heval Cûma rabû ser xwe me hembêz kir û got, *"heval li benda we ne. Hûn ê niha biçin Xinêrê, emê paşê hevalên din jî bişînin, li wir kom bin û pêkve biçin".* Em derketin derve, Ferhat û Sîpanê Rojhilat li benda me bûn. Me ji Ferhat jî xatir xwest, bi tevî Sîpan ji wir veqetiyan.

Em komek heval ji Qendîl ber bi Xinêrê bi qasî sê rojan meşiyan. Di roja duyem a meşê ji ber em zêde westiyabûn li gundekî me navber da û

em çûne mala kalekî 70 salî. Kalê rûspî ji me re got, “*heval Emerîka mudaxaleyê Iraqê kiriye. Bi nêrîna min Kurd nekevine nav baş e. Ji ber ku Emerîka hêzekî dereke ye, ewê karê xwe bike û biçe. Lê em Kurd bi Ereban re li vir in. A herî baş Kurd xwe bêalî bigirin. Her wiha her tim dayîka me digirî, li derve mayîn baştir e. Ka em binihêrin dahatû çi tîne”*.

Em li Xinêrê kom bûn, agahî hat, da ku kom demekê bisekine. Navenda rêxistinê civîn çêdikir. Civîn mudaxaleya Emerîkayê guftugoh dike. Li gorî biryara civînê, xebatên Rojhilat ne wek biryargehekê, dê weke rêxistinekê bê tanzîmkirin. Ji bo vê jî amadekariya bernameya rêxistinê dê bihata çêkirin. Heval Şehît Salih Hezargol û ez li ser bernama rêxistinê xebitîn û me amade kir. Destpêkê wek bizavekî dê bê îlankirin paşê jî bibe partî. Li ser vê bingehê bi navê Çûnbîşî Îtahaî Demokratîk hate damezrandin. Kurdiya wê: Bizava Çareseriya Demokratîk.

1’ê Gulanê. Nêzî 500 heval kom bûne û 1’ê Gulanê pîroz dikin. Hevalê Abbas, me û koma Rojhilat li cem xwe daye rûniştandin. Pîrozbahî bi dawî bû, her kes kete rêzê. Li ser daxwaza hevalê Abbas me li pêş ewqas hevalî xatir xwest û demekê bi me re meşiya, paşê yek bi yek me hembêz kir û xatir xwest.

**Kelareş**

Rêveberiya rê, Mamendê Rojhilatî û em du hevalên din bûn. Mamend, endamê navenda KADEK`ê bû. Em bi giştî 56 heval bûn. Rêwîtiya me pir dijwar derbas bû. Li çiyayê Zagrosê hêjî keviyên berfê li erdê bû, befir qerisî bû û em ji ser dişemitîn. Di newalan de, di palên asê de meşîn pir dijwar bû. Li Deşta Mirgeverê avê rê nedida. Avê bendên xwe qetandibû û azad dibeziya. Ji ber heriyê pêlavên me di nav de dima û îcar pêlavên xwe xilaskirin zehmetiyeke xirabtir bû. Taqet di me de nemabû. Ava ji aliyê bakurê Kurdistanê ve(Deşta Tirgever) dihat, rê nedida. Em demekê li der û dora avê geriyan da ku cihekî fireh û nizm bibînin û ji wir re derbas bin. Hewa tarî ye û nizimiya avê nayê dîtin. Lê bi neçarî em pênc kes ketin milên hevdu û me xwe li avê da. Koma yekem av qut kir. Piştre hemûyan xwe li avê da. Ber bi xilasbûnê bû Mamend ji komê qut bû û noqî avê bû. Hevalê ligel wî çalak nebûye dê çem û çem biçûya.

Di encama zor û zehmetiyê û westandinê de em gihîştin Kelareşê. Bi hevalan re hevdîtin çêbû, piştî demekê me peywir girt û dest bi karê xwe kir.

Li gorî bernameyê, Mamend dê ji bo karekî biçûya devera Soma Biradosta û piştî hefteyekî vegeriya. 40 roj ji ser derbas bû, lê Mamend nehat, ne agahiyek şand û ne jî pêwendiyek danî.

Me du heval şand devera lê ye, heval çûn hatin. Mamend, hevalê li cem jî li heremê li cem hevalan hiştiye, bi serê xwe çûye bajarê Ûrmiyê û peywendiyê xwe jî qut kiriye. Li ser vê ji endamên rêvebiriyê min gazî du hevalan kir da ku em rewşê binirxînin. Endamê rêveberiyê Rewşen Mahabat: “*heval dê were, teqez karî wî heye…”* Min jî got, “*heval, ev*

*kes 40 roj e ji me dûr ketiye. Em nizanin li ku derê ye û çi hatiye serê wî. Pêwîst e em agahî bidin rêxistinê”.* Nîqaşên me dirêj kir, Rewşen nedixwest em agahî bidin rêxistinê. Min mêze kir bi vî rengî em nikarin encam bigirin, min got “*baş e, ger weke rêveberî helwest nîn be ez ê jî wek şex agahî bidim rêxistinê. Ev mafê min ê xwezayî ye û rêziknameya rêxistinê jî vî mafî dide min”.* Rewşen li hevalê din nihêrî da ku helwesta wî çawa ye fêm bike. Ew heval jî; “*heval rast dibêje dikare agahî bide”.* Telefona me nîn bû, ji ber ku Mamend bi xwe re biribû. Ji bo telefon kirinê pêwîst bû em biçûyana gundekî. Me biryara çûyîna gurnd da, Rewşen xwest ew jî were min jî daxwaza wê pejirand û em çûn.

Li gund di telefonê de min rewşa Mamend ji heval Karasu re şîrove kir. Heval Karasu: “*heval ma tu ewqas nezan î, zilam 40 roj e ji we qut e û tu nû agahî didî! Yekser bi xwe li ser bisekine, di nava hefteyekî de vê rewşê zelal bike”.* Min dengê telefonê dabû ahîzeyê da ku Rewşen jî guhdar bike. Piştî min telofon girt, min li Rewşenê mêze kir bêdeng ma. Em ketin rê hatin cihê xwe. Çend roj şûn de me rewş zelal kir. Mamend reviyabû, lê dixwaze bi têkiliyên dostan ji xwe re pere kom bike. Ruxmî ku çûye îxanetê lê xwe dîsa jî dixwaze wek heval nîşan bide. Ji min re jî nîşeyek şandiye, têde diyar kiriye qaşo hîna dixebite. Dîsa qaşo ji Tahranê du jin dixwazin tevlî bibin û lewma jî dixwaze ez Rewşen bişînim li cem wî ku bila bi wan jinan re biaxive.

Me ji hemû hevalan re agahî şand da ku têkiliyên xwe bi wî re qut bikin û cihên ew dizane jî biguherînin. Me ji wî re jî nîşeyek şand ku bila were li cem me. Mamend demekê li Tahran, Sinê geriya û herî dawî li Silêmanî di kolanan de derket.

Ji îlankirina rêxistinê Îran nerehet bû, ketîbû li nava tevgerê, di nava gel de li dijî me antî-propagandaya wek *“li dijî xweda, li dijî Îslamê ne”* dikir. Ji aliyekê ve jî bi rêya cehş, kirêgiran dixwest me bişopîne û li ser riya gundan kemîn dataNî. Ji ser damezrandina Çûnbîşî Îtahaî Demokratîk re hefteyek derbas bûbû. Li herêma Mamenda, li nêzî gundê Qizilkentê di kemînê de hevalê Qehreman şehîd xistin. Ev ji me re peyam bû. Me plan kir ku em bersiv bidin û tola hevalê xwe rabikin. Lê

belê hevalê Qelender bêyî ku li benda me bimîne, roja duyem heft pasdar kuşt, fermendarê wan jî dîl girt. Vê çalakiyê di herêmê de olan veda, li ser gel pir bandor kir. Bê agahî, 12 şev in em di rê de ne. Em ji herêma bajarê Selmasê di nav gundê Aslankê re dimeşiyan. Her kî/ê me didît xwe diavêt me, hembêz dikir û pîroz dikir. Gel digot, *"dest û dilê xwe sax be"*.

**Dilêşî**

Êvar e, hewa sahî, roj ber bi ava diçû. Demsala biharê hêdî hêdî xatir dixwest. Mêrg şîn û kulîlk hîna neçilmisîbûn. Em di newala herêma eşîra Mamediya, li navbera gundê Qizilkent û Birinçxuran re dimeşiyan. Bejna gihayan xwe dida çongan. Em 200 metro nêzî cadê bûn. Nêzî 50 wesayît li pey hev ji gundê Birinçxuran ber bi bajarê Urmiyê ve diçûn. Ji dengê def û zurnê em fêmdikin ku dawet e, bûkê dibin. Ji bo ku me nebînin em sê heval bi ser devkî xwe dirêjî nava gihayan dikin. Wesayît hemû derbas bûn, em jî ketin ser rêya xwe. Beriya hewa tam reş be em gihîştin gundê Qizilkentê.

Li gund bêdengî hebû, çend kûçikên ku her tim bi me dihesin ewitîn. Lê gundiyê ku me dîtin xemgîn, bi keder pêşwaziya me kirin. Lê em vî gundî baş dinasin, pir mêvanperwer û welatparêz in. Me li dayîkekê biemr pirsî, ev çi bêdengî ye? Yadê ji kûrahiya hinavên xwe keserek kişand, awirek da me, serê xwe bilind kir û li asîmanan nihêrî. Weke bibêje xwedê were hawarê. An jî ev awir ji rewşa heyî, çarenûsa heyî nepejirandin bû. Paşê bi dengekî nizm, melûl û weke bi zorê ji nav lêvên wê yên qurmiçiye derbikeve, "*keçeke 17 salî xwe şewitandiye".* Bêdengiya gund bi rengekî sotîner xwe diteyisand rûyên me jî. Li aliyekê keçeka ciwan radikin, bi tevî xewn, xeyal û ligel hezaran hizrên wê yên nayên zanîn ve dispêrin axa sar û li gundê rex jî keçeke ciwan bi xêliya spî ya modern bi tevî def, gond û "şahiyê" ve weke berdîl diçe mêrê 50 salî…

Gundê Abazer; em du heval li malekê rûniştîne. Xwediyê malê pîremêrekî 60 salî, lawê wî nû zewîciye bûka malê xwarin tîne, çay tîne,

tebeqa radike. Ji ber serpoşê bi tenê çav diyar in. Keçek di navbera derî re bi dizî me temaşe dike. Êdî waxt e em radibin û pîremêr jî bi me re dertê derva da ku me bi rê bike. Min pêlavên xwe xiste lingê xwe, di nava pêlavên min de tiştek hebû, hatibû pêçandin. Dema min ew parçeya biçûk girt destê xwe, min fêm kir ku nîşe ye. Bêyî ku pîremêr bibîne min nîşe xiste berîka xwe. Ji ber ku hevalan ji me re gotibûn dema keçên van deveran bixwazin beşdarî tevgerê bibin carinan rêbazên nîşe xistina pêlavên hevalan bi kar tînin. Me xatir xwest û em ketin ser rêya xwe. Di rê de li ber zinarekî sekinîm, min bi fenerê ve nîşe vekir û xwend. Hevalê cem min jî got nîşeyek xistine pêlavên min jî. Wer hiziriye ku ger yek nebîne bila yê din bibîne. Xwesteka beşdarbûna tevgerê diyar kiribû û gotibû *"ger hûn min beşdar nekin ezê xwe bikujim"*. Di nîşeya hevalê li cem min de jî heman tişt hatibûn diyar kirin. Ez li hevalê li cem xwe zîvirîm,

– *Tu vê keçê nas dikî?*

Heval awireke wisa avête min ku weke ez henekê xwe lê dikim û,

– *Heval ma tu nizanî ev gund Seyîd in. Seyîd nahêlin keçên wan biçin mala mamên xwe. Ma ezê çawa nas bikim? Keçên seyîdan bi tenê di nava derê de (ew jî bi poşû rûyê xwe ve) bi çavên meraqdar, keder û wek kevokekê diperpite dilên wan her tim di nava tirs û dubendiyê de ye. Bi vî rengê li dora malê tên û diçin. Ji ber vê li van deran naskirin û rêxistinkirin pir zehmet e.*

Pir zehmet be jî hevalê Menal Koçer ew keç (a ku nîşe xistibû li nava pêlavên me) tevlî kir.

Berbanga sibehê em gihîştin cihê xwe. Em kêmekî razan, di saet nehan de hevalê Firat bangî me kir. Dema bêtêla mezin bû û hevalên Makûyê li ser cîhazê xwestibûn bi me re biaxivin. Hevalên Makûyê,

– *Heval keçeke pir hêja heye û bi darê zorê destgirtî kirine. Nêzî du sal in desetgirtî ye, lê naçe mêr. Dibêje, ger min bidine wî zilamî ezê xwe bikujim. Dixwaze tevlî têkoşînê bibe. Kesayetek hêja ye û kesê dê pêre bizewice jî yekî bêmirêz e. Em nizanin çi bikin.*

Ez jî hê di bin bandora wê nîşeya li gund keçekê xistibû pêlava min de bûm. Bêyî ku pir bifikirim,

– *Baş e, tevlî bikin.*

– *Heval, ez bawer im we tam gotinên me fêm nekir, keç destgirtî ye. Eşîr dê li dijî me derbikeve.*

Ez hinekî fikirîm, gotinekî Rêber APO hate bîra min.

– *Heval, Rêbertî dibêje, "ger keçên me baş bin emê ji destê zilamê kirêt derbixînin û ger kurên me baş bin em ji dest jina paşverû derbixînin". Wê keçê tevlî bikin û hûn jî heya germahiya eşîrê biçe xwe bidin ligel hevalên HPG`ê.*

– *Temam emê tevlî bikin û bişînin li cem we. Hûn jî ji wir bişînin Qendîlê.*

Ew heval beşdar bû, eşîr bi çola ket. Herî dawî zava hat Qendîlê, xwe li erdê da, giriya û bêencam vegeriya. Piştî germahiya bûyerê vemirî li wê herêmê di riya ku wê hevalê vekir re bi dehan keç beşdarî refên HPG- PJAK`ê bûn. Ew hevala jî min deh salê din dît, êdî bibû Fermandarekê YJA-STAR. Niha jî li Zagrosan-Çarçêla gerîla ye.

## Ber bi Qendîlê ve

Hevalê Dr. Afat û nezî 25 heval hatin qada em lê ne. Hevalê Afat hatibû cihê min û ez ê jî biçûma Qendîlê. Di kongreya Kongre Gel a yekem de hevalan ez wek berendam hilbijartin. Nêzî hefteyekî min peywira xwe teslîmî hevalê Afat kir. Di 17`ê Mijdarê de ez û sê hevalên din ji herêma bajarê Selmasê ketin rê. Rihê me her sê hevalan jî dirêj, cilên me sivîl, çek û rextên me di bin cilên me de ne. Heya Deşta Soma-Biradosta em du şevan bi meş hatin. Li wê deştê bi riya hin dostan em bi wesayît di nava navçeyan, gundan re derbas bûn. Li cihekî xeter em ji wesayîtê daketin. Me wesayît vala şand û em bi meş ji binya qereqolê re derbas bûn. Cihê xeterî hebû me derbas kir û dîsa li wesayîtê siwar bûn û me rêya xwe berdewam kir. Em gihîştin Tirgeverê, li bintara çiyayê Dalanpêr gundekî. Li maleke welatparêz in; jin, zarok li der û dora me civiyane li ser rojeva demê nîqaş, guftugoh û şîrove têne kirin. Xwediyê malê ji Urmiyê nû hat, ji berîka xwe nîşeyeke pêçandî derxist û da min. Yên ku nîşe şandibûn hevalên me yên li herêmê dixebitîn bûn. Ji me hatiye xwestin ku em rojekê li benda wan bisekinin, dê hevalekê bişînin, nû tevlî bûye û divê em wê jî bi xwe re bibin Qendîlê. Li gund zêde mayîna me, ji bo ewlekariyê xeter bû. Baweriya me bi xwediyê malê dihat lê min dîsa jî heval agahdar kir û li ser biryara hevpar me biryar da ku em bergiriyên xwe bigirin û bimînin.

Ber bi nîvro ve hevala nû anîn, em yekser ji gund derketin. Me xwe da bintarê çiyê û ber bi êvarê me dest bi meşê kir. Hevala jin navê xwe kiribû Tara. Şerm dikir, hinekî jî ditirsiya. Cara yekem bû ji mala xwe dûr diket. Li Îranê li cem pismamê xwe jî nikarin 20 metro ji mala xwe dûr bikevin. Niha li cem pênc kesên “xerîb” û li çiyayên Zagrosê

dimeşiya. Pir bikelecan bû, dema ji ser coka avê de beziya lingekê wê kete avê, şil bû. Bi wê rengê meş nebaş bû, bi lingê şil meşa rêya dirêj lingên mirovan dişewitîne. Min jêre got, "*heval li ba me goreyên nû hene, gorên xwe derbixîne yên ziwa bike lingên xwe".* Lê belê heval bi dengekî melûl û şermok got, "*na, tiştek nabe".* Diyar bû nîqaş wê encam negre û demeke wiha jî nîn bû. Ji ber wê min hema xwe tewand pêlava wê derxist, gorên wê hilda û cotek goreya nû danî ber. Ji şerma xwêdan bi ser eniya wê ket. Bi tevî wê matmayîn û şerma xwe goreyên xwe girt, xiste lingên xwe û me rêya xwe berdewam kir.

Bi tariya şevê re tevahî şilopa berfê û bayê sar weke şeqemê li rûyê me diket. Hevala Tara bi têra xwe westiya bû, taqeta meşê têde nemabû. Di vê rewşê de sekinandin nedibû. Hevalê Firat ji milekê û min jî ji milekê wê girt, ber bi lûtkeyên Dalanpêrê ve meşiyan. Li Dalanpêr sekinandin mirin bû. Di şevekê de me xwe gihande Gadarê.

Hevala Tara êdî aram bû, dikeniya diaxivî. Heta bi pirsan ve hevalê Firat gêj kir. Di berbanga siharê de em gihîştin Xinêrê, ligel hevalên karê hilberînê dikirin. Ji ber cilên me yên sivîl, rûyê me yên dirêj ên ku meleyên Îranê li bîra mirov dixist, hevalên li wir em nas nekirin. Hevalê Têkoşer Efrîn hate pêş me bi rûyekî ken,

*– Bi xêr hatin mamo.*

*– Hevalê Tekoşer, ez mamo me?*

*– Heval bi xwedê di vê rewşê de kes nikare we nas bike.*

Me hevdû hembêz kir û derbasî cihê rûniştinê bûn. Piştî ewqas birçîbûnê taştêya bi hingiv, mastê pêz û çaya daran hêz tevlî laşê mirov dikir.

**Ber bi Kongra Gel ve**

Ber bi êvarê saet di şeşan de ez çûme ligel hevalê Abbas. Êvarê demjimêr 18 ez çûm cem heval Abbas. Zîrevan agahî dayê û heval bangî min kir. Pêşwaziyeke germ kir. Rewşa gelê Rojhilat pirsî. Me kêmekî rewşa heyî nîqaş kir. Piştre hevalê Abbas di derbarê pêşveçûyînên dawî de hin şîrove kir. Di vê derbarê de amadehiyên rêxistinê jî parve kir. Hinekî bi xemgînî; "*Rêbertî di çalakiyê de ye lê hinek jî ketine hewaya şox û şengê. Ketine ber bayê feraseta lîberalîzmê, dixwazin feraseta jiyana kesanî di nava me de ava bikin. Di rewşeke wiha de dibe ku ez neyêm Kongrê. Ka emê binihêrin. Lê rewşa me nebaş e. Dibe ku em ber bi şetandinê biçin. Sosyalîzma Reel, gelê Rûs xwedî hêzeke pir mezin bû, Artêşa Sor hebû lê di nava salekî de hilweşiyan. Ma çi yê gelê kurd hejar heye? Kî/ê dê wan biparêze?*

Hîna nîqaş berdewam dikir, heval hatin agahî dan û gotin "*hevalê Bahoz Erdal hatiye û dixwaze we bibîne"*. Hevalê Abbas got, "*bila were"*. Hevalê Abbas ji hevalê Bahoz pirs kir ku ji endamên HPG`ê çend kes û kî/ê ji bo kongrê hatine. Hevalê Bahoz navê endamên Kongrê jimart. Berteka hevalê Abbas pir hişk bû. Qehirî û got, "*Rêbertî di nava çalakiyê de ye û hemû fermandarên HPG`ê li Kongreyê ne. Ger tiştek di vê navberê de bibe ev valatî dê çawa were dagirtin?* Di vê derbarê de qederekî axivî. Min xatir xwest û ez hatim PJAK`ê. Di rê de her li ser gotinên hevalê Abbas difikirîm.

Sibeh e, hewayeke sar serwer e. Di her dolekî de heval pêkve ber bi şiverêya ji Xinêrê diçe Qendîlê kom dibin û ber bi Qendîlê ve diherikin. Ez û hevalê Firat jî ber bi biryargeha PRD`ê dimeşiyan. Li ser şiverêya jêre digotin Merdan hevalekî me da sekinandin û bi şêweyekî gef û ji

xwe bawer, “*heval hûn diçin Kongrê lê divê hûn rê nedin çemkê Emerikî. Baweriya me bi we heye”.* Min ê jê bipirsiya ka çemkên Emerikî çi ne, lê di wê navberê de hevalê Mustafa Karasû hat û banî min kir. Me hevdu hembêz kir, rewşa hev pirsî. Hevalê Karasû got, “*ma hûn endamên Kongreyê ne?” “Belê heval, endamên Konreyê ne”. “Baş e, emê li wir hevdu bibînin û li ser rewşa Rojhilat nîqaş bikin”* û li wesayîtê siwar bû, çû.

Koma me jî temam bibû, nêzî 60 hevalî bi meşeke du şevan emê biçûyana Qendîlê. Fermandarê rê hevalê Bahoz bû.

Êvarê ber bi tariyê em gihîştin Berde Bûkê. Berde Bûkê bi ser navçeya Çomanê ve ye û nêzî Çiyayê Helgurt e. Me xwarina xwe xwar û ji jor ber bi Dola Çomanê ve daketin. Daketin nêzî du saetan kişand. Ji cadeye diçe Hecîumran û li wir jî derbasî bajarê Rojhilat Pîranşehîr dibe. Em ji cadê û ji pira gundiyan yeko yeko û bi rengekî lezgîn derbas bûn. Ji lewre pêşmergeyan em bidîtina dê baş nebûya. Dema em ji pirê derbas bûn kalemêrekî li ber deriyê em dîtin, silav da me û dua kir. Em di sisêyê berbenga siharê gihîştin Dola Balayan, ligel hevalan.

Danê êvarê, li biryargeha PAJK’ê (gelê herêmê ji vir dibêje Dola bêmehkeme, hevalan me jî navê şehîd Harûn lê kirine) li pêş şikeftê masayek mezin, nêzî bîst heval li dorê rûniştine, me silav da hev û em rûniştin. Li serê masê Ferhat rûniştibû. Berxwedan Serhed, Ferhan Tirk, Botan, heval Behzat, heval Zinar û gelek kesên din hebûn. Hevalê Behzat û Zinar di rêveberiya PAJK’ê de cih digirtin. Xwarina êvarê anîn li ser masê rêz kirin. Ferhat bêyî ku rewşa gelê Rojhilat an jî rewşa hevalên qadê bipirse, di dev de goşt û weke bi zarokan re biaxive;

*– Tu jî endamê Kongrê yî?*

*– Belê heval.*

*– Tu reformcî yî, yan muhafazakar î?*

Ez matmayî mam. Qet li benda tiştekî wiha nebûm. Hevalên li dora masê hemûyan li min dinihêrîn. Bêdengbûn nedibû, min hin gotinên Rêbertî yên di derbarê reformê de vegot. Ferhat nehişy ez gotinên xwe temam bikim,

*– Ji min re teorî neke, kurt û kurmancî tu reformcî yî yan muhafazakar î?*

Şêweya wî hişk bû, lewma ez ketim gumanan lê min dizanî Ferhat di çi ferasetê de ye. Hevalên li ser masê îşaret dikirin. Min dizanî di çanda PKK'ê de tiştekî wiha nîne. Dervî fermiyeta Kongrê fikrên hevalan nediket nîqaşê lê di kongrê de, di fermiyetê de her kes azad e û dikare fikrên xwe vebêje. Di civîna 2002'an de Ferhat gotibû *"Ez wek têgihiştin muhafazakar im".*

Êdî bersiv pêwîst bû, min jî bi şêwezeke sar ve,

*– Ez reformîst im.*

*– Ji bîr neke piştî Kongreyê şûn de peywirdarî û bicihkirin heye. Em dixwazin te di cihekî baş de peywirdar bikin.*

Gefeke baş bû. Ez bêdeng mam, di wê rewşê de bêdengî baştir bû.

Xwarin xilas bûbû, min banê hevalê Zinar kir û kêmekî ji Ferhat wan dûr ketin,

*– Heval hinekî pere li cem min e ez bidim te ka tu jî bijmêre.*

*– Te jimartiye, ma pêwîst e ez jî bihejmêrim?*

*– Belê heval, perê Partiyê tu radest digirî, pêwîst e tu jî bihejmêrî.* Hevalê Zinar pere nejmart, kire bêrîka xwe û hejmarê ku min jêre goti bû di lênûska xwe de nivisî. Hevalê Zinar pir nerehet bû, ez jî qederekî ji rewşa heyî biguman bûm,

*– Heval çi dibe? Ev reform û muhafazakar çi ne?*

Hevalê Zinar kêmekî bêdeng bû û min temaşe kir,

*– Ma agahiya te nîn e, Kongre li ser du ferasetan çêdibe. Her wiha Ferhat û der dora wî ketine derdê zewacê. Yanê dê di Kongreyê de biryara zewacê derbixînin. Hevalên din jî dê çi bikin ne diyar e. Gotinên "muhafazakar" propagandaya Ferhat e. Bi zanebûn, di bin vê de dixwaze feraseta xwe li ser bixe.*

Bi rastî jî ez veciniqîm, min li guhên xwe bawer nedikir. Di wê navberê de Botan (Nîzamttîn Taş) û Dilar bi xweşsohbet ber bi me ve dihatin. Botan ji Dilar re *"ma te pirtûk daye Jiyan* ( ez piştre fêr bûm ku Jiyan jî evîndara Ferhat bû) Dilar, *"belê min pirtûka Hûnera Xapandinê*

*(Aldatma sanati) da.* Botan, "*hê zû ye".* Hevalê Zinar, *"evanan ji niha ve destpê kirine, şoreş, gel Rêbertî xweda hafiz kirine, ez êdî nikarim rakim, mirin çarebe ezê biceribînim".* Min hêdîka ji baskê wî girt em ji wir dûr ketin. Di rê de hevalê Remzî Kartal û Zubeyîr Aydar û mêvanên ji Ewropayê dihatin. Ferhat bang kir em cardin çûn cem wan. Ferhat taktîkekî baş pêşxisti bû, cihê PJAK'ê ji xwe re kiribû baregeh. Ji ber ku cihê Kongrê li ber biryargeha PAJK'ê re derbas dibû, kî/ê bihata cihê kongrê Ferhat li ser rê ew didan sekinandin, dida axaftinê û li gorî wê hewldida feraseta wan fêm bike. Li gorî ferasetên wan rêbazên gotin, şîrove ew jî nebûya tehdît dikir. An jî weke ji min re gotî peywir û peywirdarî belav dikir.

Roj hildihat, her kesî xwe amede dikir da ku biçin salona Kongra Gel. Salona kongrê di nava Dola Şehîd Harûn de bû. Bi tenê ji cihekî re mirov dikaribû biketa vê dolê. Cihê derketinê jî heman rû bû. Salona Kongrê jî di dawiya dolê de bû. Der û dor girtî, li jor bi tenê ezman dixuya. Tehtekî nêzî hezar mêtroyî bilind. Pêş salonê ber-roj, pişta wê teht û ji jor de di nava şikêran de aveke zelal, sar diherikî. Ji vir hilkişîn nepêkan bû. Weke girtîgeheke xwezayî bû. Tabûra hevalê Sîdar Malazgîrt ji ewlekariya kongreyê berpirsyar bû. Him ketin û derketina dolê qontrol dikirin û him jî li lûtkeya dolê di sengeran de nobedar bûn.

Rêveberiya PJAK'ê gazî hevalê Firat kirin, qaşo di kotaya berandamtiyê de şaşitî çêbûye, ji ber vê jî hevalê Firat ji berendamtiya kongreyê hate xistin. Hevalê Firat nerihet bû, bêyî ku biaxive çû mêvanxanê. Lê di rastiyê de şaşitî nîn bû, Ferhat nehiştiye. Li dewsa hevalê Firat navê Selana Urfa nivîsiye. Selana alîgireke Ferhat a xas bû. Her wiha di hilbijartinên Kongra Gel de Ferhat mudaxaleyê PJAK'ê kiriye û Jiyan (piştre bû jina wî) ruxmî ku nehatiye hilbijartin jî hilbijartin betal kiriye, ji nû de daye çêkirin, bi zorê Jiyan û kesên ku ew bi xwe dixwaze kiriye endamê Kongreyê.

Salona Kongrê hatibû xemilandin, reng, mase û dekor xirap nîn bû. Lê belê ala Başûrê Kurdistanê li ser masê bû û bala hemû hevalan kişand. Di nava endaman de nêzî 150 kesên sîvîl- "rewşenbîr" hebûn. Ji

ber vê di fermiyetê de ti hevalekî nexiste mijara nîqaşê, lê ji bo me giran bû. Ev al weke xeteke nijadperestî yê seretayî bû, ango ji aliyê bîrdoziyê ve ji xetê derketin bû. Dîwana Kongrê hate hilbijartin; Remzî Kartal, Jiyan Denîz û sê kesên din.

Di nava endamên Kongrê de kesên-kesayatên pir balkêş hebûn; ji Rûsya, Kafkas, Asya Navîn, Emerîka, Avusturya, Ewrupa her wiha her çar parçeyan kesayetên cihêreng hebûn. Di nava wan de yê herî balkêş Dr. Felî û jinekê ji Emerîkayê hatî, Taman Şakîr bûn. Ferhat, Dr. Felî û hevalên wî ji kolanên Baxdeya peyda kiribû û weke rengek pêşkeş dikir. Taman Şakîr kê bû, ji ku hatibû nediyar bû. Di salonê de dêreyeke kurt (mînî etek), benîş di dev de bêyî ku rabe li ser xwe mîkrofon hildida diaxivî û aqil dida me. Abdullah Hîcap (ji Emerîkayê hatibû, berê di PDKÎ de di beşa ragihandinê de kar kiriye. Niha jî li Emerîka û Ewropa dijî) di kongrê de pir bi eşkere; emê çawa guh bidin Emerîkayê, pesnê îdeolojiya lîberalîzmê dida. Birayekî me yê rewşenbîr Haydar Işik pesnên polîtîkyên Îsraîlê dida û divê em çawa tevbigerin şîrove dikir. Her kes aqil dide me, rewşeke trajî-komîk bû. Ferhat jî hinekî ji bandora vê rewşê ji xwe razî, di mijara pêşveçûnên Rojhilata Navîn de rabû dirêj dirêj axivî. Di ciheke axaftina xwe de; *"ji îro şûn de polîtîkaya me ya derve feraseta polîtîkaya Îtalî ye, polîtîkaya çeqelan e".* Çeqeltî çi ye? Bermahiyan, gemaran dixwe. Bêyî ku bi xwe ked bide li ser kedên din dijî. Ferhat xwe negirt gotina dawî got; "*ne ku di çiyê de şêrekî birçî bim, razî me çeqelekî têr bim".* Li gorî Ferhat Emerîka û hêzên cîhanî wê di Rojhilata Navîn û Kurdistanê de şoreşê çêbikin û Ferhat jî dê ji vê sûd werbigire û Kurdistanê azad bike!

Ez, Newroz Batman (Reviyaye) û du hevalên din ên girtegir, me yê gotinên hevalan tomar bikira. Min bi kurdî û Newroz jî bi tirkî dinivisî. Koma Ferhat bi rastî jî baş xebitîbû. Giraniya endaman di bin bandora wan de bûn. Kesên ji nav gel hatine, welatparêz bi navê "birayê Rêbertî" Ferhat çi bigota, kîjan xalê pesend bikira gel jî piştgirî dida. Ferhat heya dawiya Kongreyê jî ev rewş baş da bikaranîn. Heya rojek beriya hilbijartinê endamên Navenda Kongre Gel her tişt li gor daxwaza Ferhat

pêk dianîn. Hevalê Cuma rabû got, "*berê niha min di rojnameyekê de dabû xuya kirin ku ezê di rêveberiyê de cih negirim û me wek rêxistin jî biryar girtiye hevalên kevn di vê rêveberiyê de dê cih negirin. Her wiha Rêbertî jî dixwest ku em bi peywirên din re mijûl bin"*. Li ser vê Ferhat rabû got, "*ez xwe bi paş de nakişînim, ew biryara me girtibû di dema KADEK'ê de bû û KADEK fesih bû, ango ew biryar bêhukm e..."* Ji axaftinên Ferhat şûn de di salonê de hewayeke sar serwer bû, hemû hevalan li hev dinihêrîn, di nava hev de diaxivîn.

Ji bo endamên navenda Kongra Gel li ser pêşniyaran nav dihatin nivîsandin, li ser helwesta Ferhat hevalê Abbas, Karasû û hevalên din jî xwe ji paş ve nekişandin. Ji ber ku hevalê Cuma di destpêkê de xwe kişandibû, ruxmî pêşniyara hevalan xwe paş de kişand.

Ekrem di dîwanê de bû û wî pêşniyaran digirt. Di nava endaman de navê wî jî ji bo navenda rêxistinê hatibû pêşniyarkirin. Hevalê Bahoz bi heman rengî hatibû pêşniyarkirin. Pêşniyar xilas bûn. Yên ku peywir nedixwestin xwe paş ve dikişandin. Ev xal jî xilas bû. Ekrem bi îşaret ji Ferhat û Botan re (ji ber ku me girte digirt em li hember platformê bûn, kî/ê diaxivî, çi digot, çi îşaret dikir me didît) ez jî xwe ji berendamtiyê vedikişînim. Li ser vê hevalê Bahoz got, "*ez xwe paş de vedikişînim"*. Ekrem di dîwanê de cemidî. Ferhat û Botan li hev dişêwêrîn. Me destpêkê rewş fêm nekir lê paşê derket holê ku li gorî rêziknameya konreyê kesên ku di navenda Konre Gel de cih bigirin nikarin di hêzên leşkerî de cih bigirin. Armanca Ferhat û kesên nêzî wî, Ekrem anîna ser HPG'ê bû lê belê xwe bi paş de kişandina hevalê Bahoz ve ev planên wan derkete valahiyê. Êdî ti kesî/ê xwe venekişand, ev xal jî derbas bû.

Pêşniyar xilas bûn û êdî dema hilbijartinê bû. Piraniya hevalan li hember Ferhat nerehet bûn. Kesî hez nedikir raya xwe bide Ferhat. Di dawiya hilbijartinê de bi dengê herî kêm ve bû endamê navenda Kongreyê. Dr. Felî ji Ferhat zêdetir ray girtibû. Di serî de hevalê Abbas, Cemal û gelek kesên ku Ferhat nedixwest werin hilbijartin weke endamên navenda Kongreyê hatin hilbijartin. Her wiha gelek alîgir û kesên ku Ferhat hêvî dikir werin hilbijartin jî nehatine hilbijartin.

Sibehê saet di 08'an de endam dê kom bibin da ku encama hilbijartinê were eşkerekirin. Lê belê ev civîn hate betalkirin. Hevalê Remzî got, *"emê ji nîvro şûn de encamê diyar bikin*". Her kesî/ê berê xwe da cihê lê radiweste. Em li ser rê bûn, Botan, Ebûbekir û Ekrem jî li wir bûn û bangî me kirin. Her wiha cihê ku em lê diman jî nêzî wan bû. Cih dîsa biryargeha PJAK'ê ye, Ferhat li koşê rûniştiye û bêmoral e. Di odê de nêzî 100 kesî ne. Ferhat dest bi axaftinê kir, "*polîtîka karê ekîb e, me hez dikir feraseta reformê tam bi ser bikeve. Di vê rewşê de em nikarin projeyên xwe bikin meriyetê. Ji bo vê jî emê ji endamtiya Kongrê îstîfa bikin. Ka gelo nêrînên we çi ne?"* Hema yekser Ebûbekir û Botan di berîkên xwe de girteyên xwe yên îstîfayê derxistin û gotin, "*me nivîsiye, girteyên me amade ne"*. Armanca wan me hemûyan bixin bin bandorê û bi vî rengî em jî îstîfa bikin. Di destpêkê de hevalê Kazim û Jiyan Denîz (Reviyaye) axivîn. Di çarçoveya; *"ev rewşeke xeter e, tê wateya parçekirina rêxistinê, em di vî tiştî de nîn in"* de axivîn. Ji bilî Ferhat, Botan û Ebûbekir hemû kesan ev helwest red kir. Ferhat û Botan matmayî man û girteyên xwe qelişandin. Ji nîvro şûn de encama hilbijartinê hate eşkerekirin. Me fêm kir ku sibehê Ferhat nehîştiye encam were eşkere kirin da ku bi hejmarek endam bide îstîfa kirin û di Kongreyê de parçebûnê bi pêş bixe.

Kongre bidawî bû, endamên Kongrê belav dibûn. Em çend heval li ser rêya ku heval ji dolê derdikevin sekinîbûn. Me berê xwe da Ebûbekir, Ekrem û Sakîne Batman li cem hev bi dengê bilind dikenin û diaxivin. Dengê wan baş dihate me. Pêsîra Ebûbekir heya dawî vekirî û bêkiras e. Sakîneyê ji Ekrem re got, "*Bahoz xwe bi paş de kişand, êdî tu nikarî biçî ser HPG'ê.* Ekrem hinekî jî bihêrs, *"êdî ji çekan re xweda hafiz, ez êdî çekan nadim destê xwe"*. Ez û hevalê Dilxaz nêzî wan bûn û hevalê Dilxwaz got *"êdî tu hem ji dêrê û hem jî ji mizgeftê bûyî"* Ekrem biqehir li me zîvirî "*hûn dixwazin çi bibêjin?*" Hevalê Dilxwaz got "*te fêm kir em çi dibêjin*". Sakîne Batman bi zimanekî nermik kete navberê, gotin qulibande ser biryara zewacê ya Kongrê. Hevala Dilxwaz bêyî ku bersiv bidê meşiya, em ji wan dûr ketin.

Kongre xilas bû lê dert giran bûn. Hevalan ez dame ser dibistana perwerdeya PAJK’ê. Dibistan di sê goşeya dola Şehîd Harûn û nêzî Ferhat û ekîba wî bû. Roja sisêyan komek heval ji rêya saetekî dûrî dolê li ser cadê kursiyên modern li pişta xwe kirine, ji bo Ferhat dikişînin jorê. Roja din gazî çend hevalên di karên avahiyan de xebitîne kirin. Heval êvarê vegeriyan, bêmoral û zivêr bibûn. Me pirs kir sedem çi ye, rewşa ku ji me re hate gotin tam ecêbiyek bû. Ferhat kursiyên bûk û zavayan kirîne. Bi xwe jî destek cilên sivîl ê reş li xwe kiriye. Roja din ez bi xwe çûm da ku bi çavên xwe ve bibînim. Saziya Ciwanan nêz bû, ez li cem wan sekinîm û min der û dor temaşe kir, Ferhat cilên sîvîl ê reş li ser, bi komek heval re diaxivî. Ê pêwîst dikir min dît û vegeriyam.

Perwerdeya me li ser Kongrê û piştre jî li ser parêznameyên Rêbertî bû. Lê me yê Kongre çawa şîrove bikira! Belgeyên Kongreyê ji gelek aliyên xwe ve bi paradîgmaya Rêbertî re bi nakok e.

Li dola ku Ferhat lê dima tevgerînek ne asayî hebû. Dûrsûn Elî bibû daîreya zewacê. Kî/ê dixwest dizewicand. Lê belê zêde kes naçe, lewma bi xwe li ser şiverêya hevalan digere da ku kesên dixwazin bizewicîne. Ez bawer im nîkaha destpêkê Ferhat û Jiyan çêkiribûn. Dûrsûn Elî hatibû nîzamiya PJAK’ê, ji hevalan re behsa pîrozbûna zewacê kiribû. Lê hevalan bertekeke hişk nîşan dabûnê û Dûrsûn Elî reve rev ji wir dûr ketiye. Serê her kesî tevlîhev bibû, dê kî/ê guhdar bikin! Çi rast e, çi nerast e. Rewş pir  tevlîhev bû.

Botan û Hevalê Zubeyîr ji Iraqê dihatin, em jî komek heval li cem Goristana Şehîdan, li gundê Marado li ser rê bûn. Piştî silav hal û xatir pirsînê em ji gund derketin, ber bi dola Şehîd Harûn ve meşiyan. Şiverê herî bû, heriya bi mekabên me ve digirt meş zehmet dikir. Hevalê li cem min, “*heval rêveberiya berê ev şiverê bi destan vedan çêkirin, ez bawer im hûnê jî qîr-zîft bikin”*. Li ser vê gotinê Botan (Nîzametîn Taş), “*em şiverêyan qîr nakin, emê hevalan biherin ligel cadeyên qîr”*. Piştî vê gotinê ji me dûr ketin, çûne ligel Ferhat. Hevalê şîrove kirî, “*heval armanca vana xirab e. Dixwazin gerîla ji çiya daxînin. Ev gotin ne asayî ye”*. Em bêdeng ber bi cihê xwe meşiyan.

Ferhat û kesên der û dora wî têgîna sosyolojî û demokrasiyê pir şêlû kirine, ger têkîliyên jin-zilam hebe ew weke pêşverû, demokrat, aşîtîxwaz û civakî ne nîşan didaa, na ger nebe; ew dogmatîk, şerxwaz, a-sosyal û antî- demokrat nîşan dida. Vê rewşê bandoreke xirab li ser feraseta hevalan dikir. Her kesî bi tirs fikrên xwe bilêv dikir. Ji ber ku ger li gorî Ferhat nebî tu di hemû qadan de dihatî teşîr kirin, navê “ajanê Îranê” lê dihat kirin. Li ser vê rewşê ez pir fikirîm. Ger derdê min zewac bûya, ma ez dîn bûm hatim van çiyayan. Welatekî azad, xeyalên şoreşgerî, kurdê azad... ma derdê min zewacba ma ez dînim bihatama çiyê, bûn qaçaxê cîhanê, welatekî azad, xeyalekî şoreşekê, kurdê azad... Rewş xeter bû. Mafê me yê em ji gelê Kurd lêborîn bixwazin bibêjin *“me efû bikin, me nekarî şoreşekê bikin, em eskerî têk çûn”* jî nîn bû. Jixwe mesele ne ev bû. Niha ji bo zewacekê gelê xwe firotin, keda ewqas şehîdan nedîtin, Rêbertî di girtîgehê de hiştin, dijminê ku te fîşek lê dida û te digot ezê wî ji welatê xwe derbixim wisa di nava mêjiyê gelê xwe de hiştin. Û niha jî li du xerîzeyên xwe biçi lingên dijmin. Ketineke pir kirêt ango ger gel tufî rûyê mirov bike jî kêm e!

Êvarê min, ne rapor lê nameyek ji hevalê Abbas re nivisî. Ji ber ku rapor ji saziyan re tê nivîsanidin, sazî muxatab in, lê sazî nîn bûn. Berpirsyarê PJAK’ê Sakîne Batman û mêrê wê Sîpan bû. Ew di nava koma Ferhat de bûn. Hevalê Abbas li Xinêrê li qada îdeolojîk bû. Ya min; derdê dilê xwe parvekirin bû. Di nameya min de çareserî nîn bû, gazinc û tasfiyekariya roj bi roj zêdetir pêş diket şibandina PDK-Î û rêxistinên Emerîkaya Latîn bû. Lê dil nerihet bû, di nava dudiliyan de bûm; gelo Rêbertî dê çi bibêje, an jî serê xwe hildim biçim hema ji Kurdistanê derbikevim biçim cihekî ku kes min nas nake û dawiya vê tasfiyê nebînim. Wel hasil rev, rev... Û neçarî.

Di nava PJAK’ê de feresata lîberalîzm, postmodernîzm û nijadperestiya seratayî hebû. Li hemberî van şoreşgeriyeke rast a Apoyî kirin pir zehmet bû. Ji ber ku şaşiyekê bi xwe re parçebûn, belavbûn û deriyê revê vedikir. Her weha ya herî xeter feresata riya navîn bû. Riya navîn; rengê wî nediyar bû, kîngê di kê/î de çê bibe nediyar bû, kî/ê li

cem kî cih digire nediyar e. Di nava rewşeke wiha de meş pir zehmet û xeternak bû. Baweri didan şikandin û hevaltiyê pûç dikirin.

Ez di oda rêvebiriyê de bikeder rûniştîbûm, hevalê zîrevan bi lezgînî hat û got *“hevalê Cûma hatiye dê li şikeftê civîn çêbike, bangî hevalan dike”.* Heval hemû kombûn, em çûne şikeftê. Şikeft mezin bû, têra 400 kesî dikir, lê nêzî 120 heval amede bûn. Hevalê Cûma li ber derê şikeftê bû, hevalan silav dida û derbasî hundir dibûn. Doxanê Şirnaxê jî li cem hevalê Cûma rûniştî bû. Hevalê Cûma sedema civînê şîrove kir. Sedem Ferhat û kiryarên wî bû! Me êdî fêm kir hevalê Cûma mudaxale dike. Heval, nêzî du saetî rewş şîrove kir. Doxan mafê axaftinê hilda û got: “*ev şîrove li gorî rêziknameya Kongrê nerast e. Ji ber ku rêvebiriyeke Kongrê heye û ev cîvîn li dijî rêvebiriyê ye*”. Armanca şîroveyên Doxan, li hemberî hevalan, hevalê Cûma nerewa nîşandan bû. Her wiha ji hevalan re bangek bû ku li dijî hevalê Cûma derbikevin. Lê me hemûyan li hev temaşekir, îşaretî hev kir da ku kes dij dernekeve. Yek kes jî li dijî hevalê Cûma derneket. Du-sê heval rabûn pêşniyar kirin ku rêveberiya PJAK’ê bê guherandin. Li ser vê pêşniyariyê çend hevalên din jî axivîn, nav hatin nîqaş kirin û pêşniyar kirin. Hilbijartin hate kirin û rêveberiyeke nû ji bo PJAK’ê hate hilbijartin. Li gorî vê hilbijartinê rêveberiya ku Ferhat çêkiribû fesh bû. Bêguman ev hemleya hevalê Cûma ji bo Ferhat giran bû. Ji ber ku Ferhat PJAK’ê ji xwe re weke palpiştê didît. Ev der ji xwe re kiribû biryargeh. Wê şevê gelek heval ji ber kêfxweşiyê raneza, heya derengiya şevê guftûgoya me domiya.

Çend rojên din, hevalê Cûma ber bi qada Şehîd Ayhan ve diçû li ser şiverêyê, me silav da hevdu. Hevaleke 16 salî hate cem hevalê Cûma, destê wî girt û bi kelogirî got; “*hevalê Cûma mehêlin me bikin jinên xwe”.* Em hemû matmayî man, cemidîn. Çekeke ûzî di destê hevalê Cûma de bû, heval qebzeya çekê givaşt, li me nihêrî keserek kişand “*metirse heval ew heya pêlî cinazeyên me nekin nikarin destên xwe bidin we”* û ket rê çû. Ez matmayî li cihê xwe mam. Demekê li rex ava çemê Dola Şehîd Harûn mam. Sermahiya avê yan jî qeşaya dilê min bû xwe dida rûyê min. Bêdengî û bêçaretî mirin bû. Êdî dem dema têkoşînê bû.

Sekin û derengmayîn xiyanet bû. Xeta ku ez heya wê demê li ser meşiyam ne radîqal bû. Vasat û neaktîf bûm. Li rex wê avê min biryar da ku êdî metirsiyên kesayetî bidim li aliyekî û bêtirs xwe tevlî bikim.

Egerên kesayetî, plangerî, dudilî, tirs, hisabên sibê, xwe parastin dida pêş! Lê îro ne roja xwe fikirandinê bû. Xwe fikirîn, bîra mirinê bi destê xwe kolandin bû. Li cihê ku gel, rêxistin di bin piya de diçû, kesayet dê çawa xwe biparêze? Dibe ku heyîna fizîkî hebe; lê belê emê jiyîna serfiraz û bi şeref daynin li ku derê? Hêzên dagirker destûr didin vê, destûr didin ku tu jîneke "asayî" bijî. Ji ber ku ketin tê wateya bîreke bêdawî.

Di asteke neyê piştçavkirinê de ezmûnên me yên rêxistinî hebûn û îro roja wan bû. Jixwe tişta dîrokê pêwîst didît û li me ferz dikir jî ev bû. Min bangî hevalê Merwan û hevalê Baran kir, em bi dizîka axivîn û me xwe wek komîteyekê rêxistin kir! Kî/ê dê çawa tesîr bibe, agahî çawa bigirin, çawa bidin û bistînin hemû plan kir û em belav bûn.

Wê demê tişteke me hesap nekir derket pêş me. Çar kesên xizmên Jiyan Deniz (jina Ferhat) ên ku di saziyên PJAK'ê de (çapemenî, peywirdarên biryargehê) cih digirtin ketin rojeva me. Gotinên mîna *"Ferhat çima bi xizma me re zewiciye, emê wî bikujin"* bi kar anîbûn. Rewş xeter bû. Ji ber ku hevalê Cûma nû mudaxale kiribû, ger tiştek bihata li serê Ferhat dê her kesî ji hevalê Cûma bizanibûya. Jixwe kaosek di nava rêxistinê de dihate jiyîn, ger rewşeke wiha bihata jiyîn êdî ti kesî dê nekaribûya pêşiya bûyeran bigirta. Li ser vê rewşê ez, hevalê Ferhan û hevalê Baran axivîn. Di dawî de me biryar da ku ez biçim bi Doxanê Şirnexî re biaxivim û xizmên Jiyan ji vir derbixînin. Wê demê Doxan Şirnex berpirsyarê koordîna PJAK'ê bû. Doxan ez guhdar kirim û wê demê camêrtiyeke baş kir, pêşniyara me di wê kêliyê de pejirand. Tişta ku me fêm kir îstixbarata Îranê bi destê hin kesan ew ciwanan tahrîk kiriye da ku *"tola namûsa xwe hildin"*. Demek derbas bû min ev agahî bi hevalê Cûma re parve kir.

## Hewildanên Ferhat

Ferhat bangî min kir, ez beriya biçim li cem Ferhat, hevalekî ku di ewlekariya wî de cih digirt li ser rê bi rengekî dizî *"heval hin kesan ji bo te duh ji Ferhat re gotine ku 'ew li pêşiya reforma civakî asteng e'. Wî ji te re tiştinên pir nebaş got. Bila agahiya te hebe, polîtîk nêz be. Ew li hincetan digere da ku rewşê provake bike"*. Ez gihîştim li cem Ferhat, bikêfxweş rabû ser xwe, ez hembêz kirim, rê nîşan da ku ez li ser kursî rûnim. Rewşa min pirsî, gotinên xwe hildibijart û wisa diaxivî. Gotinên xwe derûdor digerand û dixwest min fêm bike ku ezê jêre çi bibêjim, an jî ezê ji ku destpê bikim. Di dawî de got,

*– Ma kesek nîn e, tu kesekê hez nakî? Evîna te kê ye bibêje ezê yekser bînim li ba te, hûnê li heman cihê kar bikin.*

Ez matmayî mam, nizanim çi bibêjim. Min ewqas jî hêvî nedikir. Ferhat dîsa pêda çû,

*– Bila platonîk jî be, xem nîn e, bes tu navê wê bibêje, bila were li cem te ya din hêsan e.*

Ferhat nasekine, dest bi propagandaya eşqa Ferhat û Şîrîn, Mem û Zîn kir, pîroziya zarokan kir. Êdî ez bêzar bûm û min got,

*– Îzna te hebe ezê biçim.*

*– Ma kes nîne?*

*– Dema ez beşdarî vê partiyê bûm, min ji keçekê re gotina 'ez ji te hez dikim' danî li aliyekê. Ango min niha tiştên wisa ji bîr kiriye.*

Ferhat demekê sekinî, dîsa biken,

*– Yahû tu dogmatîk derketî.*

Ez ji wir derketim, min xatirên xwe ji hevalan xwest û ji wir dûr ketim.

Bela li ser hev dihat, li akademiya me Aramekî Kotolî heval tahrîk kirine da ku li devê dolê nobetê negirin. Yanê ev dihat wateya him cihê Ferhat û him jî biryargeha PJAK'ê bêewlekarî hiştinê. Di civînê de me ev rewş xiste nîqaşa hevalan û piraniya hevalan nêrîna ku Aram dixwest pêş bixe vala derxist. Lê bi rastî jî êdî rewş xeter bû. Ji bo mudaxaleya hevalê Cûma vala derbikeve roj bi roj tahrîk bi pêş diketin. Hin kes hebûn diçûn ligel Ferhat jêre digotin, em li cem te ne. Heman kes bi rêyekê xwe digihandin hevalê Cûma û jêre digotin em li dijî Ferhat in. Rewşeke tarî serwer bû. Di nava PJAK'ê propagandaya li dijî min û hin hevalên bi rastî jî kar dikirin weke "*ev Cûmacî ne*" pêş ketibû. Li nava saziyên me yên dervî PJAK'ê de jî gotinên weke "*evanan Ferhatcî ne*" dihate gotin. Êdî bi rastî jî em matmayî man, emê çibikin, bi ku de biçin? Ya herî giran jî, hevalên li saziyên din vê şîrovê bi pêş dixistin. Rastî jî nefes girtin zehmet bû. Hevalê Zinar hatibû asta xwekuştinê, em çend heval bi wî re mijûl dibûn, lê wê têra çibikira. Herî dawî ez çûm ligel hevalê Cûma, min ev rewş jêre got û bi taybetî jî derûniya hevalê Zinar parve kir. Li ser vê hevalê Cûma bangî hevalê Zinar kir, pêre bisaetan axivî. Bi vî rengî hevalê Zinar xwe hêdî hêdî kom kir.

Ferhat bêyî ku agahî bide, bi navê *"emê civîna xwe ya rêxistînî di bajêr de çêbikin, bila hêzên dervayî me jî bizanibin em çi qasî hatine guhertin û em bawerî bidin wan jî"*. Ji me xatir xwest, dê biçûya bajêr. Li ser wî; taximek cilê reş ê sivîl, di ling de jî pêlavekî rok ê Îtalî. Me kesekî jî nizanibû bi ku de diçe, texmîna hemû hevalan "bi hêzên derve re hevdîtin hene" bû.

Ji ser çûyîna Ferhat re çend roj derbas bibûn. Ez li cem Koordînasyona PJAK'ê bi Doxan Şirnex û Sewra re, li ser perwerdê nîqaşan dikim. Hevalekî zîrevan hat û bi kelecan,

*– Hevalê Doxan, heval diçin, dibêjin em li benda wî ne.*

Li ser vê agahiyê em derketin derve. Rê hema tam li hemberî me bû. Jiyana jina Ferhat, jina Serhed Zeryan, Sakîne Batman, jina Botan û çend kesên din li ser rê sekinîbûn. Destê xwe ji Doxan re hejandin da ku

ew jî bi wan re biçe. Doxan demekê fikirî, li me temaşer kir û li wan zîvirî,

– *Hûn biçin, ez nayêm.*

Piştî bersiva Doxan di nav hev de hin tişt axivîn lê dengên wan nedihate me. Axaftina xwe qedandin, destên xwe ji me re hejandin û çûn. Me li Doxan pirsî,

– *Ma ev bi ku ve diçin?*

Doxan bi mahdekî tirş,

– *Diçin Kerkûkê civînê. Lê ez naçim, li rex jinên wan çûyîn ji min re giran tê. Ma ez qewad im. Ev rewş ber bi xeteriyê ve diçe.*

Me jî êdî tiştekî din jê nepirsî...

Paşê hate fêmkirin ku Ferhat wan bi navê civînê xwe avêtine li hembêza hêzên navnetewî û jinên xwe jî, ji nav peywiran kişandine li cem xwe. Jina Serhed, li bajarê Sine di nava kar de bû, li ser daxwaza Serhed Ferhat ferman dabû rêveberiya PJAK'ê da ku jina wî jêre bînin. Weke wan, kesên li der û dora wan jî êdî bi tenê jiyana xwe ya takekesî rêxistin dikirin. Ketineke kirêt bû, li hemberî dîrok û gel lêborîna wê nîn bû.

Bi gişti mudaxaleya hevalan biserketî bû. Rêber APO bang kiribû ku bila civîneke awerte pêk were, Ferhat û ekîba wî jî dê tevlî vê civînê bibin. Amadekariyên civînê dihat kirin. Ev civîn di dîroka me de weke *"civîna sibatê"* tê zanîn. Hevalê Behzat berpirsyarê HAK'ê bû, civîn dê li biryargeha wan çêbûya. Biryargeh jî li Qendîlê li herêma Rizgê, li jora gundê Sîpîgilê bû. Hevalê Behzat nîşeyek ji min re şandibû da ku em ji bo ewlekariyê hişyar bin. Her wiha gotibû endamên civînê her kî/ê were, bişîne ligel min.

Ber bi êvarê, di saet çaran de hîna me nû navber dabû perwerdê Sakîne Batman ji Iraqê hat. Beriya hemû hevalan hate li ba min, bi rengekî germ, weke bihesret ez hembêz kirim. Rewşa min pirsî, piştre zîvirî silav da hevalan û rewşa wan pirsî. Ez berê pêre qet nemabûm lê wek kesayet me serpêhatiyên wê dizanî. Min bangî hevalekî ku Sakînê baş nas dike û ez bi wî re hinekî cuda axivîm. Heval ji min re, "*binihêre heval, Sakîne vala silav nade bavê xwe û vala germ nêzî kesî jî nabe. Hişyar be, ew vala nehatiye vir. Ez çi bibêjim, demeke xeter e, dibe ku her tişt bibe...*"

Demek derbas bû, saet di heştan de ti hevalên xort li holê nebûn. Ez çûm li ber manga hevalên xort min guhê xwe da hûndir ji hûndir dengê

Sakînê dihat. Li dijî hevalê Abbas û Cûma diaxivî. Mijara Sakîneyê ya çima germ nêzî min bûbû hatibû fêmkirin. Ez ketim hûndir, Sakîne bi rûyeke ken,

*– Ka were heval, me jî ji xwe re bi hevalan re sohbet dikir.*

*– Ez bawer im tu yê sibê tevlî civîna rêveberiyê bibî, tu van tiştên dibêjî di civînê de vebêjî dê baştir be.*

*– Na heval êdî ne weke berê ye, em hez dikin demokrasiyê bipêş bixin. Vekirî nîqaşan bikin. Êdî her tişt pêwîst e ji her hevalî re were gotin.*

Sakîneyê dê dirêj bikira lê ez ber bi derve ve derketim da ku heval jî ji mangê derbikevin.

Dem û roj giran bûn. Ji lûtkeyên Qendîlê mij û pûkên berfê xwe ji ezmanan berdidan xwarê. Di heftê sibehê de hevalê zîrevan hat bangî min kir û got, "*hevalê Abbas li ser rê li benda te ye.*

Ez bilez çûm ligel hevalê Abbas, heval di nava xwêdanê de bû. Diyar bû ku ji rêyeke dûr bimeş hatiye. Rewşa hevalan pirsî. Min jêre behsa rewşa Sakîneyê û gotinên wê yên di nava hevalan de gotî vegot. Hevalê Abbas biecizî "*tiştên gotiye hemû derew in. Tu bi hevalan re civînekê çêbike û vê derewê zelal bikin. Em jî diçin civînê. Li wê derê emê li ser bisekin".* Kêmekî meşiya, dîsa li min zîvirî û got; "*tu jî pir polîtîk î*". Min demekê wisa lê temaşe kir. Heya ku di nava mij û kuliyên berfê de wenda bû ez wer li cihê xwe mam.

Civîn pir dijwar derbas bû lê belê encamên wê baş bûn. Hemû heval tevlî bibûn, ruxmî ku gelek tişt zelal bibûn jî kesên girêdayî Ferhat nedisekinîn. Dualîtî û tevlîheviya di nava PJAK'ê de hîna berdewam bû. Amadekariya Kongreya PJAK'ê ya asayî dihate kirin. Ji ber vê jî pêwîstbû ku berendamên Kongrê bihatana hilbijartin. Lewma jî alîgirên Ferhat û çemka PDKÎ di nava tevgerê de bûn. Sîpan Rojhilat ê endamê navenda Kongre-Gel û Komîteya Siyasî berpirsyarê xebatên Rojhilat, (piştre ji cem Ferhat reviya, paşê li deşta Musûlê ji aliyê hêzên Îranê ve hate kuştin) hate li cem me. Têbiniyên hevdîtinên Rêbertî yên nû hatibûn. Hevalên rêveberiyê xwarin dixwarin, têbiniyên hevdîtinê xwend û dixwast em wer fêm bikin ku ew jî ji Ferhat aciz e. Lê belê me êdî bi wî bawer nedikir û li ser tiştên asayî me pêre guftugoh kir.

Sîpan çû, roja din Zîryan û Sewra wan hatin li ba me. Bi me re civîn çêkirin. Mijara civînê; mektep wê were belav kirin, pêwîst e ku li gorî

qadên xebatê sererastkirin werin çêkirin. Me ji wan re tiştek negot, lê hevalê Nûman (piştre li Îranê hate girtin, ji bo ku di êşkenceyê de bêhemdî xwe be jî neaxive bi diranên xwe ve zimanê xwe jêkir) rabû, "*ma ev hevalên li vir ji bo tevlî Kongrê bibin hatin perwerde kirin û mafên wan ê berendamtiyê jî heye"*. Piştî van gotinan weke ku bi ser Zîryan de ava sar hatiye mat ma, weke sûcdareke tê tewanbarkirin bersiv da, "*emê paşê li ser vê xalê rawestin, niha pariyek kar heye"*. Wer xuya dikir ku hevalê Nûman nexwast pêre bikeve nîqaşan û lewma jî tiştek negot.

Êvar e, li ser ava Dola Şehîd Harûn em weke Komîte hatin ligel hev û me rewşa dawî nirxand. Em gihîştin vê encamê ku; evanan dixwazin hevalan belav bikin û li gorî xwe kesan weke berendamê Kongreyê nîşan bidin. Me biryar girt ku divê yek heval jî neçe da ku heya weke berendam werin hilbijartin û paşê bila her kes biçe cihê xwe û dema Kongre destpê bike jî bila werin tevlî kongreyê bibin.

Roja din Zîryan di dest de lênûsek ku tê de lîsteya navê hevalên hatine peywirdarkirin hene hate dibistanê. Zîryan beriya ku navê hevalan bixwîne li ser armanca vê peywirdar kirinê axivî. Zîryan gotinên xwe bidawî kir û xwest navê hevalan bixwîne lê hevalan destûr neda û ev peywirdarkirin red kirin. Zîryan neçar ma ku navber bide civînê. Navber da û hate li ba me û got "*heval çima qebûl nakin?"* Weke ku qet haya me pê nîn e me got, "*karê me pê nîn e, derdê xwe ji hevalan re bibêje û wan qanih bike. Ma ne te digot 'her kes azad e' tişteke ku em bibêjin nîn e"*. Zîryan biecizî bêyî ku ji me xatir bixwaze ji cem me çû ligel koordînasyona PJAK'ê. Ji bo vê gavê be jî Zîryan û Ferhat wan bi ser neketibûn. Lê belê hîna li pêş me gelek kar hebûn. Pêwîst bû ku me karê xwe bêhtir bipêş bixista. Li ser vê me jî xebata amadekariya dê kî/ê bibe berendam kir.

Zîryan ber bi êvarê fêm dike ku ez li cihê xwe nîn im, li ser vê bangî rêveberiya dibistanê dike û ji wan re dibêje, "*ev çi ye, çima heval peywirê napejirînin. Kî serê hevalan tevlîhev dike?"* Li ser vê heval helwest diyar dikin û dibêjin "*ev bangkirina te ne fermî ye, ji ber ku endamekî me kêm e û em bi vî rengî nikarin ji te re tiştekî bibêjin"*. Ez êvarê saet di nehan de hatim qampê. Heval li benda min bûn. Hevala Yekta, ji ber dereng hatina min xwe hinekî eciz kir. Paşê nêzikatiya Zîryan û Sîpan wan parve kir. Di vî derbarî de nêrînên min pirsî. Min got "*ez tevlê dibim lê em jî pêşniyarên xwe amade bikin û pêşniyara min*

*bila di dibistanê de hilbijartina berendamên Kongrê were kirin. Piştî vê heval biçin ser peywirên xwe.”* Hevalan gotin, “*em jî tevlî te dibin. Wê demê weke nêrîna rêveberiya dibistanê tu sibê vê pêşniyarê siharê bi hevalan re parve bike”*.

Siharê heval kom bûn, me dest bi mijara xwe kir. “*Heval weke endamên Kongrê 12 kes dê ji gel me were hilbijartin. Li gorî vê divê em navê hevalan diyar bikin.”* Min her tişt bieşkereyî negot, lê baweriya min bi hevalan hebû. Ruxmî vê jî sir-riyet bingeh bû. Navê ku me wek komîte diyar kiribû weke ku nû li vir dibêjim min yek, du, sê rêz kir. Hevalan jî ew navên em fikirîne pêşniyar kirin, wan jî heman kes gotin. Di 11’ê şevê de karê me xilas bû. Navê 12 hevalan zelal bû. Ji ber ku ev civîn bi rengekî dizî hatibû kirin me rêbaza dê sibê çend kes navê çend kesan û navê kî/ê bide jî zelal kir.

Ez û hevalê Nûman derketin li derve da ku hevala Yekta Gever rêbikin cihê wê. Ezman zelal, stêrkan tîrêjên xwe ber bi me dişandin.

Hevala Yekta,

– *Şeveke xweş e, lê sibê kar bi ser bikeve dê baştir be.*

Hevalê Nûman,

– *Ji bo bi ser bikeve pêwîst e em pir hişyar tevbigerin. Dibe ku Zîryan provake bike bi taybetî jî heval tu neyê tehrîkan baş e.*

– *Erê ezê devê wê bişkînim.*

Hevala Yekta gihîşt mangayên hevalên jin û em jî ji wir çûne cihên xwe.

Zîryan û Sewra wan pêkve hatibûn, civîn destpê kir. Weke ku me plan kiribû meşiya. Pêşniyarên me kiribûn hatin qebûlkirin. Ji bo Kongrê berendam hatine diyar kirin. Zîryan bêdil be jî ev rewş pejirand lê deriyek vekirî hîşt, da diyar kirin ku dê bi kesên jora xwe re bişiwêre paşê van pêşniyaran bikin meriyetê. Me dizanî, jora wê Sakîne Batman, Sîpan û Ferhat bû. Lê Ferhat hîna ji Kerkûkê venegeriya bû, dîsa jî dê bi rengekî bi wî jî bişiwêriya. Zîryan kete rê, min Sewra da sekinandinê,

– *Tu kurdeke baş î lê nepolîtîk î. Dema hilbijartina endaman tu jî were.*

Sewra demekê hez kir fêm bike ka ez dixwazim çi bibêjim û got,

– *Ez ê paşê werim.*

Armanca min bila li ser navê koordînasyona hevalên jin Sakîne Batman na, Sewra were. Ji ber ku ew wek çemk ne li cem Ferhat wan

bû. Rewşeke wiha dê bihişta ku ew bêyî Sakînê nikare li ser hevalan bandorên neyînî bikira.

Êvarê Zîryan agahî şand da ku sibehê heval amade bin, ewê hilbijartina berendamên Kongrê bikin. Ev rewş ji bo me baş bû. Ji lewre me yê karibûya heyanê sibê xwe rêxistin bikira û kêmasiyên heyî temam bikin. Wê rojê heyanî 12'ê şevê di nava hewildanan de man, weke kulîs lê hatibû.

Sibehê Zîryan û Sewra hatin û bûn dîwan. Hatina Sewra dilê min rihet kir. Ji bo berendaman pêşniyariya navê hevalan hat girtin. Heval navê min jî pêşniyar kirin, min xwe paş de kişand. Hevalê Nûman,

*– Heval meke, tu çima xwe bi paş de dikişînî?*

*– Ger ez xwe bi paş de nekişînim ewê bibêjin ji bo ewqasa tişt kirin. A din pir ferq nake hûn hene, ewqas hevalên karibin bikin hene.*

Encama hilbijartinê diyar bû, yek kesê ku Zîryan wan dixwestin nehatin hilbijartin. Hemû hevalên girêdayî Rêbetî û xetê hatibûn hilbijartinê. Zîryan li hember encama derketî matmayî ma û bêyî ku ji hevalan xatir bixwaze derket çû. Sewra bi tena serê xwe ma, li min, hevalê Nûman û Baran temaşe kir, serê xwe hejand, keniya û çû. Encam ji bo Sewra ne girîng bû, kî bi ser ketiye an jî wenda kiriye. Lê belê wê hêvî nedikir ku heval ewqas rêxistinî ne.

## Ber bi Kongra Gel a Duyemîn ve

Endamên Kongrê kom dibin. Rêbertî Komîteya Jinûve Avakirinê sazkiriye û hevalên peywirdar jî bi komkirina Kongra Gel ve hatibûn peywirdarkirin. Endamên Kongrê, berendamên (delege) PJAK û HRK'ê dê pêkve biçin kongreyê. Ev car dê civîneke pêşwext çêbe, mijarên û angaştên *"herdû aliyan"* dê bêne guhdarkirin, li ser van dê nîqaş bêne kirin û li gorî vê jî dê dema kongreyê bihatana diyar kirin. Civîna pêşwext dê di 1'ê gulanê de destpê bikira.

Civîn li Kanî Cengê tê çêkirin. Ji cihê me û heya Kanî Cengê bimeş heft saet e. Em di dawiya meha çaran de ne û baraneke dijwar dibare. Rê bi temamî herî û em tevde şil bûne.

Li gundê Suredê em gihîştin li cihê hevalan. Hevalê Îbrahîm pêşwaziya me kir û got, "*zêde dem nîn e, hûn yekser biçin cihê civînê wê baştir be".* Em bi wê rewşa xwe ya şil ve dîsa rêya nîv saetî meşiyan. Li cihê civînê nêzî 300 kes hebûn. Baran hîna jî dibariya. Bi nava Komîteya Amadekar hevala Viyan Caf pêşwaziya me kir û me bir li xaniyeke têde sobeya daran pêketî. Kêmek be jî me xwe germ kir. Saet di pêncan de hevala Viyan hat gazî me kir û me bir cihê xwarinê. Hevala Viyan bi temamî şil bibû, lingên wê di nava avê de bûn, bêyî ku xwe bifikire hevalên nû dihatin pêşwazî dikir. Berî ku em bigihêjin cihê xwarinê hevalê Cemal hat, silav da û rewşa me pirsî. Em derbasî cihê xwarinê bûn, di hûndir de gelek kes hebûn. Li ser sifrê goştê pêz ê keliyayî, bacan, îsot û şînahî... Tişta herî zêde bala min kişand di nava ewqas hevalan de rewşa Ferhat bû. Zendên xwe heya dawî rakiribû û bi tenê tebaxê dinihêrî. Di lepekî wî de goşt û devê wî jî tijî, îsot û bacan li pey hev diavêt devê xwe. Kanî Yilmaz li hemberî wî bû. Kanî li me nihêrî bi serê xwe silav da me. Di wê navberê de Ferhat jî di binê çavan de li me nihêrî û dîsa berê xwe da goşt. Piştî xwarinê her hevalî ji semawer çay werdigirt. Hevalê Cûma me dît û hate li ba me silav da, rewşa me û rewşa hevalên di qada pratîkê de ne û rewşa Îranê pirsî.

Em derketin derve, hevalê Kazim hate li ba min û got;

– *Heval ez jî li benda te bûm.*

– *Çi bû heval, gelo tu dîsa ji xwe re li wergermend digerî?*

– *Ma heval ez çi bikim, em di civînê de ligel hev rûnên baş e.*

– *Baş e heval xem neke, ezê ligel te rûnim.*

Piraniya berendamên civînê hatibûn. Her kes nerehetî dijî, metirsiya encam ê çawa be, rêxistinê dê xwe kom bike yan na, wek berê hevaltî dê bidome yan na. Weke ku di civînê de hevalê Cuma diyar kir *"bi tilsima yekîtiya ruhê vê rêxistinê re lîstin"*. Bêguman ev analîz girîng bû lê derman kirin ne hêsan bû. Ji ber ku, komek be jî, kesên bi Ferhat wan re û kesên di bin bandorên wan de hindikbin jî lê belê ji aliyê bîrdozî, jiyana rêxistinî û pratîkî ve êdî ji pîvanên PKK'ê qut bibûn. Ya herî berbiçav jî zewac ku, jin ji bo wan êdî bûbû amûreke karanînê. Nêrîn û şîroveyên wan ên li ser gel jî; *"em heya niha xebitîn, me berdêl da êdî mafê me yê em hînekî jî bi xwe bijîn"* bû. Lê belê di pîvanê PKK'ê de weke hevalê Xeyrî Durmuş digot *"em qezdarê (deyndar) gelê xwe ne"* bingeh bû. Her wiha Rêber APO nameyek şandibû civînê û dabû diyarkirin ku; *"rêya me rêya Kemal PÎR û Berîtanan e, PKK dê xwe ji nû ve li ser van bingehan birêxistin bike, yên dixwazin dikarin li vir cih bigirin, yên naxwazin jî dikarin di nava Kongrê de wek xetekî dikarin xwe rêxistin bikin*". Ev peyama Rêbertî xeta Kongrê jî diyar kir, hemû endamên Kongrê di nava civînê de ev nêrîn pejirand. Ferhat, Botan her wiha koma wan hemû jî di gotin de diyar kirin ku *"ewê xeta Kemalan bingeh bigirin"* lê ev gotina wan bi tenê di salona civînê da ma. Di navbera yekemîn de Ferhat li pêş 400 hevalî bi dengekî bilind wek zilamekî bêrêz di nava hevalan de bangî Jiyana qaşo jina xwe kir. Jiyanê di nava hevalên jin de çay vedixwar, bangî wê kir *"keçê Jiyan ka ware vir"*. Jiyan bêdeng, weke koleyek stûxwar hate rex. Awirên hemû hevalan li ser wan bû, hevalên jin biecizî û ji neçarî bi tenê ji dûra ve temaşe kirin. Ji ber ku her kesî dizanî armanca Ferhat hevalan tahrîk bike da ku civîn provake bibe. Heya ku navber xilas bû Ferhat nehêşt Jiyan ji cem biçe, li ser mêrg geh ber bi jêr geh ber bi jor hatin û çûn. Di ew 13 rojên civîn berdewam kir de Ferhat ev helwesta xwe berdewam kir. Ti kesî ew cîdî nedigirt, gotinek jî jêre nedigot.

Rojekê hevalan xwarina fasûlî û birinc çêkiribûn, Ferhat li ser vê ji hevalê peywirdar re da xebaran, heqaret lê kir û got çima goşt nîn e. Yanê li qada civînê Ferhat her roj helwesteke tahrîkê ya nû bi pêş dixist

da ku hevalek xwe negire lê bixe an jî bersivekê bidê. Ruxmî van nêzikatiyên wî heval bi sebir nêz bûn. Bêguman armanca hevalan biserkeftî biencambûna civînê bû û wisa em derbasî Kongreyê bibin û di Kongreyê de weke feraset xilaskirina Ferhat bû. Ji bo vê jî her hevalekî/ê hevalek din vedixwende sebrê, yekî/ê yekî/ê din qontrol dikir da ku şaşitî yan kêmasî nebin.

Di rojeva civînê ya rêxistinî de Ferhat rabû behsa demokratîzebûnê kir. Şîroveyeke dirêj kir. Hevalek jin rabû dest bi axaftinê kir: *“ ev kesê ku behsa demokrasiyê dikin li gorî wan; evîndarê te, yan jî têkiliya jin û zilam hebe tu pêşketî yî, demokratîk î, yan na tu dogmatîk, paşverû yî. Baş e em paşverû ne, dogmatîk in. Tu jî ketî yî, bêehlaq î”.* Li ser vê salon cemîdî lê êdî hevalan destpê kirin. Hevalekî din mafê axaftinê girt: *“ez dixwazim mînaka civîneke me bidim, ev hevalê behsa demokrasiyê dike dîwanê wê civînê nîn bû, lê ev heval li rex masa dîwanê rûniştibû. Nêzî sed heval di civînê de hebûn. Li ser xalekî biryar dihat girtin dîwan erê dikir lê dîwana kêlekê ango vî ‘hevalî’ bigota erê dihate pejirandin û bigota na nedihat pejirandin. Ruxmî dîwan û vîna sed hevalî ew bi xwe derbasdar bû. Vî hevalî weke rista Şûrayê nîgehbanê Îranê dileyîst. Hûn dizanin parlementoya Îranê her çi biryar bigire ger nîgehban erê neke ew biryar derbas nabe. Niha ev kes ji me re nûnertiya demokrasiyê dike?”* Heval axaftina xwe qedand li cihê xwe rûnişt û hevalê Cemal navber da civînê. Di derketina navberê de Ferhat li pêş me dimeşiya ji xwe re, *“kuro Ferhat, axmak Ferhat ma tu yê biketayî van rojan ku ji te re gotinan dibêjin”* digot û kulmê li serê xwe dixist. Kanî Yilmaz jî li kêlekê *“heval sakîn be, tişt nabe ev roj jî dê derbas bin”* bi vî rengî dixwest dilê wî xweş bike.

Rewşa civînê her ku diçû giran dibû, her gotin êdî bihesap, bipîvan bûn. Ji ber ku pirtûka Rêbertî PARASTINA GELEKÎ gihaştibû ber destê me û dihate xwendin. Xwendina pirtûkê xilasbû êdî ne çep an jî rastgir mabûn; êdî her kes li hemberî bîrdoziya Rêbertî; yan wê xeta Berîtan-Kemal Pîr ji xwe re weke pîvan bigire yan jî wê xwe wek dijberê Rêbertî îlan bike. Ango dihate vê wateyê ku divê her kes rexnedayîna xwe bide.

Li milekî xeta xiyanetê (xeta Ferhat-Botan) û li milekî jî xeta ku ji aliyê Ferhat-Botan ve weke rastgir-dogma dihatin pênase kirin hebû. Jixwe “xeta rastgir” di civînê de jî rewê eşkere kirin û gotin *“me sala 2002, demsala havînê li vir, di nava partiyê de weke 30 hevalî, weke*

*alternatîf xwe rêxistinkir, armanca me xirap nîn bû. Me hezdikir rêxistinê biguherînin û biparêzin".* Her wiha gelek tiştên din gotin, hemû di arşîva rêxistinê de hene û cihê yeko yeko vegotina wan jî ne ev der e. Lê hevalên weke rastgir-dogma dihatin binavkirin, weke xetekî nîn bûn û hinde dilzelal, pak nêzî meselê bûne ku bi tenê armanca wan xeta partiyê parastin bûye. Bi armanceke ku '*werin em Ferhat û derûdora wî tasfiye bikin'* ranebûne. Li ser bingehê *''li gorî xetê şaşitî hene û pêwîst e ev şaşitî werin sekinandin"* tevgeriyane. Lê rexneyên Rêbertî ne ji bo vê bû, rexne ji bo *"çima hate vê astê"* bû.

Civîn ber bi dawî ve dihat, her kesên ku ji vê rewşê berpirsiyar rabûn ji rexnedayînê re derbas bûn. Lê bi rastî jî di van rexnedayînan de ya herî bala me hemû berendaman kişand a Botan (Nîzamettîn Taş) bû. Botan weke şanogerekî rol kir. Me hemûyan jî bi rexnedayîna wî bawer kir. Lê belê ti kesî bi rexnedayîna Ferhat bawer nekir. Ferhat di dawiya "rexnedayîn"a xwe de got, *"min helbest li hevalan qedex kir, helbestên Omer Hayyam qedexe kir ji bo vê ji hemû hevalan lêborîna xwe dixwazim".*

Wê rojê di şîroveyên çend hevalan de navê Omer Hayyam derbas bû û li ser vê Celalê Şirnexî diçe ligel Şehîd Zinar Serhed û dibêje *"ev Omer Xiyar kî ye, ez nasnakim. Heval çima wî rexne dikin û rexnedayîn didin?"* Hevalê Zinar bimatmayî, *"heval ew ne Omer Xiyar e, Omer Hayyam e û helbestvanekî Îranî ye ku di sedsala 11'mîn de jiyaye û Ferhat jî helbestên wî qedexe kiribû, mijar ev e".* Hevalê Zinar ev mesele bi çend hevalan re parvekir û êdî navê Celal bibû Omer Xiyar.

Koma me, ango endamên PJAK-HRK gotinên mîzahî, an jî gotinên pêkenok ji şîroveyên endaman derketî sitranek çêkir. Mûzîk a Sezen Aksû "şînanay" bû, lê gotin ê her kesî bû. Me êvaran bi hev re digot, hevalên din bihîstîbûn. Hevalê Karasû ber bi salona civinê biken, li ser rê ez dame sekinandin û got *"ev çi sitran e we çêkiriye, ka ji min re jî bibêjin?"* Min bi şermî û heçko karekî min î lezgînî heye, *"êvaran em stranên gelêrî dibêjin, karê min heye ez diçim"* û jê dûr ketim, Hevalê Karasû bi pişt min re, *"way qûrnaz, ma ezê fêr bibim we çi çêkiriye".*

Civîn 13 roj ajot û êdî ber bi bidawîbûnê bû. Amadekariyên çûyîna cihê Kongrê hate kirin. Weke komên 50 kesî kom hatin sererastkirin, beriya ku hewa tarî be her kesî kulepişta xwe da pişta xwe û em ketin rê. Di navbera meşa koman de nîv saet hebû. Ango her kom nîv saet piştî

koma pêşiya xwe derdiket rê. Koma me ya herî pêş bû. Ez û hevalê Kazim dîsa di heman komê de bûn. Ferhat û çend kes jî heya cihekî bimeş, piştre dê bi wesayîtê biçûyana. Dema em gihîştin li gundê Qalatûkan hevalê Kazim me ji rê derxist û berê me da eraziyê. Min destpêkê rewş fêm nekir û min jê pirsî, *“ heval te xêr e, çima nahêlî em di riya rast de biçin?”* Hevalê Kazim biken *“kuro wesayîta Ferhat di heriyê de maye, ma emê wesayîta wî dahf bidin? Ka dengê xwe nekin, bimeşin”*. Şev tarî û saet dehê şevê kî/ê dê xwe li heriyê bixe! Em yekser ji wir dûr ketin.

Wê şevê heyanî sibehê meşa endamên kongrê dewam kir. Di 11’ê şevê de gihîştin cihê kongreyê. Kongre dîsa di Dola Şehîd Harûn de dihate çêkirin. Cih cihê par bû û me di vir de şaşitî kir. Lewma jî ji ber ku rêxistina Azadiyê li vê derê ber bi mirinê ve şimitîbû û diviyabû li vir jî bihata sererast kirin. Li ser lingan were hîştin. Şeveke tarî bû, lê ezman sahî bû. Stêrkan tîrêjên xwe yên zelûl li bîbikên çavên me dixist. Dola Şehîd Harûn, ji kongrê re teng bû lê ezmaneke fireh li ber çavan diket. Weke cîhanek li ser mirov e dihat xuya. Wê şevê hevalan li kî derê ciheke vala û rast didît tilûmê xwe vedikir. Balifê me yêlek û pêlavên mekap bûn. Tûrikên xewê, stêrkên asîmanan û mekabên dibûn balif, nêvengeke xweş a xewê bûn. Westandina çend rojan, xwêdana rê, cilên şil bingeha xeweke xweş bû. Ji bilî zîrevanan ez bawer im weke me hemû heval di demeke kurt de ketin xewê.

Berbanga siharê hemû heval gihîştin cihê Kongrê. Wê rojê kongre destpê nekir. Endamên kongrê li cihên xwe yên hatine diyarkirin bicih bûn. Endamên PJAK-HRK li biryargeha PJAK’ê man. Cihê me li destpêka dolê bû, berendamên din hemû li jora me diman. Rê ji cem me re derbas dibû. Hevalê şehîd Sîdar berpirsyarê ewlekariya kongreyê bû. Di derbarê dê çawa hewlbidin hevalê Cemal perspektîf dabû û ew jî ji cem hevalê Cemal dihat. Li ser rê bang kir da ku were ligel me çayekê vexwe. Hal-xatir, henek û rewşa hevdû pirsînê hevalê Sîdar bi tiliya xwe ve lûtkeyê çiyê nîşanda û got *“li wir û çar aliyê we min doçka daniye. Der û dorên we nêzî 300 heval bicih bûne, ango dixwazim bibêjim ku metirsin”*. Heval hemû biken *“baweriya me bi te heye heval, gumanan meke”*...

Salona  kongrê; bi rengê kesk, sor û zer hatibû xemilandin. Rengê bingehîn paçekî rengê asîman bû. Li ser maseya dîwanê vê carê ala

Başûrê Kurdistanê nîn bû. Li ser masê ala PKK'ê, logoya Kongra Gel û li pişta dîwanê jî wêneyê Rêbertî hebû. Endam temam bûn, ji bo dîvanê pêşniyarî hatin girtin. Abdullah Hîcap, Besê Hozat û Nulîfer Koç hatin hilbijartin. Ji bo girte girtinê ez, Newroz Batman û çar kesên din hatin hilbijartin. Ji bo destpêkirina Kongrê tiştên teknîkî amadebûn û kongre hat destpêkirin. Rojeva kongrê têr û tijî bû. Ya girîng ew bû ku çemka Ferhat û Botan dê çawa were pênase kirin, an jî wan bixwe dê helwesteke çawa diyar bikirina?

Kongre heya nîvro bi guftûgoyên li ser pirsgirêka rêxistinî berdewam kir. Lê ji nîvro şûn de pêşnameyeke pêşniyariyê hate pêşkeşkirin. Di pêşniyariyê de dihate gotin ku bila hevalên mixatap rabin helwest diyar bikin. Dê çawa xwe tevlî bikin, an jî dê çi bikin bila vê eşkere diyar bikin Eu pişt re bila guftugoh berdewam bike. Li ser vê, dîwan ev pêşniyarî pêşkeşî raya hevalan kir û ji aliyê piraniya hevalan ve peşniyarî hate pejirandin. Li ser vê Kongre rojeva xwe berdewam kir. Di roja şeşan de têbiniyên hevdîtina Rêbertî hat û têbinî hate xwendin. Naveroka têbiniyê Ferhat û koma wî pir tirsand. Ji ber ku Rêbertî gotibû *" yên îsleh nebin bixin şikeftan"*.

Rojeva şer dihate nîqaşkirin, Ferhat rabû got; "*min pir dixwest bibim fermandarekî baş, lê ez nebûm fermandarekî tîmê jî. Lê belê ez di polîtîqayê de xwedî biryar im. Li gorî min bila li ser şer fermandarên şer cuda nîqaş bikin. Dîsa bila li ser biryara şer HPG biryara dawî bide, ne Kongre*". Ji pişt Ferhat re hevalek rabû û got, *"HPG girêdayî vîna polîtîk e, niha çima dibêjin Kongra Gel vê biryarê bila negire. Baş e, ger Kongra Gel vê biryarê negire nêrîna hevbeş dê çawa derbikeve? An jî dê dubendî çawa çênebe? Ji bo vê jî pêwîst e biryarê ev kongre bide"*. Nîqaş pir çêbûn, boçûnên pir cuda jî pêşketin, lê di encamê de nîqaş xilas bûn. Dor hate di derbarê şer de biryar dayînê. Ji % 60 biryara şer derket. Dîwan navbera nîvro da. Di navbera nîvro de li ser zimanê her kesî *"ma şer dê çawa bi pêşkeve"* hebû. Yan jî metirsiyên polîtîk bi pêş dixistin. Ango tirsa kesayet derdiket. Her wiha gelek hevalên ji vê biryarê kêfxweş dibûn jî hebûn. Şehîd Sîdar hate li cem min û bi rûkenî got; "*we biryara şer di kongrê de biser xist. Ev dê dijmin bîne rê û her wiha dê tirşikçî û reformîstên di nava me de jî zelal bike"*. Piştre xatir ji me xwest û berê xwe da lûtkeya çiya, çû ligel hevalên jorê.

Kongre ber bi bidawîbûnê ve diçû. Êdî kesekî/ê bi kesekî/ê din ve xwe pênase nedikir. Her kesî li gorî parêzname û têbiniyên Rêbertî xwe

bi nav dikir an jî sekna xwe diyar dikir. Di dawî de biryarên girîng hatin girtin û rêveberiyeke nû hate hilbijartin. Di vê rêveberiyê de Ferhat û koma wî bi piranî nehatin hilbijartin. Her wiha di derheqê pratîka bihurî de biryara lêpirsînê hate girtin. Encamnameya kongrê diyar bû, berendamên kongrê dê vekişiyana cihên xwe û hate gotin ku *"her kes dê sibê belav bibe, biçin cihên xwe"*. Ji nîvro şûn de, saet di duduyan de Ferhat û Botan hatin ligel me, me jî çay vedixwar. Silav û rewş hate pirsîn û piştre Ferhat, "*hewa germ e, ezê serê xwe bişom"*. Hevalan cih lê nîşan da û ji pişt wî re jî Botan çû. Di nava xwe de sohbet dikirin. Botan ji Ferhat re, "*heval me hevdu baş nasnekir, tu berê li kî derê mayî?"* Pirsên ku tu wateyeka xwe nîn e li hev dikirin. Piştre herduyan ji hev re dane diyarkirin ku *"divê em biçin nexwaşxanê, hevalên me nexweş in, kêmekî karê me jî li nexweşxanê heye piştre emê werin ligel hevdu"*. Hevalên wan jî jinên wan bûn. Di nava hev de biryara rendevûyê girtin û çûn. Hevalê Kazim got, *"çûna van ne ya xêrê ye"*, me jî henekê xwe li hevalê Kazim kir *"ma tu hesûdiya wan dikî"*. Hevalê Kazim bihêrs *"ka biçin karê xwe, ma ezê ji çiyên wan hesûd bim"*...

Ji ser çûyîna Ferhat wan re saetek derbas bibû, hevalên ewlekariyê ketin tevgerê. Hevalê Sîdar li ser bêsîmê, *"gihîştin wesayîtê, di mesafeya doçkayê de ne em lê bixin?"* lê belê hevalan destûr nedan. Me nû fêm kir ku Ferhat û koma wî ji me xatir xwestine.

Roja din hemû heval di salona kongrê de kom bûn, hevalê Cemal reva xiyanetê eşkere kir. 7-8 kes pêkve çûbûn. Paşê her kesî amadekariya çûyîna cihê xwe kir. Em beş bi beş ketin rê.

Hevalê Behzat bi navê Komîteya Siyasî gazî min kir. Ji bo li her çar parçeyê Kurdistanê xebateke baş were meşandin hin proje parve kir. Ji bo her çar parçeyan *"maseyên jeostratejîk*" dê bihatana demezrandin. Ji bo ez jî maseya Îranê demezrînim peywir da min. Bêdil be jî min pejirand. Kesê ku dabû ligel min; ne ji ti kesî re kar dike û ne jî bi kesekî re îdare dike bû. Em li Qendîl, li jora gundê Aşkokê di nava dolekî de bicih bûn. Li nêzî me saziya Dîsîplîn û Hiqûqê hebû. Li ciheke wiha me yê çawa kar bikira, ne rêbazeke wê û ne jî bingeheke wê hebû. Doleke kûr bû, di navbera me û Îranê de şkirên Qendîlê hene. Ti pêwendiyek bi gel re nîn e, teknîk nîn e, hatin û çûyîn nîn e. Min û kesê li cem xwe nîqaş kir ku em wextê xwe derbas nekin. Li ser vê me biryar da ku

destûrnameya Îranê wergerînin tirkî û me destûrname ji hevalên PJAK'ê xwest. Di demeke kurt gihîşt ber destê me û me des bi wergerê kir. Lê belê mêvanên hevalê Behzat ên Komîteya Siyasî rewşeke aram nedan me. Cihê me weke mêvanxanê bi kar dianîn.

Rojekê hevalê Karasû ji Xinêrê hatibû, di rê de hin tiştên ne li gorî pîvana rêxistinê dîtibû. Ji ber vê hema kî/ê didît rexne dikir. Em jî nêzî bîst hevalan li ser rêya wî bûn. Hat silav da me û li min pirsî;

*– Tu li vir çi dikî, ma tu ne li PJAK'ê bûyî?*

Ez jî êdî ji mêvanên bêkar bêzar bibûm. Ji derveyî me jî tu maseyên din ava nebibûn. Ji ber vê rewşê ez qederekî teng bibûm. Li ser vê min ji hevalê Karasû re;

*– Heval tu serê wî çiyayî dibînî?*

*– Belê.*

*– Ez li vir, jeopolîtîka Îranê ya li pişt wan şikêran analîz dikim. Ango ez berpirsê maseya polîtîk a Îranê me.*

Hevalê Karasû demekê sekinî û got;

*– Di te de nerihetî heye. Baş e, de bi xatirê we.*

Xatirê xwe xwest û çû ligel rêveberiyê. Roja din hevalê Behzat gazî min kir û got "*hevalê Karasû rexne li me kir û got wer dixuyê heval nerihet in...*" Me kêmekî nîqaş kir û min destûrnameya wergerandî radest kir. Min got, *"baş e ku em vala nesekinîne. Nexwe di her nebaşiyê de başiyek jî heye. Ez êdî diçim cihê xwe.*

Xiyaneta Ferhat û koma wî bi bin ketibû. Lê belê bermahiyên wan an jî kesên ji çemkên wan bandor bibûn hebûn. Ev dihate wateya ku, têkoşîn hîna nû destpê dikir. Pêvajoyeke giran hate derbas kirin. Niha dibe ji gelek kesan re hêsan were, lê belê her rojeke wan rojan beranberî salan bû.

**15. 11. 2015**
**Garê**